



RAPORA ÇAVDÊRIYÊ YA LI AMEDÊ BIKARANÎNA ZIMANÊ ZIKMAKÎ A ZAROKAN

WEQFA ALÎKARIYA MIROVÎ Û KOÇBERİYÊ

KOMA LÊKOLÎNÊ

Av. Çiğdem ERTAK

Ezgi KOMAN

Ruşen YAKUT

Av. Selmin Cansu DEMİR



Ev Rapor di çarçoveya "Bernameya YE Etkiniz" de, bi piştewaniya Yekitiya Ewropayê pêk hatiye. Ji naveroka vê Raporê tenê weqfe Koç û alîkariya mirovî berpirsiyar e û bi ti awayî fikrên Yekîtiya Ewropayê temsil nake.

NAVEROK

Kurtenav	5
Derbarê Weqfa Alîkariya Mirovî û Koçberiyê De	7
Kurte	9
Destpêk	13
Armanç&Çarçove	15
Rêbaz	15
Sînor&Derfet	17
Paşxan	18
Peyd	21
Mafê Çanda Xwe Jîyîn û Bikaranîna Zimanê Zikmakî yên Zarokan	23
Bikaranîna Zimanê Zikmakî yên Zarokan	25
Sedemên Neaxvtina Zarokan ya Bi Zimanê Zikmakî	26
Li Dibistanê Bikaranîna Zimanê Zikmakî	28
Bandora Bikaranîna Zimanê Zikmakî ya Li Ser Zarokan	29
Bandora Rewşa 10 Salên Dawî yên Polîtîk ya Li Ser Bikaranîna Zimanê Zikmakî a Zarokan	30
Nirxandin	31
Fêrkirina Zimanê Zikmakî	33
Bandora Rewşa 10 Salên Dawî yên Polîtîk ya Li Ser Fêrkirina Zimanê Zikmakî a Zarokan	37
Nirxandin	38

Bikaranîna Zîmanê Zîkmakî ya Di Perwerdehiyê De	41
Bandora Perwerdehiya Bi Zîmanê Zîkmakî ya Li Ser Zarokan	46
Bandora Rewşa 10 Salên Dawî yê Polîtîk ya Li Ser Fêkirina Zîmanê Zîkmakî a Zarokan	47
Nîrxandin	48
Xwe Gihandina Berhemên Medyayê yê Bi Zîmanê Zîkmakî yê Zarokan	51
Bandora Rewşa 10 Salên Dawî yê Polîtîk ya Li Ser Xwe Gihandina Berhemên Medyayê yê Bi Zîmanê Zîkmakî yê Zarokan	56
Nîrxandin	57
Li Hember Bînpêkrîna Mafan Meqanîzmayên Bi Zîmanê Zîkmakî yê Serlêdanê	61
Nîrxandin	64
Bandora Berastengî, Xîzanî û Zayendiyê ya Li Ser Mafê Zîmanê Zîkmakî	67
Nîrxandin	70
Zarok Dixwazin & Mezin Pêşniyaz Dikin	71
Nîrxandin	74
Pêşniyar	75
Encam	79
Heke Zarok Bibin Rêvebir...	83
PÊVEK : Seta Nîşaneyan- Li Amedê Rapora Çavdêriyê ya Mafê Zîmanê Zîkmakî a Zarokan	87

KURTENAV

AB	Yekîtiya Ewrûpa
AÇSHB	Wezareta Malbat, Xebat û Xizmetên Civakî
BM	Neteweyên Yekbûyî
BMÇHS	Peymana Neteweyên Yekbûyî ya Mafê Zarakan
CIMER	Navenda Ragihandinê ya Serokwezîriyê
GIYAV	Weqfa Alikariya Mirovî û Koçberiyê
KDK	Saziya Çavdêr ya Giştî
MEB	Wezareta Perwerdehiyê ya Neteweyî
OHAL	Rewşa Awarte
OPCAT	Protokola NY ya Li Hember Peymana Êşkenceyê Pêvek Şandin
TBMM	Meclîsa Mezin ya Neteweyî a Tirkîyeyê
TİHEK	Saziya Mafê Mirovî û Wekheviyê ya Tirkîyeyê
UNESCO	Rêxistina Neteweyên Yekbûyî ya Perwerde, Zanyarî û Çandê

DERBARÊ WEQFA ALÎKARIYA MIROVÎ Û KOÇBERIYÊ DE

Weqfa Alîkariya Mirovî û Koçberiyê (GIYAV), di sala 1999'an de li Mêrsînê hate damezirandin. Tê zanîn ku Mêrsîn cî û warê koçberiyê ye û bi darê zorê gelek mirov koçkirine vî bajarî. GIYAV di bingeha xwe de di derbarê jin, ekolojî û zarokan de xebatan bi rêve bir û di sala 2010'an de Navenda Weqfê anîn Amedê. Di heyna nû de piştî encamên niqaşan hat çespandin ku li Amedê xebatên derbarê jin û ekolojîyê de bi bandor in lê di xebatên derbarê zarokan de qelsî heye. Bi vê armancê GIYAV, berê xwe da xebatên zarokan ku herî zêde ew di bin bandora koçberiyê de dimînin.

GIYAV, li gor perspektîfa damezirandina xwe bêtir di qada jin, zarok û ekolojîyê de karên xwe didomîne. Bi lêkolîn û pêkanînan xwe armanc dike ku binpêkirina mafên zarokan were dîtin û parastin.

KURTE

Bi vê xebatê hatiya armanckirin ku ji bo zarokên li Amedê dijîn çavdêriya mafê zimanê zikmakî û astengiyên li hember van mafan were kirin û li gor nihêrînên zarokan polîtîka werin pêşxistin. Di vê xebatê de li ser xalên Peymana Neteweyên Yekbûyî ya Mafê Zarokan (BMÇHS) yên ku ji bo Tirkîyê bi guman hatine dîtin, yên wek, xwe gihandina berhemên medyayê (Xal 17), bi zimanê zikmakî perwerde (Xal 29), çanda xwe jiyîn û bikaranîna mafê zimanê zikmakî (Xal 30), hatiye rawestandî. Rêgezên sereke yên peymanê, yên wek jiyân, li jiyânê mayîn, mafê pêşketinê, qedexeya cihêkariyê, tevlihbûna zarokan di çarçoveya başiya zarokan de hatiye nixandî.

Di çarçoveya çavdêriya vê xebatê de, ji bo mirov têbigihîje bê îdareyên giştî peywîrên xwe yên ji bo mafên zarokan yên zimanê zikmakî bi cî tînin an ew vî karî piştguh dîkin, ji bo vê yekê standardên mafên mirovî yên navneteweyî hatine bikaranîn û nîşaneyên mafên mirovî hatine pêş xistin. Hemû çavdêriyên vê xebatê li gor van nîşaneyan pêk hatiye. Formên hevdîtinê yên ji bo xebatên qadan jî li gor van nîşaneyan hatine amade kirin. Beriya em derkevin li qadan bixebitin, bi kesên diildar yên ku ew ê hevdîtinan bikin re derbarê mafê zarokan û komkirina zanînan de perwerdeyek çêbûye.

Rapora çavdêriyê, li Amedê bi 20 zarokî û bi 40 kesên ku di navbera wan de, dê, bav, mamoste, avakare dibistanê, hunermend, xebatkarê çapemeniyê, nûnerê rêxistina civakî ya sivil û rêvebirên herêmî hene hevdîtinên bi hurgilî kiriye û gihiştîye hin encaman. Di raporê de li gel naveroka hevdîtinan dahûrandina wan jî heye. Di van naverokan de derbarê mafê zimanê zikmakî de mewzûatên netewî û navneteweyî hene. Her wiha zanînen îstatîkî û rewşa polîtîk ya di navbera salên 2010 û 2020'an ku li ser mafê zimanê zikmakî yên zarokan bandor çêkiriye jî di raporê de cî digirin û bandora vê yekê hatiye nixandî.

Di dawîya xebatê de gelek astengiyên li hember mafên zarokan hatine çespandin. Li Amedê, ji bo zarok karibin çanda xwe bijîn û bidin jiyankirin, zimanê xwe yê zikmakî bikarbînin û fêr bibin, bi zimanê xwe perwerdehî bibînin, xwe bigihînin berhemên medyayê û mekanîzmayên gillîkirinê bikarbînin li hemberî van mafên wan astengî hene.

Li gor xala 17'emîn ya BMÇHS ya ji bo zarok karibin bi zimanên xwe yê zikmakî xwe bigihînin berhemên medyayê ev tişt peyda bûne:

- Li Amedê zarok nikarin xwe bigihînin pirtûkên Kurdî û pirtûkxaneyan.
- Weşanên giştî yên bi Kurdî xîtabî zarokan nakin.
- Tv'yên bi Kurdî weşanê dikin, ji bo zarokan zahmetî dikişînin û nikarin naverokên taybet amade bikin. Kesên ku bi weje, muzîk û şanoyê re mijûl in û bi Kurdî dikin bi gelek astengiyên re rû bi rû ne.
- OHAL, kayyum û pêvajoya şer neyênîyek li ser xwe gihandina weşanên bi Kurdî çêdike û mirov nikarin xwe bigihînin weşanên Kurdî.

Li gor xala 29'emîn ya BMÇHS ya mafê perwerdeya zimanê zikmakî a ji bo zarokan ev tişt peyda bûne:

- Ji ber ku li Amedê dibistanên perwerdehiya bi zimanê Kurdî didin tune ne, li her navçeyê dibistan tine ye, temenê kesên ku dibistan perwerde dide wan bi sînor e, ketina lîse û zanîngehan bi azmûnê ye û tenê dibistanên taybet dikarin vebin. Ev rewş dike ku kes nikaribe here saziyên bi Kurdî perwerdeyê didin û li hember vê yekê astengî ava dikin.
- Dewlet ti piştgiyê nade dibistanên ku bi Kurdî perwerdeyê didin. Çavkanîyên saziyan jî ji bo xizmetên xwe bidomînin têrê nake. Li gel van tiştan daxwaziyên perwerdehiya zimanê zikmakî perwerdekarên dixêzê û li ser wan zext çêdibin.
- Bandora OHAL, kayyum û pêvajoya şer dike ku dibistanên Kurdî were girtin û ev dibistan nikaribin perwerdehiya bi Kurdî bidin. Her wiha zarok jî vê yekê bandor digirin û travmayên wan çêdibin.

Li gor xala 30'emîn ya BMÇHS ya mafê çanda xwe jiyîn û bikaranîna zimanê zikmakî a ji bo zarokan ev tişt peyda bûn:

- Li Amedê zarok wek kesên temen mezin nikarin bi Kurdî biaxivin û wek wan nizanin. Travmayên civakî û şexsî dike ku ew kêmtir bi zimanê xwe biaxivin.
- Zarok jî dersa Zimanên Jîndar û Zarave yê a ku li dibistanan didin nikarin sûdê werbigirin. Rewşa polîtîk ya piştî 2015'an ji bo ew xwe bigihîjin vê dersê neyênîyek çêdike ji bo vê yekê.

Li gor xala 2'yemîn ya BMÇHS a derbarê qedexeya cihêkariyê de ev tişt peyda bûn:

- Gava li Amedê zarok rastî neheqiyekê tînin ew nizanin dê serî li kîjan deverî bixin, mekanîzmayên serlêdanê xizmeta bi Kurdî nadin.
- Di wextê çavdêriyê de cûdahiya herî girîng ya ku nahêle zarok mafê xwe yê zimanê zikmakî bikarbînin berastengîbûne. Xizanî jî nahêle ku

zarok bi zimanê xwe perwerde bibînin û çalakîyan bi zimanê xwe pêk binin. Di dema çavdêriyê de polîtîkayeke ku van neyênîyan ji holê rake nehatiye çespendin.

Di raporê de li hember bînpêkirina van mafan, daxwazên zarokan 3 sernavên sereke derxist holê:

- Hînbûyîna ziman ya li malê û bi dê û bavê xwe re bi zimanê xwe axavtin,
- Bi zimanê xwe perwerde dîtin,
- Xwe gihandina pirtûk, TV û agahiyên girseyî yên din ya bi zimanê zikmakî.

Di encama çavdêriyê de, nihêrînên zarokan û daxwazên wan bi baldarî hat dahûrandin. Bi kurtasî hat pêşniyaz kirin ku ev gavên li jêr yên şênber ji bo wan werin avêtin:

- Divê gumanên BMÇHS yên di xalên 17, 29, û 30, yî de û her wiha gumanên mafê zimanê zikmakî yên di peymanên navneteweyî de werin rakirin. Divê piştgirî bidin peymanên ku mafê zimanê zikmakî diparêzin û alîgirê vê yekê bin. Divê guherandina makeqanûnan pêk were û astengiyên li hember bikaranîna zimanê Kurdî rabin. Li hember cihêkariya zarokên ku zimanê wan yê zikmakî bi Kurdî ye bi awakî bandorker divê têkoşînek hebe.
- Divê dê û bavê zarokan ji bo zarok karibin mafê xwe yê zimanê zikmakî bikarbînin piştgiriyê bigirin.
- Divê astengiyên ji ber zagonan yên li hember bikaranîna zimanê Kurdî ya li dibistana werin rakirin.
- Divê hilberîneriya berhemên medyayê yên bi Kurdî werin teşwîqkirin û ji bo zarokan weşangeriya giştî pêk were.
- Li hember bînpêkirina mafên xwe divê zarok karibin xwe bigihînin ciyê serîlêdanê û mekanîzmayên giştî kirinê bikarbînin. Divê ev ciyên îdarî û adlî bi Kurdî xizmetê bide û personelên li wir dixebitin bi du zimanan karibin biaxivin.
- Di derheqê mafê perwerdê a zarokên astengdar û xîzan de tedbîrên bi taybet werin girtin.
- Divê hêza reveberiyên herêmî ya ji bo xizmeta zarokan xurttir bibe û pêş bikeve.
- Ji bo zimanê zikmakî divê daneyên ji hev hatine veqetandin werin komkirin.
- Divê ji nav butceyên van saziyên têkildarî vî karî, ji bo mafên zimanê zikmakî hinek pere were veqetandin.
- Divê raporên derbarê BMÇHS de yên ku Komîteya Mafên Zarokan ya BM dixwaze werin eşkere kirin, divê rapor û çavdêriyên bi encam bûne wergerînin zimanê Kurdî û bê belavkirin.
- Divê ji nûner û zarokan saziyeke şêwirmendiyê ava bibe, tevî pêşniyazên di van raporên de di derbarê hemû biryarên li ser mafê zimanê zikmakî tînin dayîn ji nihêrînên zarokan sûd were girtin û ew jî tevî van birayaran bibin.

DESTPÊK

Tirkiye Peymana Neteweyên Yekbûyî ya Mafên Zarakan (BMÇHS) pejirand. Lê bi hin gumanan xalên 17, 29, û 30'emîn ku mafê zimanê zikmakî yên komên herêmî jî têde ye ev peyman pejirand. Komîteya Mafên Zarokan ya Neteweyên Yekbûyî, di sala 2001 û 2012'an de encamên çavdêriyên xwe yên di derbarê Tirkiyeyê de anî ziman û van gumanan bi diltirsî pêşwazî kir. Nemaze ji gumanên xwe yên derbarê perwerde, azadiya axavtinê, çanda xwe jiyîn û mafê bikaranînan zimanê zikmakî de. Makaqanûna Komara Tirkiyê û Peymana Aştiyê ya Lozanê a di sala 1923'an de hatibû îmze kirin li ser komên etnîk yên herêmî û bi taybetî jî li ser zarokên Kurd bandorên neyênî derxistiye holê. Komîte diyarkir ku divê zarokên Kurd baştir werin parastin û her wiha divê derfetên çê ji bo hemû zarokan werin ava kirin. Ji bo vê jî ew xwestinê û teşwîqkirine ku Tirkiye van gumanên xwe ji holê rake. Piştî encama van çavdêriyan Tirkiye di sala 2019'an de 4 û 5 an yên periyodîk amade kirin û peşkeşî komîteyê kirin. Tirkiye xalên makeqanûnê yên 2, 3, 4 û 10 wek hincet nîşan da û ev tişt got ji komîteyê re, "Xebatên me yên ku em li gor pêşniyazên we dixwazin van gumanan di ber çavan derbas bikin û betal bikin berdewam dikin."¹

Li Tirkiyê, di sala 2013 û 2015 an de di dema hevdiştinên aştiyê yên ji bo çareserîya pirsgrêka Kurd de ji bo zimanê zikmakî ê zarokan hin xebat çêbûn ango pêk hatin. Lê piştî sala 2015'an dîsa pêvçûn destpê kirin² û di sala 2016'an de darbeya leşkerî pêk hat û dûre jî OHAL hat herêmê.³ Piştî van qewimînan gelek saziyên ku xizmet didan zarokan hatin girtin, karyûm avêtin ser rêveberiyên herêmê û ev yek li hember xwe gihandina mafê zimanê zikmakî yên ji ji boy zarokan astengi derket holê. Girêdayî vê pêvajoyê ji bo em tiştên derbarê mafê zimanê zikmakî de fêhm bikin û azmûn û pêşniyazên zarokan karibin biparêzên me mecbûr dît ku em hin çavdêriyan bikin û van çavdêriyên xwe wek raporekê amade bikin. Di Çarçoveya Mafên Mirovî yên Navneteweyî de, bi piştigiriya bernameya Ji Bo Em Bişopînin Em Çalak in ya YE yê me xebata xwe ya çavdêriyê bi dawî kir. Geşedanên derbarê mafên zimanê zikmakî û gumanên li ser xalên BMÇHS yê dê li ser zarokên Kurd bandorek çewa bihêle, me ev yek lêkolîn kir û bi çavdêriyan raporek amade kir.

1- Girêdanên raporên periyodîk û encamên çavdêriyan:

<https://www.ailevecalisma.gov.tr/chgm/mevzuat/protokoller/>, <https://ailevecalisma.gov.tr/chgm/sayfalar/cocuk-haklari-sozlesmesi-ulke-raporlari/>,
<https://insanhaklarimerkezi.bilgi.edu.tr/content/141-cocuk-haklar-komitesi/>

2- Li gor Weqfa Mafê Mirovan ya Tirkiyeyê, "Di sala 2015'an de derheqê pirsgrêka Kurd de bi riya demokratîk û aştiyane bernameyê bi rêk û pêk nehat amade kirin. Bandora geşedanên Rojhilata Navîn piştî Hilbijartinên Giştî ango di 7ê Hezîranê de li Tirkiyê şer qewimiye û rewşeke ne baş derketiye holê. Di vê pêvajoyê de Tirkiye Makeqanûna xwe û Peymana Mafên Mirovan ya Ewropa bînpê kir û rêgezên sereke yên mafên mirovan pêk neanî û di ser re jî bi biryareke dijhiqûqî da û derketina kolanan bê wext qedexê kir û hin zagonên nû di 16ê Tebaxa 2015'an de xist meriyetê. Cara yekemîn e ku li Tirkiyê tiştek wiha diqewime. Berê biryareke bi vê şeweyî ya ku bê wext û fermî derketina kolanan hate qedexekirin nehatibû girtin." Ji bo hurgiliyan hûn dikarin binihêrin: <https://tihv.org.tr/sokaga-cikma-yasaklari/>

3- Piştî darbeya leşkerî ya 15 Tirmeha 2016'an li Tirkiyê bi giştî piştî 21 ê Tirmeha 2016'an bi qasî 3 mehan rewşa awarte hat îlan kirin. Rewşa Awarte 7 caran hat dirêjkirin, piştî 2 salan di 18 Tirmeha 2018'an de bi temamî hat rakirin.

ARMANC & ÇARÇOVE

Bi vê xebatê armanca me ya sereke ew e ku em mafên zimanê zikmakî yên zarokan bişopînin, astengiyên li hember van mafan bidin nîşandan û li gor nihêrînên zarokan polîtîkayan peşniyaz bikin.

Me di rapora xwe de xalên bi guman yên Peymana Mafên Zarokan ya Neteweyên Yekbûyî ên wek 17, 29 û 30 emîn li gor mafên zimanê zikmakî yên zarokan hilgirtîye dest û nirxandiye.

Bi vê xebatê hatiya armanckirin ku ji bo zarokên li Amedê dijîn çavdêriya mafê zimanê zikmakî û astengiyên li hember van mafan were kirin û li gor nêrînên zarokan polîtîka werin pêşxistin. Di vê xebatê de li ser xalên Peymana Neteweyên Yekbûyî ya Mafê Zarokan (BMÇHS) yên ku ji bo Tirkîyê bi guman hatine dîtin, yên wek, xwe gihandina berhemên medyayê (Xal 17), bi zimanê zikmakî perwerde (Xal 29), çanda xwe jîyîn û bikaranîna mafê zimanê zikmakî (Xal 30), hatiye rawestandî. Rêgezên sereke yên peymanê, yên wek jîyan, li jîyanê mayîn, mafê pêşketinê, qedexeya cihêkariyê, tevliûbûna zarokan di çarçoveya başiya zarokan de hatiye nirxandin.

Di encama seta nîşaneyan ya ku me pêş xistiye de me sernavên mijarên ku em ê derbarê wan de daneyan kom bikin û her wiha çavkaniyên xwe diyar kir. Rapora me xwe dispêre hevdiîtinên me yên derbarê zimanê zikmakî yê zarokan, her wiha agahiyên îstatîkî jî yên li ser maseyê hatine girtin jî di çarçoveya raporê de ne. Rewşa polîtîkî ya di navbera 2010 û 2020'an de ya ku li ser zimanê zikmakî yên zarokan bandor hêlaye jî di raporê de ciyên xwe digirin.

RÊBAZ

Me ji bo xebata xwe ya çavdêriyê bajarê Amedê hilbijart. Zimanê zikmakî li Amedê bi Kurdî ye û gelek zarok lê dijîn. Amed navenda zimanê Kurdî ye. Her wiha ew bi geşedanên civakî bandora xwe li ser polîtîkayên mafê zimanê zikmakî jî çêdike û ji bo vê jî ew wek navendek tê pejirandin. Ev hêlên wê kir ku em xebata xwe li vir pêk bînin.

Me di 20 ê Mijdara 2020'an de dest bi xebata xwe kir. Ev roj ji bo me bi wate bû, ji lewre Roja Mafê Zarokan a Dinyayê jî ev roj dihate pîroz kirin. Di serî de me xwest em hîn bibin bê ka îdareyên giştî peywîra xwe ya ji bo mafê zimanê zikmakî tînin cî an na, ji bo vê yekê me standardên mafên mirovî yên navneteweyî bikaranîn û nîşaneyên mafên mirovî pêş xist û hemû xebata xwe li gor vê seta nîşaneyan bi rêve bir. Bi riya van nîşaneyên ku me ew amade kirin me formên ku em ê li qadan bikarbînin amade kir. Kesên ku ew ê tevli vê xebate bibin di derbarê mafên zarokan û daneheva agahiyan de hatin perwerde kirin.

4- Gösterge setini, raporun sonunda yer alan ek bölümünde bulabilirsiniz.

Di nav 3 mehan de me bi 20 zarokî, 12 dê û bavî, 12 nûnerên rêxistinên civakî yên sivil, 6 mamoste, 2 damazirînerê dibistanê, 3 rêvebirên herêmî, 5 hunermend û xebatkarê çapemeniyê ji têde bi tavahî 60 kesan re hevdişinê kir.

Piştî hevdişinên me bi dawî bûn me hemû dengên tomarkirî sererast kir û derbasî nivîsê kir. Ji bo her beşdarvanekî/ê me tîp û hejmaran amade kir, bi vî awayî di wextê analîz û rapor girtinê de me rê li ber girt ku agahî tevli hev nebin. Li gor van hejmar û tîpan, zarok bi tîpa Ç, dê û bav bi tîpa E, hunermend û xebatkarên çapemeniyê bi tîpên SM, damezirînerê dibistanê bi tîpa O, mamoste bi tîpa Ö, nûnerên rêxistinên civakî yên sivil bi tîpên STÖ, rêvebirên herêmî bi tîpa Y hatin binavkirin û li gor van tîpan derbasî raporê bûn. Em bi baldarî nêzî armanc û mijara rapora xwe ya çavdêriyê bûn, me daneyên xwe bi rêbaza analîzê sinifand û bi daneyên xwe yên ser maseyê re anî gel hev û wan bi hev re şirove kir.

Gava me kesên em bi wan re hevdişinê bikin hilbijart, me got bila ew kes yek reng nîn bin, ji lewre jî, rewşa wan ya zayendî, rewşa aborî û civakî, asta perwerdeyê, pişeya wan û saziya lê dixebitin me di ber çavan re girt û xwest temsîliyetek baş çêbe. Zarokên ku temenê wan di navbera 13-17 salî de bûn, me rewşa wan ya temen û zayendiyê wekhev parve kir. Em li zarokên ku pêdiviyên wan yên taybet hene jî fikirîn û me beşek taybet veqetand ji bo van kesan. Di vê çarçoveyêde me bi zarokekî berasteng re hevdişin pêk anî. Me bi kesên temen mezin re jî hevdişin pêk anî. Li gel dê û bavan, me bi nivîskar, weşanger, xebatkarê televizyonê, muzîkjen, şanoger, perwerdekar, xwediyê kolejan, damezirînerê kreşan û perwerdekarên re yên ku di karên xwe de profesyonel in jî hevdişin kir. Me ji gelek pişeyî yên wek derûnî, perwerde, xizmetên civakî û hiqûqî sûd wergirt; nûnerên rêxistinên civakî yên sivil û rêvebirên herêmî guhdar kir û wan jî tevli karê xwe kir û em bi wan re jî xebitîn. Bi vî awayî bi gelek mirovên cihêreng yên ku karên cûda dikin re me hevdişin kir, ji azmûn û cerebeyên wan sûd wergirt û li rapora xwe zêde kir.

Mafê zimanê zikmakî rasterast û bi kurahî li ser jiyana zarokan bandorê çêdike lê heya niha kes serî li nêrînên wan nedaye û daxwazên wan çî ne nepirsiye. Ji lewre em vê mijarê re rû bi rû man. Lê em dizanin zarok di mijarên derbarê wan de pîspor in, gava ku fersenda xwe îfadekirinê bibînin ew dizanin dê çî bixwazin. Ji ber van sedeman me cerebe û pêşniyazên zarokan ji bo rapora xwe kire navend û rapora xwe jî li gor pirsgerîkên mafê zimanê zikmakî amade kir. Em hêvî dikin ku ev rapor û xebata me ya çavdêriyê nêrîneke nû bîne vê qadê bibe palpişteş ji bo vê mijara girîng.

SÎNOR & DERFET

Di wextê xebatê de çavdêrî sînor û derfetên bi me re peyda bûn em dixwazin parve bikin da ku agahiyên di raporê de û her wiha naveroka raporê baştir were fêhmkirin.

Di wextê hevdfîtinan de 5 zarokên ku me li gel wan têkilî danî nexwastin tevî xebata me bibin, li gor çavdêriyên me ji wan hin zarok pirsên me yên di derbarê Kurdî û neteweyê de bersivandin lê ji hin tiştan jî reviyên û negotin. Di 3 hevdfîtinên me de dê û baven zarokan wan bi tenê nehiştin û ji paşve bertek nîşan dan ku zarok neaxivin û bêdeng bimînin. Piştî hevdfîtin qediya şûnde ji malbatê yek li me geriya û got ku zarokê min dixwest gelek tiştan bibêje lê ji ber ew tirsîya nikaribû zelal biaxive. Ev rewş bi xortanî û xametiye ve girêdayî ye lê li gel vê yekê gava ew bi zimanê zikmakî diaxivin xwe bi ewle hîs nakin. Ev îhtimal jî me xist nav fikaran.

Li gel ku zimanê wan yê zikmakî Kurdî ye û nikarin bi Tirkî biaxivin ji hin malbat zimanê Tirkî tercîh kirin û ji bo bi zarokên xwe re bi Tirkî biaxivin bi îrsar tevgeriyan. Ev nêzikatiya dayikan û tîrsa wan ya ji zimanê zikmakî hin pirsan derxist holê. Hin kes jî gotin ku ew ê nikaribin di vê xebatê de cî bigirin, hin kes hevdfîtinên online jî nepejirandin û gotin tenê em dikarin bi nivîskî tevî xebatê bibin. Hin kes pirsên me bi hurgilî nebersivandin û hin kes jî gotin ku ji ber ewlehiyê ew ditirsin û nikarin pirsên me bibersivînin. Ev tişt giş me bi sînor kirin. Çavdêriya di nav şer de û travmayên van kesan di raporê de hene û ev yek nîşaneyên sînoran e.

Li gel van sînoran gelek kesên me bi wan re hevdfîtin pêk anîn pêdiviya bi zimanê zikmakî anîn ziman û piştgiriye dan xebata me û bi me re hevkarîye kirin. Nihêrîn û dfîtinên xwe li gor serboriyên xwe û şahidiya xwe anîn ziman, ji bo em astengiyên li hember zimanê zikmakî bi nav bikin berê me dan çakaniyeke kûr û dewlemend.

Wek koma lêkolînê, beriya em dest bi hevdfîtinan bikin, me bi kargehekê lidar xist û çarçoveyeke efîk ava kir. Me got “em ê bi zarokan re hevkarîye bikin û bi hev re bişopînin”. Me dahûrandina rîskê kir û pirsên di formên xwe de li gor mafê tevlibûna zarokan amade kir. Me got di vê formên me û pirsên me zarokan pêş bixe û agahiyên wan nepen bimînin û bi vî awayî li raporê werin zêde kirin. Em di vê mijarê de jî bi baldarî tevgeriyan û me berpirsariya xwe anî cî.

Me xwest em rewşa heyî ya mafê zimanê zikmakî bi zarokan re û ji bo zarokan veçîrînin. Armanca xebata me ya çavdêriyê ev yek bû. Piştî me hevdfîtinên xwe bi dawî kir li gel hemû tîrs û zexta ku zarokan bi sînor dikir ji zarok dixwestin biaxivin û hest û nêrînen xwe binin ziman. Ew pêdivî bi derfeta ku ew ê bihêle axavtinên xwe azad bikin didîtin. Me ev yek bi wan re dfît:

“Ez spas dikim ji bo pirsên we. Bi taybetî ji bo ku hûn vê axavtinê li gel min dikin. Ji lew re wek zarokekî ez gelek kêfxweş bûm bi vê yekê ku min fikrên xwe yên derbarê zimanê xwe yê zikmakî de anî ziman. Ev yek min rehetkir ku û motive bûm. Ji ber wê ez ji we re spas dikim.” Ç3

PAŞXAN

Mafê ziman têgeheke fireh e, lê mirov dikare wiha pênase bike; bikaranîna zimanê zikmakî ya li ciyê taybet û giştî.⁵ Tirkiye ji gelek peymanên ku mafê ziman diparêze re nebûye alîgir.⁶ Ji yê ku bûye alîgir jî bi çend xalan gumanên xwe aniye ziman.⁷ Her çiqas mafê dewletan yê ku ew bi guman nêzî peymanan bibin hebe jî hincetên ne di rê de û yê ne rast nayên pejirandin.⁸ Komîteya Mafê Zarokan ya BM yê jî dide zanîn ku pejirandina bê şert û mercya peymanê li hember zarokan rêzgirtineke û divê ev peyman bêyî gumanan were pejirandin.⁹ Di vê çarçoveyê de gumanên Tirkiyeyê û qedexeweyên cihêkariyê yê di peymana BMÇHS ê de cî digirin hevû nagirin.

Di Makeqanûna Komara Tirkiyeyê de tê gotin ku zimanê fermî Tirkî ye û ji xeynî zimanê Tirkî bi ti zimanê li dibistanan perwerde nayê dayîn. Xalên li ser zimanê zikmakî yê Makeqanûna Tirkiye li hember pêşxistin û perwerdeya zimanê zikmakî astengiyan derdixe holê. Ev astengi nêhêlin ku zimanê zikmakî li ciyên taybet û giştî were bikaranîn¹⁰.

Mevzûatên netewî yê li Tirkiye çewa ku em ê di beşên pêş yê raporê de jî bînin ziman, ji bo pêşketina zimanê Kurdî ya di perwerde û çapemeniyê de kêmbê jî astengiyan radike lê ev guhertinên wan ji jiyana zarokan dûr in. Lê hemû peyman û daxwaznameyên navneteweyî, ji bo mafê zimanê zikmakî ji peywîrên neyênî bêtir peywîrên erênî yê dewletan bibîr dixê û destnîşan dike. Ev yek jî tê vê wateyê ku divê mirov ji qedexeyên dewletê derbas bike û ji bo zarok karibin mafê xwe bikaribînin hin tevdiran bigire.

Li gel van rastiyan, divê dewlet astengiyan li hember mafên zarokan yê ku asta wan di bin neteweyekê de ne û komên etnîk in rake û vê pirsgirêkê pênase bike.¹¹ Ji bo pêşî li cihêkariyê bigire divê bi riya zagon, çavkanî, polîtîka û bernameyan agahî angoyê daneyên ji hev veqetandî tomar bike . Di vê çarçoveyê de Komîteya Mafê Zarokan ya BM yê, di sala 2012'an de encama çavdêriyên xwe parve kir û da zanîn ku kêmasiya Tirkiyê di warê agahî û daneyên jihev veqetandî de heye. Ji bo rewşa hemû zarokan da ku dahûrandineke hêsantir pêk were Tirkiye hat hişyar kirin. Li gor, temen, zayendî, erdnîgarî, bingeha etnîk û civakî û aborî hin beş hatine veqetandin da ku bi rêk û pêk û berfirehtir agahiyan kom bikin. Komîteya Rakirina Cihêkariya Nijadî ya BM yê jî di encama çavdêriya xwe ya di sala 2016'an de diyar kir ku Tirkiye ji hêla zimanê zikmakî û zimanên din ve agahiyên bi

5- Di derbarê Mafê Ziman yê Neteweyan de Pêşniyazên Oslo'yê û Nişeyên Ravekar, Sibet 1998.

6- Şerta Ewrûpa ya Zimanên Herêmî , Çarçove û Peymana Konseya Ewrûpa ya Parastina Civakên Herêmî, Peymana UNESCO ya Li Hember Cihêkariya Perwerdeyê. Pêveka Protokola 12'êmin.

7- Xalên BMÇHS yê 17, 29, 30'êmin, Xala 27'an ya Peymana BM yê ya Mafên Siyazî û Medenî, Peymana BM ya Mafê Aborî, Civakî û Çandî, xala 13/3-4.

8- Xala BMÇHS ya 51'an, Peymana Viyanayê ya Derbarê Hiqûqê de.

9- Peymana Mafên Zarokan, Derbarê Pêkanîna Tevdîrên Giştî û Şiroveyên Giştî No. 5 (2003).

10- Ji bo nixandineke bi hurgilî: Inceoğlu, Sibel. "Di perwerdehiyê de ciyê ziman: "Belgeyên Navneteweyî û Makeqanûna Nû." Zanîngeha Marmara Kovara Lêkolînê Hiqûqê 192 (2013): 151-164.

11- Zarokên herêmî û Mafê Di Çarçoveya Peymanê de, Şiroveya Gelemperî No.11 (2009)

ewle kom nekiriye û xebateke berfireh pêk neaniye. Ji bo pêkanîna peymanê ji Tirkîye tê xwestin ku agahî û daneyên xwe yên derbarê vê mijarê de berfirehtir bike û baştir kom bike¹². Lê Tirkîye di rapora xwe ya 4 û 5'an ya Periyodîk ku ew pêşkeşî Komîteya Mafê Zarokan ya BM yê kiriye de dibêje ku li gor zagonan cihêkarî pêk nehatiye û mafên zarokan hatine naskirin. Ji lew re jî derbarê vê mijarê de îstatîstîkên fermî nehatine girtin û pêdivî bi dahûrandina vêyekê nehtaye dîtin.

Ji dil jî gava me li ser maseyê lêkolîn kir û xwest xwe bigihînin çavkaniyên fermî yên derbarê mafê zimanê zikmakî yên zarokan, me ti îstatîstîkên rojane bidest nexist. Di stratejî û belgeyên wezareta ku bi vî karî re mijûl e de jî em rastî mafên zimanê zikmakî yên ji bo zarokan nehatin. Zagona Rêveberiya Navendî ya Budceyê heta niha di vê derbarê de axavtinekê nekeriye, ji lewma jî em rastî budceyake ku ji bo zarokan hatiye veqetandin nehatin û me tiştek bi vî rangî neçespand¹³.

Gava mirov van agahiyan giş bi hev re dinirxîne, mirov dibîne ku li Tirkîyê mafê zimanê zikmakî ê zarokan nehatiye mîsogerkirin û nexşerêyeke ku van mafên wan bixe meriyetê jî tine ye. Axavtina bi zimanê zikmakî bandoreke erênî li ser dinyaya zarokan çêdike lê ji ber ku xebatek çê nehatiye kirin mirov bi hêsanî nikare li ser mijarê hûr bibe. Ji lewma me xwest em listeyeke ku mafên hatine binpêkirin çêbikin. Pêdivî bi çavdêriya vê yekê heye û divê xebatek derbarê ya mafên hatine binpêkirin de were pêşxistin.

12- https://insanhaklarimerkezi.bilgi.edu.tr/media/uploads/2020/12/08/CERD_C_TUR_CO_4-6_E.pdf

13- Komîte encama çavdêriyên xwe ya derbarê Tirkîyeyê de di sala 2012'an de, bi sernavê Belavkirina Çavkaniyan, di xala 19'an de Tirkîyeyê wiha hişyar kir "Bi taybetî jî zarokên ku ji civakê hatine dûr xistin, bandora aboriya li ser wan, bikaranîna aboriya ji bo wan divê li gor herêmê binirxîne, budçeya aboriyê divê li gor vê yekê were diyarkirin û di rapora periyodîk ya were de derbarê vê mijarê de agahî bînin dayîn". Lê Tirkîye, di raporên xwe yên periyodîk yên 4 û 5'an de derbarê aborî û budçeya zarokan de agahiyan kêmtir da û li gor daxawzên komîteyê raporeke baş amade nekir.





PEYD

Mafê Çanda
Xwe Jîyîn û
Bikaranîna
Zimanê
Zikmakî yên
Zarokan

MAFÊ ÇANDA XWE JÎYÎN Û BIKARANÎNA ZIMANÊ ZIKMAKÎ YÊN ZAROKAN

Mafê ziman, wek mîsogerkirina çanda xwe jîyîn û bi nasnameya xwe hebûna xwe parastin tê pênasekirin. Çikû zimanê zikmakî yê şexsan bingeha çand û nasnameya wan e. Xala 27'an ya Peymana Mafên Medenî û Siyasî a BM yê û her wiha xala 30'yan ya BMCHS ê ku Tirkiye bi guman nêzî van xalan dibe, diyar dike ku civakên din yê di bin banê dewletekê de xwedî maf in ku wek ferdên din yê wê civakê û dewletê çanda xwe bijîn, ji ola xwe bawer bikin û zimanê xwe yê zikmakî bikaribînin. Ev xal dibêjin ku divê ev ferd ji vî mafê bêpar neyên hiştin. Li gor peymana ku tê bi lêv kirin û hikmên wê yê ku tîne ziman dibe ku pêdivî bi vesazkirineke taybet tine be û ev rewş hin pirsan ava bike di serê mirov de. Lê li hember civakên din yê di bin banê dewleta Tirkîyê de roj bi roj cihêkarî zêdetir dibe û ev yek her tim domdar e. Ev yek jî dike ku bi xalên nûtir mafên van civakên din werin mîsogerkirin. Ev pêdiviyê mecbûrî ye¹⁴.

Têkiliya di navbera zimanê zikmakî, kokên etnîk û çandê girînge. Di xebata me ya çavdêriyê de ev rastî derket holê. Kesên ku me bi wan re hevdiîn pêk anî, çi zarok û çi jî mezin bi baldarî ev tişt anîn ziman. Şexs, xwe û çanda xwe bi zimanê zikmakî îfade dikin û xwe li ser vê bingehe pênase dikin. Yek ji van kesan wetaya mafê zimanê zikmakîwiha bi lêv dikir:

*"Zimanê zikmakî pirr cûda ye, ji lew re ziman tewawker e bi taybetî jî zimanê zikmakî. Heger ferd bi Kurdî zanibin ew bi civaka xwe re jî tîne gel hev. Ew aheng û lihevhatin çêdibe bi ziman, lê heger bi zimanê pergale yê ku ew li ser wan ferz dike bi axivin û xwe bi vî zimanê îfade bikin dê bibin biyaniyê zimanê xwe û dê nikaribin xwe bidin naskirin. Zimanê zikmakî tenê ziman nîn e, zimanê zikmakî çand e, kevneşopî ye, rabirdû ye, rehên etnîk e. Heger civakek bixwaze xwe nas bike ango xwe bi rabirdû û dahatûya xwe pênase bike vî tiştê herî baş bi zimanê zikmakî dikare bike. Bi zimanê zikmakî dikare bigihîje rastiya xwe. Ji lewma ez dixwazim civak derbarê zimanê zikmakî de were hişyarkirin, hêvî dikim ku civaka me di vê mijarê de bêtir bibe xwedî agahî."*Ç3

*"Em civakek in û heger zimanê me tine be em nikarin civakekê bi rêve bibin. Ji xwe fîdenê zimanê me maye, heger ziman jî tinebûya dê Kurd tine bibûna."*Ç15

*"Zarok jî dixwazin tiştên bi Kurdî, tiştên di çanda wan de hene guhdarî bikin û ev yek pirr li xweşa wan diçe. Ji ber ew perçeyekî xwe tîde dibînin û dihesibînin. Ji ber wê divê her tişt bi zimanê zikmakî be."*STÖ9

14- Pirtûka Destan ya Peymana Mafên Zarokan, Fona Zarokan ya Neteweyên Yekbûyî (2002), s.459

BIKARANÎNA ZIMANÊ ZIKMAKÎ YÊN ZAROKAN

Bikaranîna zimanê zikmakî perçeyekî nasname û çanda şexsan e, yek ji wan mafê ku me şopand jî ev maf bû. Ji ber van sedeman me ji kesên ku tevî xebata xwe kir pirsî bê ka ew li ciyên taybet û giştî zimanê xwe yê zikmakî dikarin bikarbinin an na. Hemû beşdarvanên vê xebatê yên temen mezin anîn ziman ku zimanê wan yê zikmakî Kurdî ye. Hin malbat gotin ku ew di malê de bi giştî bi Kurdî dipeyivin lê carna bi zarokên xwe re ew bi du zimanî jî diaxivin û têkiliya du zimanî ava dikin. Hin beşdarvan jî gotin ku ji ber zarok bi Kurdî nizanin em bi wan re bi Tirkî diaxivin:

“Du zarokên min yê biçûk qet nizanin, yê din jî fêhm dikin lê nikarin biaxivin. Gava ez bi Kurdî diaxivim zarokên min matmayî li min temaşe diikin.” E2

“Ji serdî 70ê em bi Tirkî diaxivin, lê ji serdî 30 ancax bi Kurdî diaxivim, ev yek jî rastiya min e, niha ez rabim bibêjim ez bi zarokên xwe re bi Kurdî diaxivim ez ê derewan bikim.” E5

Di hevdiîtinan de me ji 20 zarokî pirsî bê ka zimanê wan yê zikmakî çi ziman e, nivî ji wan gotin ku zimanê wan yê zikmakî Kurdî ye û li malê bêtir bi vî zamî diaxivin; ji wan 7 kesa jî gotin ku zimanê wan yê zikmakî Tirkî ye; 3 ji wan jî gotin ku hem Tirkî hem jî Kurdî zimanê wan yê zikmakî ye:

“Kurdî, Tirkî. Erê tevlihev.” Ç10

“Zimanê diya min kîjan be zimanê min jî ew e. Ez bi Tirkî diaxivim lê hinek jî bi Kurdî dizanim.” Ç17

“Tirkî lê mamoste zimanê me yê zikmakî Kurdî ye, lê em bi Tirkî diaxivin.” Ç19

Ji wan 7 zarokên ku digotin zimanê me yê zikmakî bi Tirkî ye, di nav malê de bêtir zimanê Tirkî bikardianîn lê bi dê û bavên xwe re û her wiha bi xizmên xwe re bi Kurdî diaxivîn. Ev jî nîşan dida ku zimanê wan yê zikmakî Kurdî bû. Zarok ji zimanê xwe re biyanî bûn, di wextê çavdêriyên li qadan de tiştê herî zêde bala me kişand ev yek bû û ev tişt peydabûnek girîng bû. Yek ji sedemên ku zarok zimanê xwe yê zikmakî wek Tirkî dihesibandin ev bû; hin ji wan zarokan qet bi Kurdî nizanibûn û li dibistanê jî ev ziman nedihat bikaranîn. Tenê 3 zarok gotin ku em li dervayî malê bi Kurdî diaxivin, zarokên mayî giş gotin ku em li derve di nav jiyana civakî de zimanê Tirkî bikartînin û zimanê têkiliyên me Tirkî ye:

“Ji ber ku ez zêde bi Kurdî nizanim bi Tirkî diaxivim.” Ç16

“Mamoste li her derî Tirkî, ez qet bi Îngilîzî nizanim.” Ç18

“Yanî mamoste bi gelemperî ez li her derî bi Tirkî diaxivim. Yanî ji ber ku ez bi zimanê Kurdî nizanim, mamoste ez jî dixwazim zimanê Kurdî bikarbînim lê ji ber ku nikarim baş biaxivim ez bi Tirkî diaxivim.” Ç19

SEDEMÊN NEAXVTINA ZAROKAN YA BI ZIMANÊ ZIKMAKÎ

Beşdarvanên ku temenê wan mezin bûn, sedemên neaxvtina zimanê Kurdî ya li qadên civakî a zarokan bi dibistanê ve girêdan û gotin ku ew mecbûr dimînin li dibistanê bi zimanê Tirkî biaxivin. Televizyonên ku temaşe dikin û ciyên civakî bêtir zimanê Tirkî bikartînin. Fikrên gelek kesî di vê mijarê de wek hev bûn. Ji ber ku li dibistanê û qadên civakî Tirkî serdest e serê wan zarokan tevlihev dibe û ew jî berê xwe didin zimane Tirkî:

“Em bi zimanê zikmakî li ber xwe didin, nahêlin ziman were jibîrkirin lê zimanê perwerdeyê bi zorê dikin Tirkî, ji ber ku alternatîfek nayê çêkirin nakokî derdikevin holê. Pirr zimanî ji hêlekê ve heya bêje kesan azad dike, yên din jî bi sînora dike, pirsgirêk jî ev e. Ji lewma zarok her çiqas Kurdî hîn bibin jî heger ev yek wernegere zimanê perwerdeyê xeyalên wan dûrî zimanê Kurdî dimîne û sînora çêdibin.” E8

“Piştî ku zarok dest bi dibistanê dikin, televizyon, kolan, sûk û dibistan giş bi Tirkî ne. Bi taybetî jî dibistan, dibistan pirr girîng e di vê mijarê de. Û li mal jî tê gotin ku ew ziman yê dê û bavê min e, bi vê têgihiştinê nêz dibe û berê xwe dide zimane Tirkî.” STÖ4

“Piştî 6-7 salî li her derî, televizyon, derdora civakî, dinyaya dibistanê giş bi Tirkî ye. Piştî demekê zarok jî dibêje ‘ez çima li mal tîm ceza kirin, hevalên min û mamosteyên min û hemû derdora min bi Tirkî û Îngilîzî ye. Ev ziman bêtir populer in’ û Kurdî piştguh dike û dike zimanê xwe yê sêyemîn. Te di dinyaya zarokan e, berê xwe dide tiştê populer.” Ö3

Di hevdiîtinên ku me li gel nûnerên rêxistinên civakî yên sivil, rêvebirên herêmî û perwerdekarên pêk anî de, derbarê bikaranîna zimanê zikmakî a zarokan de ev tema derketin pêş: tirs, şerm û travma. Di vê çarçoveyê de hat diîtin ku zarok ditirsin bi zimanê xwe yê zikmakî biaxivin. Çavkaniya tîrsa wan jî azmûn û travmayên di serê wan de derbas bûyî ne. Ev yek zorê daye wan û hestên ne baş bi wan re çêkiriye lê ew carinan bi têkiliyên ewle xwe jî vê rewşê dûr xistine. Lê timî caran jî ji ber ku ew bi zimanê xwe yê zikmakî nikaribûne biaxivin tade li ser wan çêbûye û ev yek wan di şermê de hiştiye. Li gor agahiyên dê û bavên zarokan li qadên taybet û giştî asta bikaranîna zimanê zikmakî ya zarokan her ku diçe kêmtir dibe. Bi taybetî jî şêrê di sala 2015'an de yê li vê herêmê qewimiye bandorek neyênî çêkiriye li ser vê yekê. Beşdarvanên ku bi zarokan re çalakiyan pêk anîn sedemên dîrketina jî zimanê zikmakî ya zarokan di ser çavdêriyên xwe re anîn ziman:

“Zarok ditirse ku bi zimanê zikmakî biaxive, ji lewre ew hemû êşên xşwe, travma û destdirêjî bi vî zimanê diîtiye. Dê ew zarok çewa xwe bi vî zimanî bîne ziman, tenê heger bi te bawer bibe dikare bikaribîne vî zimanî. Li taxa ku lê dijîm, a rastî niha hat xerakirin, ne ew tax ma û ne jî ew zarok, ew mirov ji sedî 90 bi Kurdî diaxivin. Gava min li wê taxê dest bi vê xebatê kir, ew zarok nikaribûn xwe bi Tirkî binin ziman, lê bi îsrar digotin em ê xwe bi zimanê Tirkî binin ziman, bi zimanê Tirkî. Je ber ku ji zimanê Kurdî şerm dikin û wisa dibînin. Zimanê ku em pê dijîn mixabin travmayek e, mixabin.” STÖ6

“Di derbarê zimanê zikmakî de xwedî agahiyên şaş in, gelek tirsên wan hene, ji nav malê û dervayî malê tirsek heye, xwe paşve kişandin, xwe girtin heye. Bi taybetî jî piştî şerê Sûrê zarok bêtir ji ziman dûr ketin û asta ziman daket jêrê. Li gor agahiyên ji derdorê girtine, xwe ji vê pêvajoyê berpirsyar dibînin, ji bo pêşeroja perwerdeya xwe, wisa hîs dikin ku ji bo kar dê ev ziman bibe pirsirêk û astengî derxe ji wan re.” STÖ1

“Tenê zimanê dê û bavê wan e, gava diçin parkê hevalên wan bi vî zimanê xeber nadin. Ev rewş tesîrek ne baş çêdike bi zarokan re, wek ku kesekî cûda be, gava diçe ciyekî nikare xwe îfade bike, ji ber ku bi Kurdî diaxive şerm dike. Niha jî û berê jî gelek tiştên wiha qewimîne. Di encamê de ji ber ku zimanê Kurdî xerab hatiye dîtin, ew kes jî dibêjin heger em biaxivin wê me wek kesên ne baş, nezan bibînin û ji zimanê Kurdî dûr dikevin.” Y2

“Hin zarokên ku li Sûrê dijîn di navbera hev de bi Kurdî xeber didan lê têkiliya wan ya bi me re her tim bi zimanê Tirkî bû. Gava me bi Kurdî bi wan re diaxivî ew bi Tirkî bersiv didan me. Di nav civakê de wisa tê hîskirin ku Kurdî mirov paşve dixê, bi şerm nezî zimanê Kurdî dibin.” STÖ10

Beşdarvanên temen mezin, anîn ziman ku krîmînalîzekirina axavtina bi Kurdî li ser bikaranîna zimanê zikmakî ya zarokan bandorên neyênî çêdike. Ji bilî mafekî xwezayî ew wek xwestekeke siyasî dîtin, wek ku xwestina vî mafî çalakiyeke terorê be, wiha dîtin:

“Xwestina ziman tê krîmînalîzekirin, ew bi terorê ve girê didin û tişteki dabeşkar dibînin. Ji ber van sedeman jî xwedî derketina li vî zimanê wêrekî dixwaze, lê ev mafê me yê herî xwezayî ye.” STÖ4

“Ez di nav dûnikê de dibêjim, axavtina zimanê zikmakî wek ku çalakiyeke terorê be tê dîtin, ji ber van agahiyên şaş mirov bi tirs nêzî dibin.” STÖ1

“Axavtina bi Kurdî, fêrbûna bi Kurdî wek sekneke polîtîk tê nirxandin. Ji bo vê yekê pêdivî bi şoreşa zihnî heye.” Ö1

Li gor çarçoveya me ya efîk, me biryar girtibû ku em ê pirsên zimanê zikmakî yên travmayên zarokan tînin bîra wan û ew aciz dikin nepirsin. Rasterast me pirsan dirêjî wan nekir lê çavdêriyên mezinan û tiştên anî ziman gotinên zarokan yê vê derbarê de bûn yek. Pirsên me yên derbarê zimanê Tirkî de nîşan da ku zarok difikirin zimanê Kurdî qedexe ye, me ev yek çespanî. Her çiqas zimanê Kurdî ne qedexe be jî gotinên zarokan yên di vî warî de; gava di jiyana rojane de bi zimanê zikmakî diaxivîn ew bi astengiyên re rû bi rû diman û biçûk dihatin dîtin:

“Bikaranîna zimanê Kurdî li dibistanê nayê pejirandin, zimanê me ji hêla pergale ve jî hatiye qedexekirin. Ji lewre em nikarin rehet biaxivin ji ber wê jî têkiliyên me giş bi zimanê Tirkî ne.” Ç3

“Ji ber ku nêrîna siyasî ya hin kesan ne wek nêrîna min bû ew bi tûndî nêzî min bûn û bertek nîşanî min dan. Wek ku bibêje li ba min nexwîne nîqaşek biçûk derketibû di navbera me de.” Ç5

“Himm girêdayî welatê ku em lê dijîn e.” Ç8

“Axavtina bi Kurdî ya li dibistanê qedexeye li gor min. Em rasterast Tiki tercîh dikin. Kêm kes bi Kurdî dizane. Ez jî hindik dizanim.” Ç10

“Gava ez yekî extiyar dibînim ez bi Kurdî diaxivim. Lê gava ez kesên wek mamoste û karmendan bibînim ez bi Tirkî diaxivim.” Ç20

Hin hêlên civakî li ser bikaranîna zimanê Kurdî ya zarokan bandorên neyênî çêdike. Di hevdişinên malbatan de, dê û bavê zarokan gotin ku gava zarokên me bi Kurdî xeber nadin em xwe sûcdar his dikin. Malbatên ku zarokên wan bi Kurdî diaxivin ew jî bi hewldanên xwe vê yekê pêk anîne. Me ev yek di çavdêriyên xwe de dît:

“Ji vê yekê xerabtir tiştek tine ku mirov nikaribe bi zimanê zikmakî biaxive. Tu dibêji ez Kurd im lê bi Kurdî xeber nadî û najî. Pirsgirêk e. Elbet tiştên li ser vê bandor çêdike jî hene, wek mînak pergal karê xwe baş dike. Bişaftinê dike. Deqeyek çiyê vala nasekine. Fikr û nêrînen xwe bi civakê didin pejirandin, ew di vî karî de serkeftî ne. Bawer bikin heger me jî berxwe bidaya niha îro ne divê rewşê de bû. Divê em rexneyan li xwe bikin. Di serî de ji bo xwe û malbata xwe vê yekê dibêjim. Ez dikarim bikim, erê. Lê di nav malê de pirsgirêkan dijîm. Çima dijîm bawer bikin ez jî nizanîm. Ez bawerim mikur hatin ev e. Ev yek rastiya min e.” E5

LI DIBISTANÊ BIKARANÎNA ZIMANÊ ZIKMAKÎ

Me gotibû ku zimanê perwerdeyê yê li dibistanan li ser bikaranîna zimanê zikmakî yên zarokan bandorek çêdike. Di beşên pêş yên rapora xwe de em ê derbarê fêkirina zimanê zikmakî ya li dibistanan û her wiha hînkirina zimanê zikmakî tiştên me peyda kiriye parve bikin. Lê em dixwazin di bin sernavê bikaranîna zimanê zikmakî de tercîhên zarokan yên ziman ku ew li dibistanê hildibijêrin jî çend tiştan rave bikin.

Di lêkolînên me de hemû beşdarvan gotin ku zimanê zarokan yê li dibistanê Tirkî ye, lê gava me ev pirs ji zarokan pirsî zarokên ku bi Kurdî dizanin gotin ku ew di tenfûsan de zimanê Kurdî tercîh dikin:

“Ders bi Tirkî ye, lê di tenefûsê de tevlihev dibe. Carna Kurdî jî dikeve navê.” Ç8

“Di tenefûsan de bi hevalên xwe yên dilsoz re ez bi Kurdî diaxivim. Di dema dersê de jî em bi mamosteyan re Tirkî diaxivin.” Ç15

“Erê di dersê de em bi Tirkî diaxivin. Lê gava dibe tenefûs bi hevalên xwe yên ku Kurdî dizanin re bi Kurdî diaxivim.” Ç20

Mamoste jî anîn ziman ku zarokên bi Kurdî dizanin di navberê de bi hev re bi Kurdî diaxivin, lîstik û şerê wan jî giş bi Kurdî ye:

“Di tenefûsan de dibe ku ew xwe bi Kurdî baştir finin ziman ji lewre vî zimanî bikarfinin. Bi taybetî jî gava ew hêrs dibin û di navbera xwe de şer dikin tim bi Kurdî xeber didin, ez gelek caran bûme şahidê vê yekê.” Ö2

“Zarok li dervayî dersê tim bi Kurdî diaxivin. Gava bi gogê dilîzin bi Kurdî gazî hev dikin, di listikan de û di qadên listikan de jî bi Kurdî diaxivin.” Ö3

Malbatên ku me li gel wan hevdiştin pêk anî gotin ku ew di navbera xwe di bi Kurdî diaxivin lê zarok gava diçin dibistanê bi Tirkî dixavin. Heger mamosteyê wan bi Kurdî zanibe ew jî Kurdî tercîh dikin carinan.

“Ez li dibistanê bi mamosteyên kurê xwe re tim bi Kurdî diaxivim. Çikû min dizanibû ew jî Kurd e û bi Kurdî dizane. Lê mamosteyên niha ne wiha ne, em bi Tirkî bi wan re diaxivin.” E1

“Ez gava diçûm dibistanê min digot heger tu bi Kurdî zanibî em bi Kurdî biaxivin da ku em hev çêtir fêhm bikin. Hinek hene dizanin lê hinek jî hene nizanin. Di vir de em dikevin zorê û em mecbûr dimînin ku bi zimanê wî bersiv bidine wî.” E9

BANDORA BIKARANÎNA ZIMANÊ ZIKMAKÎ YA LI SER ZAROKAN

Di hevdiştinên bi zarokan re zarok anîn ziman ku ew bi Kurdî zêde nizanin lê hewl didin ku Kurdî fêr bibin û biaxivin. Zarok dixwazin zimanê xwe rast bikarbînin; li gor derfetên xwe ew jî qurs, înternet û ciyên din sûd werdigirtin:

“Ez bi giştî zimanê Tirkî diaxivim lê gava diçim gund li wir bi Zazakî diaxivim lê zêde serkeftî nin im ji bo ziman.” Ç4

“Bi Tirkî lê ez bi Zazakî pesnê xwe didim.” Ç8

“Min berê bi Kurdî nizanibû. Li vir qursek hebû ez li wir hîn bûm. Bavê min her tim bi me re bi Kurdî diaxivî. Kesên ku Kurdî şaş bikartînin in jî gelek in, gava em bi Kurdî diaxivimin di navê de Tirkî gelek e. Ez jî bavê xwe dipirsim ew jî zêde nizane. Carna jî ez lêdikolim, li mala cîranê min înternet heye ez diçim wir li wir lêkolînan dikim hin peyvan lê ji ber ku wateyan wan baş nizanim zehmetî dikişînim.” Ç12

“Ez bi zimanê Kurdî baş nizanim, gava dixwînim hinek hîn dibim. Hînbûna Kurdî baş e, ew jî wek zimanê biyanî ye, zimanê me yê zikmakî ye û baş dibe em hîn bibin.” Ç13

“Hevalekî min heye gava ku ez bi Kurdî diaxivim çavên wî dibiriqin. Pir dixwaze bi Kurdî biaxive lê ji ber ku diya wî ew fêr nekiriye nizane. Ji min piştgiriye dixwaze dibêje hînê min bike. Niha gava em hev dibînin em bi Kurdî diaxivin. Hêdî hêdî dê hîn bibe.” Ç20

Zarokên ku bi Kurdî dizanin rasthatina zimanê xwe û tevlîbûna çalakiyên bi zimanê xwe wiha anîn ziman; kelecana, bextewarî, dilşadî û meraqê bi me re çêkir:

“Ji ber ku zimanê min yê zikmakî ez bi kelecana temaşe dikim mamoste, pir bextewar dibim. Yanî zimanê min yê zikmakî ye mamoste, ji ber ku ew min pêş dixê ez xwe pirr bextewar hîs dikim.” Ç14

“Ji ber ku zimanê min yê zikmakî bû ez pirr bi kelecana bûm. Bi kêfxweşî diçûm. Heftêyê carekê bû lê ez pir bi meraq li bendê bûm.” Ç15

“Ez pir bextewar dibim û her tim rûyê min li ken e. Bi taybetî kesên ku di temenê min de ne û bi Kurdî dizanin ev yek gelek diçe li xweşa min. Te dî dibêjin ez Kurd im lê zimanê xwe yê zikmakî nizamim, nikarim bi axivim. Yanî gava ez kesên ku hem dizanin û hem jî fêhm dikim dibînim pirr kêfa min tê.” Ç20

BANDORA REWŞA 10 SALÊN DAWÎ YÊN POLÎTÎK YA LI SER BIKARNANÎNA ZIMANÊ ZIKMAKÎ A ZAROKAN

Di van 10 salên dawî de bajarê Amedê pêvajoyên çareseriyê û pêvçûnên giran dît. Piştî hin destkeftiyên mafên demokratîk hatin binpê kirin û pêvajoyên şer û pêvçûnan rû dan li vî bajarî¹⁵. Ev pêvajo li ser jiyana zarokan û mafên wan yê pêşketinê bandorek çêkir, mafê wan yê bikaranîna zimanê zikmakî û çanda xwe jiyîn di bin tesîra van pêvajoyan de ma¹⁶. Ji lewre di van 10 salên dawî de guhertina bikaranîna mafê zimanê zikmakî jî bû mijara xebat û çavdêriyên me. Bi kesên temen mezin yê ku me li gel wan hevdîtinan pêk anî re me ev mijar axivî û ew jî gotin ku ji bo mafê ziman hin destkeftî çêbûn û em ji vê yekê razî bûn lê piştî sala 2016'an gava ku karyûm avêtin ser rêveberiyên herêmî şert û merc guherîn û bikaranîna van mafan zehmettir bû. Ev şert û mercên zehmet derbarê bikaranîna zimanê zikmakî û çanda zarokande astengiyên pirr ciddî derxist holê:

“Beriya ev şer û pêvçûn çêbûn 6 sal berê herikînek hebû. Çalakîyên ji bo zarokan hebûn, mirov nikare bêje ku tiştek tinebû. Ev yek dê bibe bextreşî û bê wijdanî. Zarokên li wan taxan di nav kelecana û peroşê de bûn. Dikarim bibejim ku tiştên baş çêdibûn. Piştî van pêvajoyan ev çalakî giş betal bûn. Gelek kes mala xwe ji Sûrê bar kir. Niha ez nikarim Sûrê nas bikim. Mirovên li Sûrê çûn hin kesên din anîn li wir bi cî kirin. Yanî hem li ser zimanê zikmakî û hem jî li ser têkiliyan tesîrek çêkir. Ew germahiya berê tine êdî, berê ez diçûm malekê rûdiniştim û min li gel wan diaxivî. Min dikaribû li gel malbatan sohbetê bikim lê niha tiştek nemaye. Gava mirov diçe wir jî mirov gilî dikin, ev pirsgrêk heye” E5

“Di sala 2012 û 2015'an de qursên vebûn bi carekê tije bûn, gelek kesan zarokên xwe şandin qursên zimanê Kurdî. Lê piştî van pêvajoyan, bi guherîna rewşa siyasî re êdî axavtina bi Kurdî jî şaş dihat fêhmkirin. Axavtina bi Kurdî wek nêzîkatiyeke rêxistinî hat fêhmkirin. Êrîşên li hember kesên ku bi Kurdî diaxivîn jî çêbûn, ev yek kir ku zimanê Kurdî wek salên 1990'î têkeve hundirê malê û hepsî wir bibe. Ev car jî malbat bi zarokên xwe re di nav malê de bi Tirkî axivîn û ji axavtina Kurdî reviyên.” STÖ7

15- Nexşerêya Qedexerina Derketina Kolanana ya Weqfa Mafê Mirovan ya Tirkîye 16 Tebax 2015-1 Çile 2020: <https://tithv.org.tr/basin-aciklamalari/16-agustos-2015-1-ocak-2020-tarihleri-arasinda-ilan-edilen-sokaga-cikma-yasaklari/>

16- Rapora Bînpêkirina Mafên Zarokan ya di Dema Pêvajoya Şer de ya ji hêla Weqfa Mafê Mirovan ya Tirkîyeyê hatiye amade kirin, 7 Tebax 2015-16 Tebax 2016: <https://tithv.org.tr/wp-content/uploads/2020/04/catisma-donemlerinde-cocuk-hak-ihlalleri.pdf>
Rapora Lêkolîna Mafê Zarokan ya Sûrê ya ku ji hêla Baroya Amedê ve hatiye amade kirin, 2018: <https://www.raporlar.org/sur-cocuk-haklari-arastirmasi-on-raporu-diyarbakir-barosu/>.

NIRXANDIN

Di xebat û çavdêriyên ku me li qadan pêk anî de, derbarê mafê çanda xwe jiyîn û bikaranîna zimanê zikmakî ya zarokan de em li Amedê gihîştin van encaman:

- Zarokan ku zimanê wan yê zikmakî bi Kurdî ye, di jiyana xwe ya giştî de bi Tirkî diaxivin. Li gor kesên temen mezin zarok kêmtir bi Kurdî dizanin û diaxivin.
- Ji ber ku zarok li dibistanê, di nav hevalên xwe de û di TV yê de her tim Tirkî dibihîzin, ev yek serê wan tevlihev dike û li hember bikaranîna zimanê wan yê zikmakî astengiyan derdixe holê.
- Li gor çavdêriyên mezinan travmayên civakî û şexsî nahêlin ku zarok bi zimanê xwe yê zikmakî biaxivin. Axavtina bi Kurdî wan ditirsîne, gumanên wan zêde dike û dike ku ji xwe şerm bikin an jî wan dike yên din.
- Zarok difikirin ku axavtina bi Kurdî qedexeye, xwe bi awayekî rehet nikarin bînin ziman.
- Gava zarok piştgiriye digirin ew hewl didin ku bi zimanê xwe yê zikmakî biaxivin, pir bi kelecana û bextewar in gava ku ew tevli çalakîyên bi Kurdî dibin.
- Zarokên ku bi Kurdî dizanin li dervayî dersê bi hevalên xwe re bi Kurdî diaxivin, îstikên xwe bi Kurdî difîzin. Di nav mamosteyên ku Kurdî dizanin û malbatê de têkiliyek baştir ava dibe.
- Mûdexeleya kayyuman û pêvajoya şer û pêvçûnan astengiyan li hember mafê bikaranîna zimanê zikmakî û çanda zarokan derxistiye holê.

Wek encam, li Amedê mafên bikaranîna zimanê zikmakî yên zarokên Kurd û civakên ku ew bi wan re têkildar in tînin binpê kirin. Ew nikarin ji vî mafê xwe sûd werbigirin û ew bikarbin.

Zarok ji mezinan kêmtir zimanê xwe yê zikmakî bikar tînin û diaxivin, em dixwazin destnîşan bikin ku ev encamên me û yên berê ku di vê mijarê de çêbûne li hev dikin û her ku diçe Kurdî winda dibe¹⁷. Her çiqas malbat neaxavtina zarokan ya bi zimanê xwe yê zikmakî wek sûcê xwe xwe bigirin dest û rexneyê li xwe bikin û vê yekê wek berpirsyariya xwe bibînin jî piştgirî û peywîra dewletê ya di vê mijarê de jî girîng e, ew berpirsyariya xwe piştguh dikin¹⁸. Her wiha rewşa politîk û şer û pêvçûn jî astengiyan li hember vê yekê ne¹⁹. Xebata me ya çavdêriyê nîşan dide ku rewşa politîk û nêzikatiya ku

17- Derbarê perwerdehiya du zimanî de nihêrîn û helwestên civakê, xebata Egitim-Sen ê (2010). <https://app.trdizin.gov.tr/publication/paper/TVRNMUIURTRPQT09detail/>

Xebata ku Enstîtuya Lêkolînên Civakî û Siyasî ya Amedê çar kirî ya bi navê Birîna Ziman, Li Tirkîyeyê Pirsgerêka Bikaranîna Zimanê Zikmakî û Azmûnên Şagirtên Kurd. Vahap Coşkun, M. Şerif Derince û Nesrin Uçarlar (2010) Xebata Koma Rawestê ya Rewşa Zimanê Zikmakî ya Di Navbra Malbat û Zarokan De (2019). https://rawest.com.tr/wp-content/uploads/2020/02/Ebeveyn_Ana_Dil_Arastirmasi.pdf

18- Di Çarçoveya Peymana Mafê Zarokên Herêmi de, Şîroveya Gelemperî No:11 (2009)

19- Li gor KHK ya ku di sala 2016'an di dema OHALê de hat weşandin, 11 îlona 2016'an kayyûm avêtin ser hin navçeyan, paşê jî 1 ê Mijdara 2016'an de ji kayyûm avêtin ser Şaredariya Bajarê Mezin ya Diyarbekir û serokên şaredariyê hatin girtin. Piştî hilbijartinê herêmi, 19 ê Tebaxa 2019'an de dişa bi heman awayî şaredar hatin girtin û ev pêvajoyê berdewam kir.

cihêkariyê dike her roj zarokan ji zimanê wan yê zikmakî dûr dixê. Lê ji bo ku zarokên Kurd karibin çanda xwe biparêzin û pêşerojekê ava bikin divê ziman nemire, ji lewre ziman ji bo hebûna wan hêmayeke bingeîn û serekeye.

Ji ber van sedeman divê Tirkîyê gumanên xwe yên li ser xalên BMÇHS yê rake, ji lewma encamên wê dê xerabtir bibe. Divê li Tirkîyê zarokên Kurd karibin çanda xwe bijîn û zimanê xwe yê zikmakî bikarbînin. Li gel vê yekê divê Tirkîye bibe alîgirê peymanên navneteweyî yên ku mafên zimanê zikmakî diparêzin. Divê nihêrînen zarokan yên ji bo vê yekê jî bidin ber çavan û li wê goreyê planên çalakîyan derbixin û polîtîkayekê pêş bixin. Ji bo ew bi cihêkariyê re têbikoşin jî divê tevdiên bi bandor bigirin.

Fêrkirina
Zimanê
Zikmakî

FÊRKIRINA ZIMANÊ ZIKMAKÎ

Di xala 30'êmin ya BMÇHS de mafê "Bikaranîna zimanê zikmakî" cî digire. Ev maf ji bo zarokan li dibistanê fêrkirina zimanê zikmakî dipejirîne û bi awayekî erênî nêzî ev mafî dibe²⁰ Lê belê di xala 42 ya Makeqanûna Tirkîyeyê de ev tişt tê gotin "Ji xeynî zimanê Tirkî bi zimanên din li dibistanê perwerdehî qedexe ye. Li saziyên fêrkirinê ango dibistanan kes nikare zimanê zikmakî bikabîne û bi hemwelatîyên Tirk bide fêrkirinê." Di vê xalê de em dibînin ku perwerdehiya bi zimanê zikmakî li Tirkîyeyê hatiye qedexekirin. Li gel vê yekê di 30'yê Adara 2012'an di zagonên perwerdehiyê de hin guhertin çêbûn. Di zagonê 6287 yê Dibistana Seretayî û Perwerdehiyê de zimanê Kurdî ji bo dibistanê guncaw hate dîtin. Wezareta Neteweyî ya Perwerdehiyê di bin navê "Zimanên Zindî û Zarava" de wek derseka hîlbijartî zimanê zikmakî yê Kurdî tevî mufredata xwe kir²¹ Di çarçoveya vê dersê de ji zaravayên Kurdî yên wek Kurmançî û Kurmanckî re destûra perwerdeyê derket. Di sala 2012 û 2013'an de ev biryar hat girtin. Lê bi şertekî, heger 10 şagirt vê dersê bixwazin acax bi vî awayî ev ders were dayîn, ew jî 2 saet. Ji bo em peywirên dewletê yên derbarê zimanê zikmakî de bişopînin, me pirsan dirêjî beşdarvanan kir û ji wan ev yek pirsî. Ji 20 kesên ku me bi wan re hevdiştin kir 9 jî wan gotin ku haya me ji hebûna vê dersê tine ye:

"Çawa yanî dersa hîlbijartî? Xebera min ji vê yekê tine ye?" Ç1

"Min nizanibû ku dersa hîlbijartî ya Kurdî heye, heger min zanibûya ew heye min ê ew hîlbijarta. Ez dixwazim bêtir Kurdî bibînim, bi taybetî jî li dibistanê" Ç3

Kesên ku hay ji "Zimanên Zindî û Zarava" yê hene, ji nava wan 11 zarokî 7 jî wan gotin ku me xwestiye em dersê hîlbijêrin lê me nekaribûye hîlbijêrin, li gel ku ew dersê hîlbijartine jî kesî ev ders nedaye wan û gotin ku em sedema vê yekê jî nizanin:

"Navberekê dersa Kurdî hebû lê tenê me dersek dîtibû. Min ji dersê jî fêhmkir lêtenê hejmaran hînî me kirin. Paşê jî axavtinê hînîme kir, wek mînak tu çewanî, baş î, tiştên wiha hîn kirin. Paşê zîl lêda û careke din jî me ev ders nedît." Ç4

"Rast e me wek pol Kurdî hîlbijart lê digotin mamoste tine ye, mamoste nayê. Mamoste peywardar nedikirin, di destpêkê de wiha derbas dibû. Heyama duyemîn dersê ew bi xwe hildibijartin. Piştî wî têkçûyinek bû ji xwe. Salên din jî bêyî ku ji me bipirsin ew li gor xwe hildibijartin." Ç15

"Me her tim hildibijart lê kes tiştêkî nîşanî me nedida. Salekê me hîlbijart nêzî 300-400 pirtûk hatin ji me re. Lê nehatin belavkirin, dersê nedan me. Sedema vê yekê ez jî nizanim." Ç20

20- 20Di Çarçoveya Peymana Mafê Zarokên Herêmi de, Şiroveya Gelemperî No:11 (2009)

21- 21Ji hêla Wezareta Perwerdehiya Netewî û Midûriyeta Giştî ya Perwerdehiyê, di 31 ê Tebaxa 2012'an de di Daxuyaniya Dersên Hilbijartî ya nimreya 12668 sayî ve 2012/37 hatibû gotin ku piştî sala 2012-2013'an li hemû dibistanên ku girêdayî Wezareta Perwerdehiya Netewî ne, dibistanên taybet jî tê de, heya pola 5'an Dersa Zimanên Zindî û Zarave wek derseka hîlbijartî di mufredatê de çiyê xwe bigire.

Ji nav van 20 zarokan tenê 2 ji wan gotin ku me dersa “Zimanên Zindî û Zarava” hîlbijartîye û berdewam kiriye, ev zarok ji ber bi zimanên xwe yê zikmakî perwerde girtine xwe bextewar hîs kirine. Ew xwestine ku ev ders domdar be:

“Li dibistana navîn hebû, min hîlbijartibû. Pirtûk ji hebûn, pirtûkeke bi navê Kurmancî hebû. Xweş bû me kêfê jê digirit. Baş bû yanî mirov bêtir fêhm dikir ji Kurdî.” Ç8

“Yanî xweş bû, berdewamiya wê hebûya dê baştir bûya belkî, tiştên dîtir di derbarê nivîsê de ez ê hîn bibûma û hwd.” Ç10

Malbatên ku me li gel bi wan hevdîtin kir, gotinên zarokan rast derxistin û gelek ji van malbatan gotin ku haya me ji dersa Kurdî ya hîlbijartî tine ye:

“Na neçûn. Na, li Sûrê tiştên wisa tine ne xwişka min” E2

“Ew roj tişteke wiha derbas bû. A rast min nedizanî bû. Keça min ji min re got ‘bûye an nebûye ez nizanim, heye an tine ye? Niha ji nizanim’. Got ‘heger li dibistanê dersa hîlbijartî ya Kurdî hebe ez ê hîlbijêrim.’ Min ji got ‘pir baş e keça min’ Lê bû an ji nebû ez nizanim.” E4

Malbatên din yê ku me bi wan re hevdîtin kir gotin ku mafê hîlbijartina vê dersê tenê li ser kaxiz heye, lê ji bo mamoste ev ders karibin bidin kadro nayên vekirin û pereyek ji bo van kadroya nayê veqetandin. Karmendên dibistanê li hember dersên Kurdî berê malbatan didin dersên Olî û ji wan re dibêjin ku ji dewsa dersa Kurdî van dersan hîlbijêrin. Hat gotin ku ji bo perwerdehiyê Kurdî têr nake û qels e:

“Ti tişteke hîn nebûye. Wek xwe ye yanî bi rêk û pêk Kurdî hîn nebûye. Ev salek e ku di heftê de saeteke ev ders.” E3

“Navberekê dersa hîlbijartî hebû, lê ji ber kes guh pê neda û perwerdekar ji nedîtin berdewam nekir. Niha li hin dibistanan heye. Pereyekî baş ji bo vê dersê nehate veqetandin. Tenê alfabe û hin peyvên hîn dikirin. Pirtûk ji têrê nedikirin.” E6

“Sembolik bû. Kadro û mamosteyên vî karî çênebûn û ders ji nehate hîlbijartin. Zarokên ku ev ders hîlbijartin ji jê mehrûm man. Mixabin li vir politîkayeke wiha birêve dibin: bi taybetî ji îdareyên dibistanan; mamosteyên dersa olê, mele û hin sendîkayên nêzî dewletê. Bêtir berê zarokan didan dersên li ser Jiyana Pêxember û Quranê, dixwestin ku ew van dersan hîlbijêrin. Dixwestin nêzîkatiya van kesên oldar bi me bidin pejirandin.” E7

“Berê hebû lê niha tine ye. Sala çûyî kurê xwişka min li Stenbolê xwestibû ku dersa Kurdî hîlbijêre lê jê re gotibûn ku ew dikare dersa Erebi hîlbijêre û zimanekî bi navê Kurdî tine ye.” E10

Kesên perwerdekar, rêvebir û nûnerên saziyên civakî yê sivil jî, heman tişt gotin û gotinên malbatan yê derbarê zarokan de mafdar derxistin. Ew jî anîn ziman ku ev demeke dirêje e ku dersên Kurdî nayên dayîn. Di van hevdîtinan de tiştê herî zêde hate gotin, kêmasiya materyalan zêdeye û asta pirtûkan ne li gorî zarokan e. Her wiha kesên dersan didin jî zêde têgihiştî nîn in ji bo vê yekê. Tişteke din jî yê ku ew gotin, bala zarokan bêtir dikişînin ser dersên olî û naxwazin ku zarok dersa zimanê zikmakî hîlbijêrin:

“Malbatên ku hay wan ji vê yekê heye ew bi zarokên xwe didin hilbijartin vê dersê, lê wekî din kes nikare bêje ez dixwazim vê dersê hilbijêrim. Em bibêjin dersê hilbijartin; di hêla materyalên dersê de pirsgirêk heye, gelo bê pere tê belavkirin ya girîng ev e, ya din jî kêmasiya mamosteyan e. Wek mînak em bibêjin li Amedê 100 dibistan hebin, li Tevahiya Tirkîyeyê 100 mamosteyên ku dikarin dersa zimanê Kurdî bidin tine ne. Mînak, gava Zazakî û Kurmancî tê hilbijartin, li dibistanê tê gotin ku ‘mamoste tine, lê ew dikarin ji dewsa van dersan dersa Almanî û dersên din hilbijêrin.’ Heger em ji bo Kurdî xeber bidin tenê li hin zanîngehan vê beşê vekirine. A rast gava hûn bixwazin bi zimanê Kurdî perwerde bidin divê hûn bingeha vê yekê amade bikin.” STÖ10

“Rêvebirên dibistanan berê zarokan bêtir didin dersên wek, Em Fêrî Ola Xwe Bibin, Siyer, Jiyana Pêxemberê Me. Ew bêtir dibêjin, ‘ji xwe mamosteyê vê dersê tine ye, heger hûn hilbijêrin jî dê vala derbas bibe, dîsa hûn ê mecbûr bimînin ku dersek din hilbijêrin.’ Min wiha bihîst.” E5

“Haya zarokan ji tiştên ku tên qal kirin heye û dizanin. Ez ketim dersa wan. Ji ber min bi zaravayê Kirmanckî diaxivî min dersê bi Kurdî da wan, lê ez wek wan baş nîn bûm, ti feydeyek min negihîşte wan. Feydeya wan bêtir li min çêbû. Ji ber ku mamosteyê ziman tine bû, kesên ku bi Kurdî nizanibûn jî diketin vê dersa Kurdî. Li wir kêmasiya mamosteyan hebû.” Ö2

“Ji bo zimanekî biyanî fêr bike pirtûkeke baş e, lê ji bo zimanê zikmakî fêr zarokekî bike ne pirtûkeke baş e. Li gor kevneşopiyên bîrdoziya fermî û zanînen wê hatiye xemilandin, tiştên leşkerî û nijadperestî bêtir hene di pirtûkê de.” Y1

Mamosteyên ku me li gel wan hevdiitin kir pirsgirêkên li jor anîn ziman, lê ew qala çareseriyên ku li gor xwe diitine jî kirin û bi me re parve kirin. Me di vê xebata xwe de da bû dû peywîr û berpirsariyên dewletê lê hewldana mamosteyan ya şexsî ya ji bo çareserîya van pirsgirêkan jî ji bo me pir bi wate bû.

“Heya pirtûk hatin ber destê me heyna dûyemîn despê kir. Di wê navberê de ez û hevalên xwe fikirîn ka em dikarin çi bikin. Serê pêşî me sîstema deng bire dibistanê, me ji muzîkê sûd wergirit, me ji ber pirtûkan fotokopî girt û li zarokan belav kir. Carinan me bi wan nivîs da nivisandin, me spartek da wan tevî malbatên wan ve. Pirtûkên dersa hilbijartî wek Pdf hatin ji me re, bi awayekî me zêde kir û li zarokan belav kir. Ji xwe tenê 20 pirtûk hatibûn, têra her kesî nedikir.” Y1

“Min ji çavkaniyên cihê fotokopî digirt û dersê çalaktir dikir. Min li her zarokî ferheng belav dikir, peyvên stranên Kurdî jî min belav dikir. Bi materyalên cûda min dixwest dersê li ber dilê wan şîrîn bikim.” E3

“Gava tu mataryalan ji şagirtan an jî ji malbatên wan bixwazî ev dibe pirsgirêk, ji lewre min bêtir ji pirtûk û muzîkê sûd werdigirit.” Ö6

BANDORA REWŞA 10 SALÊN DAWÎ YÊN POLÎTÎK YA LI SER FÊRKIRINA ZIMANÊ ZIKMAKÎ A ZAROKAN

Çewa ku di beşên din yê raporê de me destnîşan kiriye, em dixwazin bandora qewimandinên van 10 salên dawî ya li ser perwerdeya zimanê Kurdî ya di saziyan de jî vebêjin. Kesên beşdarvan girîngiya zimanê Kurdî ya li saziyan bi taybetî anîn ziman û kêmasiya wê kirpandin. Lê belê piştî bi dawîbûn pêvajoya çareseriyê û bi taybetî jî hatina OHALê, her ku çûye rewş paşve çûye. Ev pirsgrêk ji materyalên dersan bigire heya hîlbijartina dersan bandora xwe li ser vê rewşê diyar kiriye ango çêkiriye:

“Di sala 2014’an de çareseriyê demokratîk an jî xeyala çareseriyê, welhasil em çî nav lê bikin nizam, li ser civakê bandora xwe çêkir. Piştî pêvajoya xera bû, encamên wê yê giran derketin holê. Em qala hesreta bi salan dikin. Mirov bêtir bi hewldanên xwe yê şexsî hatin gotin ‘Em dersa Kurdî ya hîlbijartî’ dixwazin. Li dibistana ku ez lê dixebitîm ya dewletê 3 polên me hebûn. Em 3 heval me dersa Kurdî dida zarokan, yanî ez dikarim bibêjim ku pol tije bûn û me dersên xwe bi kêfxweşî derbas dikir.” Y1

“Gava di sala 2012 û 2013’an de pirtûka dersan derket pîr bi qelîte bû, lê ew mamoste ji kar hatin dûr xistin. Di sala 2015 û 2016’an de naveroka van pirtûkan hate guhertin. Ew van pirtûkan bi kesên din dan çapkirin û qelîfeya van pirtûkan daket jêrê, pirtûkên berê bêtir baş bûn. Yanî qelîfeya dersên li dibistanê dewletê di sala 2012, 13, 14 û 15’an de daket. Min weşanên wan şopand, bawer bikin ev tiştên dibêjim rast in. Mînak rol hatibûn guhertin, rola jin û mêr, di metnên wan de tiştên besît hatibûn nivîsîn. Di salên 2012 û 2013’an de gava malbat 2 saet ji bo zarokên xwe hildibijartin ew ders bêtir bi qelîte bûn û feydeya wan zêde bû. Di wê demê de teknoloji ewqas pêşketî jî nîn bû lê baştir bû.” Ö3

“Berê xwendekar bêtir bûn, lê di van salên dawiyê de kêmtir bûn. Serê pêşî hîlbijartina dersan ji malbatan re dihiştin, lê van salên dawiyê li gel ku di rêzîknameyê de tine bû jî, ew hin dersan ferz dikirin li ser zarokan. Di sala 2015’an de 400 şagirtî ev ders hîlbijartibû, lê niha tenê polek ev ders hîlbijartiye. Pirtûka MEBê heye, çavkaniyên din hene ne ku tune ne, lê ji ber ew xeter tînin dîtin nahêlin werin bikaranîn.” Ö4

Di encama xebata me ya li qadan, derbarê fêrkirina zimanê zikmakî de li Amedê, bi kurtasî em gihîştî van encaman:

- Ji hêla gelek malbat û zarokan ve nayê zanîn ku bi zaravayên Kurmancî û Kirmanckî di bin banê dersa “Zimanên Zindî û Zarava” de ders tê dayîn.
- Zarokên ku haya wan ji dersê heye, ji ber ku mamoste tineye û ji 10 kesan bêtir kes dersê hilnabijêre û rêvebirên dibistanê dersên olî li ser wan ferz dikin nikarin xwe bigihînin dersên Kurdî.
- Ders bi awayekî baş nikare Kurdî fêrî zarokan bike: Materyalên dersê kêmtir in, naveroka wan ne li gor zarokan e, asta dersê bersiv nade pêdiviya zarokan, mamosteyên pîspor tine ne û memosteyên ku bi Kurdî nizanin ji bo dersê tîrî pewîrdarkirin.
- Zarok dixwazin li dibistanê fêrî zimanê xwe yê zikmakî bibin lê belê ders nikare ji vê yekê re bibe bersiv.
- Tevî ku li dibistanan dersadayîna bi zimanê Kurdî girîng e, pêvajoya şer ya piştî sala 2015’an û peywîrdarkirina karyûman û kêmasiya materyalên dersê li hember hilbijartina dersê astengiyên derdixin.

Wek encam, li Amedê mafê fêrbûna zimanê zikmakî yê zarokan tê binpêkirin. Lê belê, Wezîrê Perwerdehiya Netewî yê wê demê Omer Dinçer gotibû: “Türkiye her diçe demokratiktir dibe û pergala wê sist dibe, çî xerabîya vê yekê heye ku dersa Kurdî bibe dersa hilbijartî?” û sînyalên pêşî ji bo vê yekê dabû.²² Di 12 Pûşpera 2012’an de dersa Kurdî ji bo hilbijartinê hatibû îlan kirin.²³ Piştî ku dersa Kurdî li mufredatê hate zêdekirin, Alîkarê Serokwezîr Bülent Arınç jî gotibû ku polîtîkayên îmhî û înkarkirinê êdî ji holê rabûne û ew ji bo dersa Kurdî mamosteyan perwerde dikin û ji bo ferhengêka bi Tirkî û Kurdî were amadekirin jî Saziya Zimanê Tirkî peywîrdar kirine.²⁴

Gava di sala 2012 û 2013’an de cara pêşî dê dersa Kurdî bihata dayîn, ji raya giştî ev rexne dihatin; bêtir amadekarî temam bibin dersê li mufredatê zêde kirin, ji hêla malbata baş nedihat zanîn, nediyariyên derbarê mamosteyan de û kêmasiyên di hêl pirtûkên dersan de. Ev rexne pêş diketin.²⁵ Di vê heyamê de, zêdetirî wan li Amedê bi tavahî li 28 bajaran bi giştî 18.847 şagirt dersên Kurmancî û Zazakî hilbijartin.²⁶ Di salên pêştir de bi saya pêvajoya çareseriyê zêdetir bala mirovan kişand û di sala 2013 û 2014’an de ev hejmar derket 53 hezarî, di sala 2014 û 2015’an de jî seadî 45 zêdetir bû û herî dawî hejmarê serlêdanê gihîşt 85 hezarî.²⁷

22- <https://www.milliyet.com.tr/egitim/kurtce-nin-secimlik-ders-olmasin-ne-mahsuru-var-1514361>

23- <https://www.aa.com.tr/tr/politika/kurtce-secmeli-ders/362353>

24- <https://www.milliyet.com.tr/siyaset/arinctan-tdkya-talimat-1603740>

25- <http://www.baskahaber.org/2012/09/yasayan-diller-ve-lehceler-secmeli.html>

26- <https://www2.tbmm.gov.tr/d24/7/7-15927sgc.pdf>

27- <https://www2.tbmm.gov.tr/d26/7/7-23228s.pdf>

Di serdema perwerdeyê ya sala 2015 û 2016'an de bi tevahî 77 hezar û 931 şagirt dersa Kurdî hîlbijart û ev yek di çepemeniyê de hat dîtin. Piştî pêvajoya çareseriyê bi dawî bû û OHAL hat îlan kirin asta hîlbijartina dersa Kurdî kêmbû.²⁸ Li gor bersiva Wezareta Perwerdeyê ya Netewî (MEB) li Tirkîyeyê bi giştî, di sala 2016 û 2017'an de li dibistanên taybet û yên din hejmara şagirtên ku dersa Kurmancî û Zazakî hîlbijartin wiha ye; 21.327, di sala 2017 û 2018'an de 19.813, di sala 2018 û 2019'an de 12.947.²⁹ Ji ber şertên pandemiye xwe gihandina mafê perwerdeyê yê sala 2019 û 2020'an zor bû û heya niha derbarê vê yekê de jî axavtinek nehatiye kirin. Ji bo xebata xwe me xwest em xwe bigihînin wan û agahiyên vê derbarê de bigirin lê derbarê hîlbijartina dersa Kurdî de agahiyek bi me re nehate parvekirin.³⁰

Li gor peydabûnên xebata me ya li qadan rewşeke din jî kêmasiya mamosteyan bû: li gor agahiyên MEBê, mamosteyên ku ji bo dersa Kurmancî û Zazakî hatibûn peywardarkirin di sala 2014'an de 17, di sala 2015'an de 21, di sala 2016'an de 20 û di sala 2017'an de 99 kes bûn.³¹ Li gor agahiyên ku di sala 20.06.2020'an de hatin diyarkirin, hejmara mamosteyên ku ji bo zimanê Tirkî û yên biyanî kar dikirin 135.572 kes bû; ji bo dersa Zimanên Zindî û Zarava, di warê Zazakî û Kurmancî de mamosteyên ku li saziyên perwerdeyê yên fermî ên dewletê kar dikirin hejmara wan 86 bû û tenê li 3 zanîngehan Bernameya Zimanê Kurdî û Wejeyê hatibû pejirandin.³² Li gor daxuyaniya dawî ya di dîroka 06.10.2020'an de di warê Zazakî de 21, di warê Kurmancî de 100 bi tevahî heya niha 121 mamoste bi awayekî fermî hatine peywardarkirin.³⁴ Ji bo vê rewşê hatibû gotin ku ew li gor pêdiviya herêman mamosteyan hîlbijartine û li gor van pêdiviyan ew bi cî kirine.³⁵

Di peydabûnên me yên derbarê kêmasiya materyalan de jî ev tişt derketin holê; di Gulana 2014'an de ji hêla TDK yê 50 hezar ferheng hatine çapkirin lê di ser de 2 sal derbas bûye ku ew negihîştine ber destên zarokên ku ev ders hîlbijartine. Bersiva MEB ê ya di vê mijarê de jî ev yek erê dike. Wezareta jî bo ferhengên Kurdî-Tirkî û Tirkî-Kurdî tu xebatek nekiriye û ew nekiriye.³⁷

Bi vî awayî hem lêkolînên me yên li qadan û hem jî lêkolînên me yên li ser maseyan didin nîşandan ku mamosteyên ji bo dersa Zimanên Zindî û Zarava hatine peywardarkirin li gor mamosteyên zimanên din pirr kêmbûne. Kêmasiya mamosteyan û saziyên ku ew ji wan perwerdeyê digirin, kêmasiya materyalan hatiye teqezkirin û astengiyên zarokan yên ji bo dersa zimanê zikmakî hatine pênasakirin. Lê BMÇHS û rêzîknameyên navneteweyî

28- <https://www.evrensel.net/haber/386372/sectirilimeyen-secmeli-ders-kurtce>

29- <https://www2.tbmm.gov.tr/d27/7/7-16187c.pdf>

30- T.C. Cumhurbaşkanlığı İletişim Merkezi (CİMER)'ne 26.02.2021 tarihinde yapmış olduğumuz 2100993578 sayılı başvurumuz 01.03.2021 tarihinde Strateji Geliştirme Başkanlığı tarafından cevaplandı.

31- <https://www2.tbmm.gov.tr/d26/7/7-1468sgc.pdf>

31- <https://www2.tbmm.gov.tr/d27/7/7-16742sgc.pdf>

33- <https://www2.tbmm.gov.tr/d27/7/7-25887sgc.pdf>

34- <https://www2.tbmm.gov.tr/d27/7/7-29562sgc.pdf>

35- <https://www2.tbmm.gov.tr/d27/7/7-16374c.pdf>

36- <https://www2.tbmm.gov.tr/d27/7/7-34775sgc.pdf>

37- <https://www2.tbmm.gov.tr/d26/7/7-2604sgc.pdf>

dibêjin ku dewlet ji bo zimanê zikmakî were hînkirin divê hin tevdiran bigire û peywîrên xwe yên di vê hêlê de bi cî bîne.³⁸ Ji lew re, fêrkirina Kurdî ya li dibistanan, zarokên ku zimanê wan yê zikmakî bi Kurdî ye diparêze û pêştir dixê, li hember kesên ku zimanê wan yê zikmakî ne bi Kurdî ye jî rêzgirtinekê çêdike û civak bi vê yekê kêfxweş dibe.³⁹

Divê gumanên li ser xalên 29 û 30 yê BMÇHS yê û qedexeyên li ser zimanê zikmakî yên di xala 42 ya Makeqanûnê de werin rakirin, ji bo bikaranîna mafên çandî bi cî werin, pêdivî bi zimanê zikmakî heye, je lewre di van waran de divê gav werin avêtin. Li gor çavdêriyên zarokan û yên beşdarvanan yên derbarê perwerdeya Kurdî de, divê astengiyên li hember ziman werin rakirin û ji bo karibin bi zimanê xwe biaxivin divê dewlet tevdiran bigire.

Fêrbûna zimanê zikmakî û bikaranîna zimanê zikmakî ya di perwerdeyê de du têgehên ji hev cûda ne, em vê yekê bi bîr finin û derbasî peydabûnên mafê perwerdehiyê yên bi zimanê zikmakî dibin.

38- Belavoka BM ya Mafê Şexsan yên ku Girêdayî Nijad, Ol û Zimanên Herêmi ne.

39- Mafê Zarokên Herêmi di Çarçoveya Peymanê de, Şîroveya Gelemperî No:11 (2009), Madde 27.

Bikaranîna
Zimanê
Zikmakî ya Di
Perwerdehiyê De

BIKARANÎNA ZIMANÊ ZIKMAKÎ YA DI PERWERDEHIYÊ DE

Beşek girîng xebata me ya şopandinê, mafê bikaranîna zimanê zikmakî û sazkirina saziyên perwerdehiyê ya komên çandên cûda bû, ji lew re, ev maf bi bi xalên 29 û 30 yên BMÇHS ê ve rasterast girêdayî bûn û li ser jiyana zarokan bandorê çêdikir û bi qedexeya cihêkariyê re eleqedar bûn.

Di 2 Adara 2014'an de di Pakêta Demokratîkbûnê de, di qanûna bi hejmara 6529 ya ku Mafê Bingehîn û Azadiyê pêşdixe de, avakirina dibistanên ku bi Kurdî perwerdehiyê didin bi awakî fermî hat qebûlkirin. Li gor xala 2'yan ya Qanûna Derbarê Fêrkirina Zimanên Biyanî û Zaravayan ya Hemwelatiyên Tirk, derbarê Perwerde û Fêrbûna Zimanên Biyanî de ev biryar hatin girtin;

“Li gor Qanûna Saziyên Taybet yên Fêrkirinê, hemwelatiyên Tirk, dikarin perwerdeya xwe bi ziman û zaravayên cûda yên ku ew di jiyana rojane de bikartînin bikin û ji bo van zimanan dibistanên taybet dikarin werin vekirin. Lijneya Wezaretê biryara zimanê ku ew ê di van dibistanên taybet de werin bikaranîn dide û ew destnîşan dike. Rêzicknameyên derbarê vekirin û şopandina van saziyan de ji hêla Wezareta Perwerdehiyê ya Netewî ve tîn amadekirin û MEB bi vê yekê re mijûl dibe.” Di hinceta ev qanûnê de, li gor xala 42 ya Makeqanûna Tirkiyeyê diviyabû hemû hemwelatî wekhev ji derfeta perwerdeyê sûd werbigirtana û mafê perwerdeyê mafekî pozîtîf e. Di vê çarçoveyê de, dihat gotin ku li Tirkiyeyê ziman û zaravayên cihê yên xwedî kevneşopî dikarin li dibistanên taybet werin fêrkirin û ji bo van zimanan dibistanên taybet dikarin bên vekirin. Dîsa li gor van qanûnan diviyabû astengiyên li hember van mafan bihatana hilanîn û li gor xwesteka civakê ev daxwaz pêk bihatana.

Di Tîrmeha 2014'an de di Rêzicknameya Saziyên Fêrkirinê yên Taybet de ku girêdayî MEB ê ye, di xala 49'an de hemwelatiyên Tirk, bi biryara Serkoweitîr li dibistanên taybet dê karibûna bi ziman û zaravayên din perwerdeyê bibînin. Dê wezaret, dersên bi ziman û zaravayên cûda ji bo dibistanên taybet diyar bikira. Her wiha dîsa bi erêkirina Wezaretê, li gor asta dibistanê bernamêya heftane ya ji bo dersê bihata amadekirin. Ji bo saziyên taybet yê perwerdeyê ev sererastkirin çêbûn, lê ji xeynî van tiştan mafê zimanê zikmakî yên ji bo perwerdeya giştî nehatin sererestkirin û guhertinên fermî pêk nehatin.

Me di çarçoveya xebata xwe de, derbarê xala 29 ya BMÇHS yê ya Tirkiye bi guman nêz dibe û peymanên navneteweyî ku mafê zimanê zikmakî mîsoger dikin hin çavdêriyan kir. Her wiha me peywîr û berpirsariyên dewletê yên ji bo vê yekê jî şopand û derbarê vê yekê de jî pirsan dirêjî wan kir. Di nav malbatên ku me bi wan re hevdiştin kir de tenê 2 kes hebûn ku zarokên xwe dişandin dibistanên bi Kurdî perwerde didin. 4 malbat jî gotin ku haya wan qet ji van dibistanan çênebûye:

"Haya min jê tine bû. Heger min zanîbûya elbet min ê bişanda, min ê bi kêfxweşî bişanda." E1

"Min tiştêkî wisa ne bihistiye û ne jî dîtîye." E2

"Xebera min jê tune ye, min ji cînanan jî nebîhistiye." E2

Malbatên ku hay ji dibistanê hebûn sedemên neşandina zarokên xwe ya van dibistanan wiha anîn ziman; girtina dibistanan, li herêma ku ew lê dijîn tinebûna dibistanan, nevekirina dibistanan ya ji ber sedemên burokratik û li gorî temenê zarokan tinebûna dibistanan:

"Bi rastî ez vê yekê difikirim û pê serfiraz bûm. Yanî ez bi niyet bûm ku bişînim lê paşê hate girtin wek hûn jî dizanin." E4

"Me taleb kir. Em çûn, me bi Serokê Şaredariyê re axivî. Me got em jî nikarin li vir tiştêk wiha çêbikin? Yanî çênebû. Hûn burokrasiyê dizanin. Yanî divê hebe lê pratîk tiştêkî cûda ye. Heger li vir vebe ez çima neşînim, ez ê bişînim." E5

"Niha ew 16 salî ye, di wextê wî de tiştêk wiha tine bû. Yanî heger li ciyekî guncaw hebûya dê bixwesta û biçûya. Lê tiştêkî ku nizanibe û neji çewa bixwaze." E8

Hin malbat anîn ziman ku ew ji ber xizaniyê nikaribûne zarokên xwe bişînin van saziyên taybet yên perwerdehiyê. Hin malbat jî gotin ku li Tirkiyeyê pergala azmûnê li hember çûyina zarokan a dibistanê asteng e:

"Erê min dixwest lê çavê xizaniyê birije." E2

"Di nav şertên Tirkiyê de ne pêkan e ku em wan bişînin. Ji lewre azmûn û hemû rêbazên perwerdeyê bi Tirkî ne, ji ber van sedeman em nikarin wan bişînin." E6

Di çarçoveya xebata me ya şopandinê de ji bo em xwe bigihînin agahiyên berfireh me, bi perwerdekarên ku li kreş û dibistanên Kurdî perwerde dane, nûnerên rêvebirên herêmî û her wiha bi avakarên dibistanan re jî axivî. Me ji van kesan, sedemên vekirin û girtina dibistanan, hîlbijartina mamosteyan û pêvajoya biryargirtina mufredatê, alîkarî û zehmetiyên ku ew dîtine û bandora Kurdî ya ku bi zarokan re çêkiriye pirsî.

Avakarên dibistanan, serê pêşî gava ku ew hîna nû dibistanan vekirine bertekên erênî girtine, ji wan re hatiye gotin ku ev dibistan pêdiviyek in, lê ji ber ku ew dibistanên taybet in tenê di karîbûne xizmetê bidin hin kesan:

"Bi giştî mirov dihesidin. Hemû kes dibêjin em dixwazin zarokên xwe bişînin cem we lê dibêjin derfetên me tine ne. Yanî wek pêdiviyêk tê dîtin. Malbatên ku tîna cem me diyar in, gava hin kes ji hêla aboriyê kêmasiyê dibînin ji gelek tiştî mehrûm dimînin..." O1

"Min her tim mafê zimanê zikmakî parastiye. Ji du hêlan ve hem ji hêla dewletê hem jî hêla Kurdan ve divê em bi qîmet bibînin, ji bo ew rojane bibe. Dibe ku simbolîk be lê diviyabû ev yek pêk bihata. Ev dibistanek taybet e û bi peran e, bi peran e ji ber ku tirsên dibistanên tayebe hene. Gelo ez vî tiştî wiha bikim dê dewlet çî bibêje, ji hêla hiquqî ve dê li min çewa vegere. Bi vî awayî jê dûr disekin. Min vê tirsê da ber çavên xwe û ev rîsk girt." O2

Beşdarvanên ku di saziyên perwerdehiyê yê Kurdî de de dixebitin anîn ziman ku ew ji bo van xebatên xwe ji dewletê teşwîq negirtine û çavkaniyên wan jî ji bo xizmetê bidin têrê nekirine. Gotin ku ew nikarin, kirê, fatûre, sîgorte, bac û maaşan bidin û ji ber van sedeman bi kesên dilxwaz re bêtir vî karî kirine û her wiha malbatên zarokan piştgiriya dane wan:

"Finanse nake, 63 mirov dixebitin, 50 mamoste, 15 personel, lêçûneke van heye, bac û vêrgî heye, sîgorta heye, yanî me nikaribû bi rêve bibin ji lewre hat rewşek wiha sekî." O2

"Gel piştgiriya manewî zêde da me. Qet naçe ji bîra min carekê dayik hatin. Gotin ku heger we zehmetî kiştan û hûn di zorê de man li me bigerin, em ê werin; tenê ne ji bo zarokên xwe em ê ji bo we jî werin. Zêde piştgiriya dan me." Y3

"Li xwe Tîrkiye piştgiriya nade kreşan. Tenê bi aidatên malbatan me saziyan bi rêve dibîr. Me mamosteyan pereyekî nedigirt. Ji ber ku me tenê karibû kirê, fatûre û lêçûnên metbaxê bidin. Me bi qasî 5 salan bê pere ev kar bi rêve bir." STÖ9

"Elektrîk tine bû, zarok şeveqê dihatin heya êvarê li saziyê rûdiniştin, diviyabû zarok xwarinê bixwin malbatên wan ji mal dianîn, carinan jî me çêdikir û dibîr." Y3

Kes qala teşwîqa dewletê ya ji bo dibistanên Kurdî nekir, berovajî vê yekê di hevdişnên me de zehmetiyên li hember vî karî hatin ziman. Mijarên wek, biyanîkirin, dîrxistin û tade dayîn wek di xebatên me yê pêş de derketibûn holê, derbarê saziyên Kurdî de jî ev heman mijar derketin pêşiya me. Astengiyên zagonî, venêrandin, mudaxeleya polêsan û bi cezayê tehdîtkirin di nava van mijaran de cî digirtin:

"Ji hêla perwerdekarên ve kedeke pîroz e ku mirov di nav şert û mercên dijwar de bi hewldanên xwe bi vî zimanê têkiliyekê çêbike bi zarokan re. Pêşî li hezkirina vî karî hatiye birrîn, derfet tine ne, bi awakî potansiyel bi çavekî din lê mêze dikin." Ö3

"Gava tu bixwazî dibistanek Kurdî li Amedê vekî, li hember te zahmetî çêdibin ev yek te ditirsîne, ji ber ti tiştêk wisa dikî dibe ku te bigirin bavêjin hepsê, nihêrînek wiha peyda dibe. Lê ev zimanê min yê zikmakî ye, dibe ku li paş vê yekê polîtîkayek tine be, dibe ku fîkreke min ya siyasî jî tine be. Lê gelo ez bi awayekî hêsan dikarim bi zimanê xwe cîyekî vekim?" Y2

"Me pir zehmetî dikêşa. Em şeveqan diçûn dibistanê, li ber derî 2 wesayîtên ewlehiyê, digotin ji ku me biparêzin ew li vir disekinin. Me jî digot erê rast e, hûn me diparêzin, lê ji bo ewlehiya zarokan qet nebe hinek dûr herin, dê wisa rasttir be. Malbatên ku zarokên xwe ji dibistanên fermî digirtin û dianîn ji me re dihatin tehdît kirin. Ji wan re her tim digotin divê hûn vegehin dibistanên fermî û li wir bixwînin." Y3

"Ji xwe sînorên zagonî gelek zêde bûn, gava dihatin li kreşê binihêrin nivîseke bi Kurdî bidîta digotin, 'Midûr weşanên qedexê hene li vir' û ceza dibirrîn li me, li ser me zexteka wiha hebû." STÖ9

"Gelek caran em bi awayekî derûnî dihatin aciz kirin. Belkî mafekî wan yê wisa tine, gava karmendekî wan dihat, li ser me derûniyek ne baş çêdikirin ev yek bivê nevê me aciz dikir û em ne rehet bûn." O1

Beşdarvan gotin ku ew li saziyên perwerdehiyê yên Kurdî xwestine ku modelekê pêş bixin û zarok bêtir tevî bibin û karibin azad hîs bikin, lê mamoste nekaribûne xwe bigihînin çavkaniyan, li mufredada MEBê dersên Kurdî zêdekirine, pirr zimanî esas giritine, pirtûkên Kurdî yên ku wek çavkaniyên perwerdeyê hatine bikaranîn bi xêra komîsyonên dilxwaz amade kirine. Ev yek giş bi hewldanan mamosteyan çûne serî:

"Kesên ku pedagojiyê dizanin û ji bo zarokan xebitîbin û bi Kurdî zanin gelek kêr in. Zehmet mirov xwi bigihîne kesên wiha. Me ti wextî alîkariyek wiha ji bo zarokan negirtiye û karê me hêsan nebûye. Bi zimanê Kurdî, li gor çanda xwe me ji tu kesî ders negirtiye, û me xwe nigirand van kesan. Bawer bikin pêvajoyeke dijwar bû. Ji lew re hemû kar li ser piştê me bû." STÖ9

*"Tîştê pêşî em dixwazin ew e ku zarok xwe rehet hîs bikin, bi zimanê xwe yê zikmakî listikan bilîzin, çanda xwe, staranên xwe hîn bibin, zûgotin û tiştanokên xwe hîn bibin. Mînak di çanda me de li gor asta zarokan çîrok dihatin gotin, bi zarokan re ev çîrok dihatin gotin. Bi awayekî pedagojîk çavkaniyên me çênebûne, di wextê di tîştê çêbûne jî hatine tinekirin û berdewamiya wê nehatiye. Em mamoste jî lêkolînên xwe bi serê xwe dikin û çavkaniyan diafirînin, ji lew re kêmasiya çavkaniyan gelek e."*Y2

"Hemû bi Kurdî bû. Komîsyon hebûn, gelek kes bi dilxwazî û bê bendewarî ev kar dikir, di nava wan de pedagor û zanyar jî hebûn. Ji pola yekemîn heya pola pêncemîn, pirtûkên erdnîgarî, bîrkarî, û hemû dersên din ji hêla vê komîsyonê dihate amadekirin û giş bi zimanê Kurdî bûn." Y3

"Mufredad hemû mufredata MEBê bû, me ew bi cî dianî. Li gel vê jî me dersê Kurdî dida zarokan. Em dixwazin bernamêyake pirr zimanî hebe. Em Tirkî navêjin aliyekî. Zimanê Îngilîzî dîsa wisa, zimanê dinyayê û yê wêjeyê ye. Zimanê Kurdî jî zimanê dayika me ye, gava em çêbûne me bi vî zimanî axiviye, dê û bavê me, hawirdora me, hêrêma me û gelê me bi vî zimanî axivî ne, neheqiyê mezin li Kurdî bûye." O2

*"Perspektîfa me ya sereke bila zarok bi zimanê xwe yê zikmakî perwerde bibînin. Heger zimanê wan yê zikmakî zaravayê Kurmancî be dê li gel zaravayê Zazakî jî hîn bibin. Perwerdeya zimanê Îngilîzî jî digirtin. Zimanê dayikê yê bingeîn bû, lê bi hemû zimanan me perwerde dida. Yanî zarok li gel zimanê xwe yê zikmakî zimanên din yên ku ew bi awayekî zihnî pêş dixistin jî hîn dibûn û perwerdeya wan xurt dibû."*Y1

BANDORA PERWERDEHIYA BI ZIMANÊ ZIKMAKÎ YA LI SER ZAROKAN

Gava me pirs a bandora perwerdehiya bi zimanê zikmakî ya li ser zarokan pirsî, malbat herî zêde ev têgeh bikaranîn; xwestek, bextewarî, azadî, û jixwebawerî. Jêhatîbûna zarokan ya xwe îfadekirina bi zimanê zikmakî û têkiliya ku ew bi dibistanên Kurdî re jî danîtibin anîn ziman:

“Bi xwesteke xwe diçû û serkeftî bû. Dibistanê bextewarî pê re çêdikir, xwe bêtir rehet û azad hîs dikir li wir. Çikû li wir mafê zarokan hebû û ew vê yekê diditin. Zarok li navendêbûn û mafên wan dianîn bîra wan. Pergaleke wiha hebû li van dibistanan. Nevê dibistanan jî zarok bi xwe danîtibûn.” E7

“Zarokên birayê min diçin dibistana Tirkî, lê zarokên min diçin ya Kurdî. Gava ez zarokên xwe divim nav civatekê zarokên min çalak in û bêtir dikarin xwe binin ziman, çewa bêjim jêhatîne yanî cûda ne. Dibêjin ku em diçin dibistana taybet ya Kurdî. Hemû kes dipirsin gelo ciyekî wisa heye? Erê, heye dibêjim.” E10

Kesên xwedî azmûn yên ku li saziyên perwerdehiyê yên Kurdî xebitîbûn, wek malbatan heman tiştî gotin. Ew jî anîn ziman ku zarok bi zimanên xwe bêtir xwe bextewar hîs dikirin û bi kelecana, ji xwe bawer bûn. Serkeftina wan ya li dibistanê, têkiliya wan ya bi derdorê re û her wiha têkiliyên wan yên civakî pir pêşketî bûn. Ev hêlên wan yên erênî anîn ziman:

“Piştî dibistan hatin girtin zarok çûn dibistana dewletê. Piştî 1-2 meh bi Tirkî hîn bûn û di polê de yên herî serkeftî bûn. Mamoste ev hêla wan ya têgihîştinê pîroz kiribû û li hember vê yekê matmayî mabûn. Ji hêla hezkirin û hînbûnê, ji gelek hêlan ve bandora zimanê zikmakî hebû.” Y3

“Li her hêlî ve gava zarokek bi zimanê xwe perwerde dibîne ew jîr dibe û ji xwe bawer e. Lê gava hin hêl kêr bimînin, kesekî ji xwe ne bawer derdikeve holê, zarokên ku nikarin xwe îfade bikin derdikevin holê.” STÖ9

“Stranên ku kalikên wan di çîrokan de ji wan re gotine zû tînin bîra xwe û ev tişt digotin, ‘Mamoste min ev yek ji kalikê xwe bihîstibû, li malê ji me re digot’ Gava mirov bi vî awayî li derûniya zarokan dinihêre mirov dibîne ku ev bandoreke baş li ser wan çêkiriye, diyar dibe ku ew têkiliyekê çêkiriye û bi ser re jî tiştek zêde kirine û hêlên xwe yên şîrove kirinê jî pêş xistine.” STÖ1

“Wek ku bi diya xwe re diaxive li dibistanê jî zimanê xwe diaxive. Min dît ku zarok çewa kêfxweş dibin bi vê yekê, min ev yek dît ku gava zarok bi zimanê xwe yê dayikê perwerde dibînin ew xwe baştir hîs dikin, tesîra ziman li ser zarokan gelek e. Zarok ji xwe bawer mezin dibin, bi jiyane re têkilî çêdikin, mirovên sosyal derdikevin ji wan, min ev pêşketin giş bi wan re dît.” Ö3

BANDORA REWŞA 10 SALÊN DAWÎ YÊN POLÎTÎK YA LI SER FÊRKIRINA ZIMANÊ ZIKMAKÎ A ZAROKAN

Beşdarvanên temen mezin gotin ku saziyên perwerdehiyê yên bi zimanê Kurdî di sala 2016'an de piştî OHALê bi KHK'yan hatin girtin, paşê jî hin sazî dîsa bi destûra KHKyan hatin vekirin. Di pêvajoya girtina dibistanan de hiqûq hatiye binpê kirin û biryarên giran neheq hatine girtin. Di dema pêvajoya şer û pêvçûnan de gelek kes ji herêmê koç kirine û xizanî zêdetir bûye. Ji lew re jî saziyên taybet nayên tercîhkirin, piştî kayyuman mudexeleyî saziyan kirin û mamosteyan ji kar avêtin, pergala perwerdehiyê guhertin. Ev pêvajoyê giş li ser mafê zarokan yên ku ew perwerdeya Kurdî bibînin encamên ne baş derxistin holê û astengiyên av kirin.

“Mudexeleya piştî kayyuman, kir ku naveroka perwerdehiyê biguhere, gelek mamoste ji kar dûr xistin. Paşê mecbûr man ku zarokên xwe li dibistanên dewletê qeyd bikin.” E7

“Li herêmê em yekemîn bûn. Piştî derbeyê 1800 sazî hatin girtin. Gelek zanîngeh, nexweşxane, komale û dibistanên taybet hatin girtin. Em jî di nav van de bûn. Ev girtin tev di bin rêxistina Feto de çêbûn, lê ew bi awayekî kesên muxalîf yên li hember dewletê didîtin ji holê rakirin. Heman tiştî anîn serê me jî. Erê em paşê bi KHKyekê hatin vekirin lê me li wir derbeyeke mezintir xwar. Paşê hin tiştên din ketin navberê. Dibistanên taybet gelek zêde bûn, Piştî hendekan Amed hinek xizan bû, mirov koçber bûn û di hêla aboriyê de pirsgrêk derketin. Di ser de jî ev pandemî hat, ji lew re em mecbûr man ku navberekê bidinê.” O2

Beşdarvanên temen mezin û xwedî azmûn anîn ziman ku girtina van dibistanên Kurdî li ser zarokan derûniyeke ne baş afirandiye. Zarok qet fêhmekirine bê ka çima dibistanên wan hatine girtin û di derbarê pêvajoyê de kesî agahiyên rast nedaya wan. Zarok di heman demê de bûne şahidê girtina van dibistanan. Zext û zorî piştî ku dibistan hatine girtin jî berdewam kiriye:

“Zarok bi her awayî bandor girtin. Bi carekê dibistana min çû kurê? Malbat ji zarokên xwe re wiha gotine, av ketiye dibistanê û dibistan nayê bikaranîn felan bêvan...lê piştî demekê zarok di ber dibistanên xwe re derbas bûne û hatine ji malbatên xwe re gotine ku tiştek bi serê dibistana wan nehatiye û ew li ciyê xwe ye. Dîsa ew gotine ku me pirr bêriya dibistana xwe kiriye, çima bi carekê em ji dibistanên dûr xistin. Zarok nikarin vê têkiliyê çêbikin. Bi carekê ez çima ji dibistanê hatim dûr xistin, sedem çibûn, li paşê vê yekê gelek tişt hene, paşî pir kûr e û gelek tişt hene.” O1

“Gava zarok li dibistanê bûn panzêr bi ser dibistanê de girtin û li ber çavên zarokan ev dibistan hatin girtin. Em sibehê rabûn çûn, derdorê girtibûn, me lêdan xwar şer derket. Zarokên me şahidê vê yekê ne. Zimanekî qedexebûyî tê wateya civateke qedexekirî. Derûniya zarokên min xera bû, ew dixwest demir bişkîne û kilîda dibistanê veke. Dewlet tiştek wiha anî serê me tiştek nema. Polîsan dişand mala malbatên zarokan. Her roj ev zext û zorî hebûn. Zarokên min goştên tiliyên xwe dixwin, ez her tim wan dibin cem kesên dûrûnnas.” E10

Di encama xebata me ya li qadê de, derbarê mafên perwerdehiya zimanê zikamî de li Amedê em gihîştin van encaman:

- Zagonên dibistanên perwerdehiyê yên Kurdî baş nayên zanîn û haya kesî zêde ji van dibistanan tine ye.
- Perwerdehiya bi Kurdî, bi awakî fermî tenê li van dibistanên taybet tê dayîn, ji lew re jî tenê kêsên rewşa wan ya aborî başbe dikarin jê sûd bigirin. Ev zagon, zarokên xizan dervayî vî mafê dihêle.
- Girtina dibistanên Kurdî, azmûnên ji bo lîse û zanîngehan, pirsgrêka temen astengiyan derdixe ji bo fêrbûna zimanê Kurdî. Li her navçeyê jî dibistan tine ye, ji lew re ev yek giş astangiyan çêdikin û zarok nikarin herin dibistanên Kurdî.
- Dewlet teşwîqê nade van dibistanan, çavkaniyên saziyan jî ji bo xizmetê têr nake. Ji hêl mamoset û çavkaniyan gelek pirsgrêk hene. Dibistan tenê bi xêra kesên dilxwaz û malbatan bi rêve diçin.
- Xwestek û hewildanên perwerdekarên ya ji bo zimanê zikamî bi zext û zoriyê re bi rû dimînin.
- OHAL, kayyum û pêvajoyên şer li ser girtina dibistanên Kurdî bandorê çêkir û perwerdeya van dibistanan nîvco ma. Ev rewş li ser zarokan travmayan ava kir.
- Perwerdeya zimanê zikmakî dike ku zarok bextewar bibin û ji xwe bawer bijî. Her wiha ew xwe wisa baştir îfade dikin û bi çanda xwe re têkiliyek baş ava dikin û di hêla akademîyê de jî serkeftîtir in.

Wek encam, bi rêk û pêk kirina zagonên sala 2014'an li Amedê nehiştin ku zarok xwe bigihînin zimanê xwe yê zikmakî û jê sûdê werbigirin, mafê wan yê perwerdehiya zimanê zikmakî hatiye bînpêkirin; mafê zarokan û her wiha komên çandî yên li Tirkîyeyê heye ku fêrî çanda xwe bibin û bi zimanê xwe biaxivin. Her wiha mafê wan yê vekirina saziyan ya ji bo çand û zimanê wan jî heye lê dewlet van peywîr û berpirsariyên xwe piştguh dike û pêk nayne.

Perwerdehiya bi zimanê zikmakî ji bo Kurdan mafekî bingeîn e û her wiha jiyanî ye. Ji bo vî mafê xwe bidest bixin ew ber xwe dane, gava em van 10 salên dawiyê dinirxînin, daxuyaniya Teverga Ziman û Perwerdehiya Kurdî – TZPKurdî mînakeke baş e ji bo vê yekê. Ji bo mafên ziman bînin rojevê hefteyekê dibistanan boykot kirin. Partiya Demokrasî û Aştiyê (BDP) jî piştigiriyê da bû vê daxuyaniya wan.⁴⁰

Bi hatine pêvajoya çareseriyê, di Îlona 2013'an de, di çarçoveya "Pakêta Demokratîkbûnê" de derbarê dibistanên Kurdî de daxuyaniya yekemîn hat dayîn.⁴¹ Di Adara 2014'an de li dibistanên taybet zimanê Kurdî hebû û ev maf hatibû mîsogerkirin. Lê di heman salê de di meha Îlonê de dibistanên ku bi

40 <https://www.hurriyet.com.tr/gundem/bdp-okul-boykotuna-destek-verdi-15819704>

41 <https://www.aa.com.tr/tr/turkiye/demokratiklesme-paketi-aciklandi/214907>

zimanê Kurdî perwerdehî didan hatin mohrkirin; derbarê vê yekê de cara pêşî Alîkarê Serokwezîr û Berdevkê Hikûmetê Bülent Arınç ev tişt gotibûn, “Li deverê çend tuxleyan avêtine ser hev û dibêjin dê evder bibe dibistaneke Kurdî û perwerde bidin zarokan. Ev yek propaganda ye û provokasyon e.” Bi vî awayî ew digot ku ev dibistan bêyî destûra dewletê hatine vekirin.⁴² Wezîrê Edeletê Bekir Bozdağ jî digot ku derfeta perwerdehiya bi zimanê Kurdî ji bo Tirkiyeyê gavekî dîrokî bû, lê ev pêvajoyê, bi birîna rê, revandina hin kesan û şewitandina wesayîtan hate provekirin.⁴³ Têkoşîna ji bo van dibistanan ya ku ew dîsa karibin perwerdehiyê bidin berdewam kir, di vê pêvajoyê de gelek kes hatin binçavkirin û di lêpîrsînan de derbas bûn. Di nava van kesan de zorak jî hebûn.⁴⁴

Girtina saziyên perwerdehiyê yên bi Kurdî di pêvajoyên pêş de jî berdewam kir. Mînak li navçeya Kayapınar ya bi ser Amedê, dibistana ku perwerdehî dida 60 şagirtî, ji hêla polêsan ve hat girtin. Polês gotin ku ew biryara wafî bi cî anîne û dibistan hat mohrkirin.⁴⁵ Li gor nûçeyên çapemeniyê, ji bo dibistana ku 18 Sibata 2016’an hatiye girtin MEB ê di sala 2015’an de gotiye ku ev dibistan dikare perwerdehiya bi Kurdî bide, lê gava ku dibistan çalak bû perwerdeyê dida hat gotin ku destûra dibistanê ya ji bo perwerdeyê tine ye û bi vî awayî dibistan hatibû girtin. Li gel ku biryara girtina dibistanê dabûn jî, zarok li baxçeyê dibistanê perwerdeya xwe bi şiklekî berdewam kirin.^{46,47}

Piştî darbeya 15 Tîrmeha 2016’an OHAL hat îlan kirin û di çarçoveya OHALê de biryarên KHK yê derketin⁴⁸ û di sala 2019 de karyuman avêtin ser şaredariyan û ev karyum jî li hember dibistanên Kurdî astengiyên derxistin û mudexleyî dibistanan kirin.⁴⁹

Me xwe bi riya medyayê gihand van agahiyan û ev agahî xebatên me yên li qadan jî erê dikin. Bi vê yekê re, gotinên kesên ku me bi wan re hevdîtinan kir û tiştên di medyayê de hatine gotin jî hevdû temam dikin û bi van agahiyan me gavek pêşdetir avêt. Ev encam diyar dikin ku mafê zarokan hatine binpêkirin û ev rewşên neyênî li ser jiyana wan bandoreke ne baş hiştiye.

Ji bo em xwe bigihînin agahiyên rojane, me xwest em derbarê dibistanên Kurdî de yên ku li gor Rêzîknameya Saziyên Taybet yên Fêrbûnê hatine vekirin sêrîlêdanekê bikin. Bersivên ku ji hêla Midûriyeta Saziyên Taybet ya MEB ê hate dayîn hêja ye li gor dîtin û encamên me yên li qadan were nîrxandin⁵⁰.

Me derbarê budçeyên ku ji bo van dibistanan hatiye veqetandin, teşwîq û xebatên danasînê de pirsan dirêjî Wezarete kir. Ji ber ku me di xebatên

42- <https://bianet.org/bianet/insan-haklari/158530-kurtce-okullarin-ucu-de-muhurlendi>

43- <http://www.gazetevatan.com/izin-isteyen-olursa-kurtce-okul-acabilir--678613-gundem/>

44- <https://www.milliyet.com.tr/yerel-haberler/diyarbakir/ayni-okul-3uncu-kez-muhurlenip-acildi-10386242>

45- <https://www.cumhuriyet.com.tr/haber/kurtce-egitim-veren-okul-kapatildi-484977>

46- <https://www.evrensel.net/haber/273833/bahcede-ders-basi>

47- <https://www.sozcu.com.tr/2016/gundem/ahme-kurtce-basvuru-1172338/>

48- <https://t24.com.tr/haber/khklar-kurtce-dil-ogreten-okullari-ve-dernekleri-vurdu,374790>

49- <https://odatv4.com/cocuklar-kresteyken-bu-yapilir-mi-30051954.html>

50Sêrîlêdana me ya ji bo Navenda Ragihandinê ya Serokkomariyê ya T.C (Cimer) ya di dîroka 19.02.2021’an de, 2100875878 Bersiva ku ji hêla Midûriyeta Saziyên Perwerdehiyên Taybet ve di dîroka 26.02.2021’an de ji me re hatiye.

xwe yê li ser masê de dît ku ti hewldaneke dewletê ya ji bo mafê zimanê zikmakî tine ye û ji bo ev maf werin naskirin gawekî şênber nehatiye avêtin. Di bersivê de hat gotin ku, ji xeynî piştgiriya perwerdeyê ji bo budçeya dibistanên taybet pere nehatiye veqetandin, kesên saziyê vekirine ji kîsê xwe hemî tişt dane. Daxuyaniyên Wezaretê tenê ji bo destûrdayina van dibistanan û ruhseta vekirinê hatine kirin. Ev bersiv gava tevî çavdêriyên me yê li qadan werin nixandin, dewlet destûra vekirina dibistanên Kurdî ji hêla hiqûqî ve daye, lê ji bo ku astengiyên li hember vê yekê qet tevdir negirtiye.

Di dema xebatên me yê li qadê de, me ev tişt çespand ku dibistanên Kurdî bi awayekî çalak nikaribûne ders bidin, me hejmara dibistanên Kurdî yê ku hatine girtin ji Wezaretê pirsî. Wezaretê wiha bersiv da me: "Her çiqas zagon û mevzûatên têkildarî vê mijarê hatibin sererastkirin jî dibistaneke ku hemwelatîyên Tirk karibin bi ziman û zaravayên din lê bixwînin nehatiye vekirin." û "Ji sala 2014'an û vir ve saziyên ku navên wan derbas dibin nehatine vekirin û ji ber ku nehatine vekirin girtina wan jî çênebûye." Bi vê bersivê tiştên ku beşdarvan qal kirin hatin erê kirin. Wezaret gotiye ku dibistanên ku bi Kurdî ders didin nehatine vekirin, lê di dema xebatê de me dît ku dibistanên Kurdî hatine vekirin. Bêyî prosedûr temam bibin hin dibistan hatine vekirin, lê paşê hatine girtin. Ev yek jî nîşan dide ku derbarê van dibistanan de li gel Wezaretê qeykirina van dibistanan çênebûye û ew hay jê nîn in.

Bi baldarî divê em bi bîr bin ku, Komîteya Mafê Zarokan ya BM yê, de Encama Çavdêriyên xwe yê sala 2012 yê derbarê Tirkîyeyê de, gotibû ku zarokên ku zimanê wan yê zikmakî ne Tirkî ye di hêla perwerdehiyê de bi dezavantaj in û divê Tirkîye pergaleke firehtir ji bo vê yekê amade bike û têxe meriyetê. Ev tişt pêşniyar kiribûn. Komîteya Rakirina Cihêkariya Nijadî jî di Encama Çavdêriyên xwe yê sala 2016'an de gotibûn ku roporên derbarê zimanê zikmakî de me ditirsînin, ji ber ku astengiyên li hember zimanê zikmakî gelek in û ji bo vê yekê sînor hatine çêkirin. Ew pêşniyarkiribûn ku divê Tirkîye zarokên Kurdan di derbarê zimanê zikmakî de teşwîq bike û van şert û mercan bafirîne.

Divê li tiştên di vê derbarê de hatine gotin bi baldarî xwedî derkevin, gumanên li ser xalên 29 û 30 yê BMÇHS ê de werin rakirin, divê bibin alîgirê peymanên navneteweyî yê ku mafên zimanê zikmakî diparêzin, ji bo zarok karibin bi zimanê zikmakî perwerdehiyê bigirin divê Makeqanûn were guhertin, ji bo perwerdehiya zimanê zikmakî ya li dibistanên taybet hin xal werin berfirehkirin, divê dewlet piştgiriya bide saziyên taybet û bikaranîna mafê zimanê zikmakî mîsoger bike.

Xwe
Gihandina
Berhemên
Medyayê yên
Bi Zimanê
Zikmakî yên
Zarokan

XWE GIHANDINA BERHEMÊN MEDYAYÊ YÊN BI ZIMANÊ ZIKMAKÎ YÊN ZAROKAN

Ji bo zarok xwe bigihînin pêdiviyên zimanê zikmakî û van pêdiviyan bi cî bînin ciyê medyayê taybet û girîng e. Komîteya Mafê Zarokan ya BM yê di şîroveya xwe ya giştî ya numareya 11'an de mafê zarokan yê di vê derbarê de dikirpîne û dibêje ji bo zarokên herêmî karibin bi zimanê xwe dengê xwe bigihînin hin ciyan ev mafê wan divê were parastin. Ji ber van sedeman di çarçoveya xebata me de me xewst em maddeya d ya xala 17 ya BMÇHS ê veçîrînin û berpirsyariyên dewletê yê derbarê medyayê de bişopînin.

Me pirsan pirsî ji wan, ew çewa bi derfetên xwe xwe radigihînin televizyon, rojname, kovar, platformên online, pirtûk, radyo û hwd. Me darbarê vî mafê wan de pirsên dirêjî wan kir. Zarokên ku me bi wan re hevdiştin kir nizanibûn Kurdî bixwînin û binivîsînin, ji ber wê ew pirtûkan jî negirtibûn. Zarokên ku bi Kurdî dizanibûn, kême be jî pirtûkan bidest xistine, lê gotin ku ew li pirtûkxaneyan pirtûkên bi Kurdî nedîtine. Zarok bi riya malbata xwe dikaribûn van pirtûkan bi dest bixin. Hin zarok di xwendinê de zehmetî didîtin û nikaribûn bixwînin lê ji bo çanda xwe vejînin digotin ku pirtûk ji bo wan girîng in:

“Xwişkên min hene ew meraq dikin, pirtûk û kovaran finin. Lê her tim bi Kurdî nabînin. Ç3

“Pirtûkên min hene. Hinek zor in lê ne hêsan in.” Ç10

“Li peyasê pirtûkên Kurdî pirr kême in. Yanî ez pirtûkên Mehmed Uzun⁵¹giş dizanim. Ji ber ku em ji heman paşnavî tên mecbûr me hemûyan xwend.” Ç20

“Min qet nedît. Lê ez bawerim ferhengê Kurdî hebû, min ew dît. Tenê ez ew dizanim. Kurdên xas hene ew zimanê xwe vedijînin.” Ç8

Malbat jî gotinên zarokan erê kirin û gotin ku li mala wan pirtûk tine ne; kesên ku xwe gihandine pirtûkên Kurdî jî zarokên wan nikaribûne wan pirtûkan bixwînin. Malbateke ku zarokê xwe dişand dibistana Kurdî got ku bi riya dibistanê ew pirtûk bidest xistiye:

“Min pirtûk anî lê ji ber ku bi Kurdî bû zarok nikaribûn ew bixwînin, fêhm nekirin.” E5

“Li ser medyayê, çî televizyon çî internet her tim em Kurdî dişopînin. Heger em qala pirtûkan bikin, ez rabim bibêjem li malê pirtûkên Kurdî gelek in dê derew be, elbet me dixwest li mal hebin lê pirtûkên Kurdî nayên dîtin. Ji ber van sedeman li malê pirtûkên Kurdî tine ne.” E12

“Ji xwe wan pirtûkan dibistan dide, em nagirin. Ji ber ku ew bi Kurdî ne li her derê nayên dîtin.” E9

51- Nivîskarê Mezin yê Wêjeya Kurd ya Nûjen.

Mamosteyên ku me bi wan re hevdiştin kir; gotin ku pirtûkên Kurdî û weşanên nivîskî pirr kêr in, zarok ji bo xwe bigihînin van çavkaniyan piştgirî nabînin. Li hember weşanên Tirkî, kes zêde guh nade weşanên bi Kurdî û bala wan nakîşînin ev pirtûk, jidil naxwazin hîn bibin. Ev zarok ji wêjeya Kurdî bêpar dimînin û ev windahiyeke mezin e:

*“Em didin zarokan lê zarok bi baldarî naxwînin. Ji sedî nat zimanê Tirkî tê bikaranîn. Zarok nikarin vî zimanê li ciyekî bikarbînin. Yanî muzîk, çîrok, roman, pêkenok tiştên ku berê di şevbihêrkan de dihatin gotin neman û zarok ji van dûr ketin. Ji ber vê yekê ez hinek reşbîn im. Zarokên me her sal ji vê dewlemendiyê bêpar dimînin û ev dewlemendî winda dibe. Yanî gava ez van tiştan dibêjim dilê min dişewite.”*Ö3

*“Niha derfetên dijîtal zêde bûne, li wir hene çavkanî. Lê dîsa jî em nabînin. Li ciyên ku pirtûk û kovar lê tên firotin min nedîtin. Pirsra ku divê were pirsîn, di vê hêlê de ji zarokan re dibin alîkar? Ji bo pirtûk û tiştên din kes nabe alîkar, mixabin tengasî heye. Pirtûkeke boyaxkirinê ya bi Kurdî tine ye, zehmetî hene di vê mijarê de.”*Ö1

*“Di hêla berhemana de, berhemên têkildarî zarokan, wek çîrok, pirtûkên boyaxkirî yên çîrokan, tiştên wiha zêde neyên firotinê, gelek xwîner nikarin tiştên wiha bidest bixin.”*Ö5

*“Heger malbat jî piştgirî bidin ancax ew bi dest bixin. Yanî ev bi aboriyê ve girêdayî ye, wekî din zanîna derdor û malbatê jî hin tiştan diyar dike.”*Ö6

Me di xebata xwe de berê xwe da vê yekê ka zarok ji bo xwe bigihînin pirtûkên Kurdî çiqas ji pirtûkxaneyan sûd wergirin. Ji nav 20 zarokan 9 kes ji wan gotin ku qet haya wan ji pirtûkxaneyan çênebûye, ji wan hin zarok jî gotin ku pirtûkxaneyên girêdayî şaredariyan hebûn lê piştî kayyuman ew hatine girtin. Ji nav wan zarokan çend jê jî anîn ziman ku ew li pirtûkxaneyê pirtûkên Kurdî dîtin:

*“Li pirtûkxaneyê nêzikatiyeke ku bibêje ev bi Kurdî ye ez biveşêrim min nedît. Min çend heb dîtin. Yek ji wan ansîklopedî bû, pirr xerîb hatibû ji min re. Pirr çû li xweşa min.”*Ç5

*“Bawer nakim, pirtûkxaneyake ku pirtûkên Tirkî lê hene zû bi zû pirtûkeke bi Kurdî li wir nahewîne, li Amedê min nedît, belkî yek belkî jî du pirtûkxane.”*Ç13

Beşdarvanên temenên wan mezin jî gotin ku li pirtûkxaneyê çav bi pirtûkên Kurdî neketine, çend beşdarvan bêtir ku navekî an jî ciyekî şênber bidin gotin ku li hin dibistan û saziyên civakî ji bo zarokan pirtûkxane hatine vekirin:

*“2-3 pirtûkxaneyên ku nû vebûne hene, mirov dikare xwe bigihîne klasîkên Tirkî, lê min weşanên Kurdî li wir qet nedît.”*Ö3

*“Zarokê min yê mezin li lîseyê diçe pirtûkxaneyê lê diçe kîjanê ez nizanim.”*E3

*“Tiştê ez dizanim pirtûkxane tine ye. Hin komeleyên zarokan hene, li ciyên wiha hebûn, lê tiştên biçûk, li taxan ciyên ku hemû kes karibin herin û bidest bixin tine bûn.”*E8

Di hevdiştinan de zorok gotin ku ew bêtir berê xwe didin televizyona û pîr kêm pirtûkan dixwînin. Ji bo zimanê zikmakî ji pirtûkan bêtir ew li kanalên televizyona dinêrin:

"Tenê kanalek heye, em wê dişopînin. Ez navê wê bibêjim? Ji ber hûn qeydê digirin ez nebejim, yanî navê kanalê ye." Ç5

"Pirtûkên Kurdî nizamim, min ji bo xwarzîkên xwe çîrok xwendin. Pirtûk zêde tine ne, em li kanalên nûçeyan dinihêrin, je ber ku zimanê me yê zikmakî ye em li wan temaşe dikin." Ç15

"Kesên li kanalên televizyona temaşe dikin hene, lê min pirtûk û kovar zêde nedîtin." Ç13

Zarok gotin ku ew navê wan kanalên bi Kurdî dizanin û li malê li van kanalan temaşe dikin, zarokên ku bi Kurdî fehmnedikirin gotin ku em li van kanalan temaşe nakin:

"Em li kanalên Kurdî temaşe dikin carinan. Ez ji nûçeyan zêde fêhm nakim. Ez fêhm nekim jî ji apê xwe dipirsim apê min ji min re kêm zêde werdigerîne." Ç5

"Ji ber ku ez zêde fêhm nakim nikarim zewqê jê bigirim. Diya min ew ji ber ku fêhm dikin dikenin. Nizamim, ez dibêjim hevalên min jî temaşe nakin." Ç16

"Yanî mamoste carinan derdikevin hemberî min, televiziyonê dinêrim dixwazim fêhm bikim lê ez jî zêde jê fêhm nakim." Ç19

Di nav kanalên Kurdî de TRT Kurdî tenê ji hêla zarokê ve hate bilêvkirin. Wekî din zaro bi giştî qala Zarok TV kirin û gotin ku em di vê kanalê de li muzîkên Kurdî guhdar dikin. Li gel vê yekê gotin ku hejmara kanalan kêm e û hin kanal hatine girtin, her wiha gotin ku ew kanalên televizyonê yên bi Kurdî dixwazin:

"Rola televiziyonê heye lê çend kanal hatine girtin. Tenê 2-3 ji wan vekirî ne, hin caran jî qet namînin ev kanal. Ji bo zarokan kanala Kurdî jî heye, ew jî pîr baş e. Min li wan temaşe dikir." Ç10

"Hin kanal hene lê ew jî bi zorê debara xwe dikin. Min bêtir dixwest kanalên bi Kurdî bin." Ç15

"Bername tine ne di televiziyonê de lê starn, û kesên navdar derdikevin ez wan dişopînim." Ç20

Beşdarvanên temen mezin jî anîn ziman ku naveroka kanalên Kurdî qels e û xitabî her temenî nakin, ev jî bala zarokan nakêşe, zarok bêtir bala xwe didin stranên Kurdî :

"Ew ji Zarok TV hez dikir, temaşe dikir, a rast em jî hin hêlên wê rexne dikin, hin naverokên bernamayan. Lê em dizanin ev tişt jî ber bêderfetiye ye. Ji hêla aborî ve çavkaniyên xurt tine ne, ev kêmasî jî ber van peyda dibin. Lê hin weşanan bi taybetî temaşe dike û dişopîne, ew zêde berê xwe dide stranên. Ez di vê nihêrinê de me, naverokên bi qelîte yên bi Kurdî pîr paşde man, bi taybetî jî Zazakî pîr qels ma, bi vî zaravayî tiştêk nayê çêkirin û weşandin." E7

"Resm û rengkirin pirsgirêk e, ji ber xeyalên zarokan û dinyaya wan ev yek dixwest lê di hêla dîtbarî û estetîkê de ji bo zarokan tiştek nehat afirandin." E8

"Ez çavdêriyan dikim. Heger yekî ew jê hez bike biaxive ew jî meraq dike, stranên ew jê hez bike hebin ew meraq dike. Zarok TV heye, ew jî xêzfilman bi dublajê tîne ser ekranê zarok jê fêhm nake. Hin stran û klîbên herêma hene. Zarok ji wan hez dikin." Ö1

Ji bo TRT Kurdî, zarok gotibûn ku em lê temaşê nakin, her wiha mezinan jî anî ziman ku ev kanal xîtabî zarokan nake û naveroka wê pir qels e ji bo zarokan:

"Di TRT ê de tiştekî ku zêde zarokan eleqadar bike tine ye, tiştên bi qelîte nîn in." Ö5

"TRT 6 heye ez temaşê nakim, naxwazim û nahesibînim. Tev ji me didizin. Dilsoz nayê ji bo min. Ji dil û can vî karî nakin. Valahiyeke mezin heye." E5

Mamosteyan jî anîn ziman ku divê naveroka weşanên bernameyan ji bo zarokên ku Kurdî nizanin bêtir hêsanîr bin û hêlên wan yê fêrkirinê li pêş bin:

"Kanaleke ku xêzefilmekî Kurdî dide heye, zarokê min hîna biçûk e lê ji ber ku bi zimanê wî re eleqeya wê heye ew bala xwe didêyê û temaşê dike, tiştekî ku di zimanê Kurdî de wateya wê nizane dibîne, yanî ew tiştek jê hîn dibe." Ö2

"Gelek malbatên ku bi Kurdî nizanin, Zarko TV vedikin da ku zorokên wan hîn zimanê Kurdî bibin. Xeber nadin an jî nikarin xeber bidin, ew jî ji wir hêviyan dikin." SM3

Derbarê xwe gihandina medyayê ya bi zimanê zikmakî de me bi weşanger, nivîskar û şanogerên ku berhemên Kurdî derdixin re jî axivî. Di hevdîtinan de anîn ziman ku ew bi ti awayî piştgiriya negirtine û ji hêla aborî ve bi gelek astengîyan re rû bi rû mane. Ji ber wê jî hilberîneriyê kêma heye, bêtir bi hewldanên şexsî ev kar bi rêve dibin. Bêtir malbat û kesên dilxwaz piştgirî dane wan. Gotin ku têkiliya bi nivîskarên ku Kurdî dinivîsin re jî zehmet e û xwe nikarin bigihînin wan:

"Slavdayîn û axavtin û diyalog me teşwîq dike. Ew tenê pirtûk bidin me û slavê bidin me ji bo karê me here serî bes e. Ji xwe gava em van çavkaniyan çap dikin em ji kîsê xwe çap dikin. Teşwîqa wan rûkeniya wan e, tenê bila ew bi zarokên xwe re bi Kurdî biaxivin ev yek bes e." SM1

"Em ji saziyan teşwîqê nagirin. Bi çavkaniyên xwe xebatên xwe didomînin. Di vî warî de gavê yekemîn e, ji ber wê piştgiriya şexsî gelek in. Yanî kesekî ku piştgirî bide me ji me telifê naxwaze, hin kes hene bi dildarî vê yekê dikin. Gelek kes baweriyê bi vê xebatê tînin." SM3

"Zehmetiyên aborî hene. Listikên zarokan bi gelemperî dibistan digirin an jî kesên ku şanoyê dikin, ew diçin dibistanan. Zarok bi tena serê xwe nikare here. Yanî malbatên wan ancax dawîya hefteyê wan bînnî, ew nikarin vê biryarê bigirin, divê yek vê xizmetê bike. Di nav van şertên zehmet de, bê

piştgirî derxistina lîstikan û ya herî xerab ji ev xebatên me bê bersiv dimînin. Ev êşeke mezin e.” SM4

“Li amadekirina pirtûkan bigirin heya ku diçe çapxaneyê, ji hemû qonaxên aborî heya ku diçe embarê em pê re mijûl dibin. Zehmetiyên mezin ev in, tiştêkî din jî em di hêla boyaxkirina resman de zehmetî dikêşin. Nivîskarên ku ji bo zarokan bi Kurdî binivîsînin jî gelek kêr in. Zehmetiya herî mezin jî ev tişt e.”SM2

“Ez kêr çap dikim. 1000 pirtûk çap dikim xwe digihînim 1000 kesî. Çi tiştêkî komîk e. Gava em diaxivin em dibêjin 20 milyon, 40 milyon lê rastiya me 1000 kes e.”SM1

Di xebata xwe de me dît ku di navbera perwerdehiya zimanê zikmakî û mafê xwe gihandina bernameyên medyayê de têkiliyek baş heye. Li gor vê yekê, çapkirina pirtûkên Kurdî û hilberîneriya weşanên çapkirî û her wiha bikaranîna zimanê Kurdî ya di perwerdehiyê de hevdu temam dikin û hêzê didan hev. Ev pêvajoyek baş bû. Kesên perwerdekar û xwediyên weşanxaneyan jî nêrînên xwe ev tişt rave kirin:

“Hilbijartina dersa Kurdî niha peywîra xwe winda kir. Di serî de baş bû, mamosteyên ku diketin van dersan dihatin. Ê min 40 şagirtên min hene, ê min 100 şagirtên min hene, materyalan bidin min, ferhengê bidin min. Mamoste wiha ev tişt dixwestin.SM2

“Ji ber ku perwerdehiya bi zimanê Kurdî tine ye, pirtûkên çîrokan yên bi Kurdî jî çap nedibûn. Bi wextê re, piştî van dibistanan jî bilf ku pirtûkên çîrokan derkevin, weşanxane hatin vekirin. Ji ber ku daxwaz hebû. Me digot kêmasiya me ya çîrokan heye, kêmasiya kovaran, têgeh, kovarên rengan û tiştên bi vî rengî dixwest. Li Amedê du weşanxaneyên ku tenê pirtûkên zarokan çap dikin vebûn.” Y2

BANDORA REWŞA 10 SALÊN DAWÎ YÊN POLÎTİK YA LI SER XWE GIHANDINA BERHEMÊN MEDYAYÊ YÊN BI ZIMANÊ ZIKMAKÎ YÊN ZAROKAN

Rewşa 10 salên dawî yên polîtîk bandorek çewa li ser xwe gihanndina berhemên medyayê yên bi zimanê zikmakî yên zarokan ava kir. Me berê jî di rapora xwe qala vê yekê kiribû, lê me xwest em dîsa jî binirxînin. Bi pêvajoya OHALê re karyûm hatin û mudexeleyî dibistanên Kurdî kirin. Zarok ji van pêvajoyan neyênî bandor girtin û nikaribûn xwe bigihînni van berheman. Pirtûkxane hatin girtin, çalakî û kurs hatin betalkirin:

“Piştî karyûm hate şûnde ew der hati girtin, ez bawerim wergerandin pirtûkxaneyê. Pirtûkên Kurdî êdî nayên dîtinê. Wekî din ciyekî ku dizanim tine ye.. Ç3

"Me her tim got kêmasiya me ya çîrokên Kurdî heye, kêmasiya kovaran, ya têgehên, kovarên rengan me dixwest. Paşê jî ev weşanxane hatin vekirin û bi vekirina van weşanxaneyan em rehetir bûn, lê gava ev pêvajoyên dawî bî dîsa zehmetî dest pê kirin. Ji lew re tu nikarî bixwînî, bigerînî, li cem xwe hilgirî, ew rehetîya bere nema yanî, çend sal ew rehetî hebû me gelek tişt kir û em pêşve çûn." Y2

"Kayyumdan sonra çocukların aileleri evlerini bize açtılar. Kurslar evlerde devam etti." SM5

NIRXANDIN

Di xebata xwe ya li qadê de, em li Amedê derbarê mafê xwe gihandina berhemên medyayê yên bi zimanê zikmakî de gihiştin van encaman:

- Zarok pir bi zehmetî xwe digihînin pirtûkên Kurdî. Zarok nikarin li pirtûkfiroşan pirtûkên Kurdî bidest bixin, ew tenê bi alîkariya malbatên xwe dikarin pirtûkan bidest bixin.
- Zarok her çiqas bi Kurdî zanibin jî ew gava pirtûkan dixwînin zehmetiyan dikîşînin. Nivisandin û xwendina zarokan qels e.
- Zarok nikarin xwe bigihînin pirtûkxaneyên ku pirtûkên Kurdî lê hene.
- Zarok ji bo zimanê xwe ji pirtûkan bêtir televizyonê tercîh dikin. Lê televizyonên Kurdî ji bo bernamayan zarokan çêbikin zehmetiyan dikêşin. Bernamayan ji bo zarokan yê di TRT Kurdî de xîtabî zarokan nakin.
- Kesên bi wêje, muzîk, şanoya Kurdî re eleqedar in ji teşwîqan bêtir, bi zehmetiyan re mijûl dibin.
- Perwerdeya Kurdî û afirandina naverokên medyayê, dikevin pêvajoyeke hevdû temamkirinê. Dersên Kurdî û dibistan rê li ber hilberîneriya medyayê vedike. Berhemên medyayê jî ji ders û dibistanan re dibe bersiv û wan temam dike.
- OHAL, kayyum û pêvajoya şer û bandorên wê, dibistan û pirtûkxaneyên hatine girtin li hember weşanên Kurdî dibin asteng û zarok nikarin xwe bigihînin van weşanan.

Wek encam, li Amedê mafê zarokan yên xwe gihandina berhemên medyayê yên bi zimanê zikmakî tîn bînpê kirin. Amûrên ragihandinê girîngiyê nadin pêdiviyên zarokên Kurd yên derbarê ziman de û teşwîq tîne ye.

Ji bilî xebatên me yên li qadan, di xebat û lêkolînên xwe yên li ser masê de jî ji bo em xwe bigihînin agahiyên rast û rojane me bi gelek saziyên têkildarî vê mijarê re havdîtinan kir. Derbarê berhemên medyayê yên bi zimanê Kurdî de, ji bo agahiyên me serîladên xwe kir. Di vê çarçoveyê de; xebatên ji bo zarokan, budçeya ku ji bo vê xebatê hatiye veqetandin, teşwîqên ji bo weşanan, fîrajên çapên pirtûkên zarokan, hejmara saziyên medyayê û derbarê mafê zarkokan yên weşanê de me pirsên dirêj ji van

saziyan kir⁵². Piştî serîlêdana me, li gor qanûna 6112 ya Saziya Radyo û Televîzyonê, bersiv hat dayîn ku 32 saziyên ragihandinê yên bi zimanên din (zimanên biyanî) hene û hew. Pirsên me yên din bê bersiv man. Di dema lêkolînê de, li gor agahiyên RTÜK ê ji nav van 32 saziyên ku bi zimanê biyanî weşanê dikin, 27 sazî bi Kurdî weşanê dikin, lê di nav wan de tenê 1 televizyon ji bo zarokan hatiye damezirandin.⁵³ Ev jî nîşan dide ku li gor hejmara zarokên ku bi Kurdî diaxivin amûrên ragihandinê yên wek televizyonê gelek kêmtir in. Kanala taybet ya pêşî ji bo zarokan hatiye vekirin Zarok TV ye. Zarok TV di pêvajoya OHALê de di Îlona 2016'an de hate girtin, lê bi KHK'yê di 18 Mijdara 2016'an de dîsa vebû. Çewa ku berê beşdarvanên me jî anîn ziman ev yek nîşan didin ku nêzikatiyên antîdemokratîk li ser zimanê zarokan bandorê çêdike û zarok bi hêsanî nikarin xwe bigihînin berhemên medyayê û ev mafê wan tê binpê kirin.

Tiştê ku dîtinên me dipeyitîne yek jê jî ev bu ku haya zarokan ji weşana TRT Kurdî tine bû. TRT Kurdî di 1 Çileyê 2009'an de bi destê dewletê bi navê TRT 6 hat avakirin, lê di weşanên TRT Kurdî de naverokake ji bo zarokan tine ye û di vê hêlê de tiştekî ku zarok jê sûd wergerin tineye û nehatiye amedekirin. Ev rastî hebû⁵⁴

Di derbarê pirtûkên zarokan de jî lêkolînên me nîşan didin ku ev xebat jî pir qels maye û weşanên ji bo zarokan pir kêmtir bûne. Li gor vê yekê, di bersivên hikûmetê yên di sala 2019 û 2020'an de ev tişt hatine gotin, bandrolên ku ji bo pirtûkên Kurdî hatine dayîn di sala 2015'an de 1.057.440, di sala 2020'an de 85.400 heb bûne. Ev agahî her çiqas derbarê weşanên zarokan de agahiyek taybet nîn be jî, rewşa 5 salên dawiyê ya pirtûkên Kurdî bi awayekî dilsoj radixe ber çavan.⁵⁵ Di bersivên hatine dayîn de tê gotin ku 32 weşanên bi Kurdî hene, her wiha tê gotin ku cara yekemîn ji bo carekê 50.000 hezar ferhengên Kurdî-Tirkî û Tirkî-Kurdî hatine çapkirin.⁵⁶ Bi kurtasî, gava em amûrên ragihandinê yên bi Kurdî û hejmara zarokên ku zimanê wan bi Kurdî ye fînin rex hev em dibînin ku pêdiviya zarokan ya ziman bi cî nehatiye.

Hatiye îlankirin ku li Amedê girêdayî Wezareta Çand û Turîzmê, li 7 navçeyan, 2 zarok, 1 gerok û 1 muze pirtûkxane hene,⁵⁷ lê di hevdîtinên me de zarok gotin ku li van pirtûkxaneyan me xwe negihandiye pirtûkên Kurdî. Di lêgerînên me yên medyaya civakî de em pêrgî agahiyek wiha jî hatin. Piştî ku di sala 2016'an de kayyum bi ser şaredariyan ve girtiye, li pirtûkxaneyan

52- Serîlêdana me ya ji bo CIMERê ya di dîroka 22.02.2021'an de ye bi hejmara 2100922929. Di dîroka 09.03.2021 jî hêla Daîreya Serokatiya Şopandin û Nirxandinê ve hat bersivandin.

53- <https://www.rtuk.gov.tr/yayin-izni-verilen-kuruluslar/5165/5046/yayin-izni-verilen-kuruluslar.html>

54- <https://trtkurdi.com.tr/>

55- <https://www.tbmm.gov.tr/d27/7/7-29556sgc.pdf>

56- <https://www.tbmm.gov.tr/d27/7/7-12431sgc.pdf>

57- <http://diyarbakirkutuphane.gov.tr/TR-265543/subelerimiz.html>

Navenda Çand û Hunerê ya Cegerxwîn ji bo zarokan bi qasî 10 hezar pirtûkên Kurdî-Tirkî hebûne, lê bi wextê re hejmara van pirtûkan daketiye 300 hebi⁵⁸. Di sala 2014'an de Pirtûkxaneya Bi Deng ya ku girêdayî Daîreya Xizmetên Civakî ya Şaredariya Mezin ya Amedê ye, ji hêla kayyuman ve hatiye girtin. Ev pirtûkxane ji bo kesên berasteng hatibû damezirandin. Lê piştî hate girtin çavkaniyên bi Kurdî yê ji bo zarokên berasteng hatibûn amadekirin jî ji ser malperê rakirin. Nehîştin ku zarok xwe bigihînin pirtûkên bi deng.⁵⁹

Ev tiştên ku hatine ziman nîşan didin ku dewlet mafê zarokan yê ji bo zimanê zikmakî neparstîye û meqanîzmayên xwe ji bo vê yekê teşwîq nekiriye, bi hin mudexeleyan ew bi sînor kiriye û astengiyan ava kiriye ji bo vê yekê.

Divê Tirkiye gumana xwe ya li ser xala 17 ya BMÇHS yê rake, mafê zarokan yê xwe gihandina berhemên medyayê mîsoger bike, ji bo zarokan weşan û naverokên bi Kurdî amade bike, ji bo zarokan divê teşwîqên taybet hebin. Her wiha divê ev meqanîzmayên venerandinê li gor zarokan bin û divê rêgezên weşanê, rehbera xebatê, ombudsmanî û hwd. ji bo zarokan werin amadekirin.

58- <https://www.evrensel.net/haber/408449/kutuphanedeki-10-bin-kitap-kayyumdan-sonra-300e-dusuruldu>

59- Rapora parlementerê Amedê ya Sezgin Tanrikulu ya di Sibata 2021'an de "Rapora Bidestxistina Îradeya Gel, Politikaya Kayyum": <https://bianet.org/bianet/siyaset/240041-kutuphaneler-kapatildi-taziye-evleri-yikildi>

Li Hember
Binpêkrina
Mafan
Mekanîzmayên
Bi Zimanê
Zikmakî yên
Serîlêdanê

LI HEMBER BİNPEKRINA MAFAN MEKANİZMAYÊN BI ZIMANÊ ZIKMAKÎ YÊN SERÎLÊDANÊ

Me derbarê 3 xalên BMÇHS yê ku Tirkiye ew bi guman dîtiye de lêkolînekê bi rêve bir. Zarok bi zimanê zikmakî serîlêdan û gijîkirinên xwe çewa dîkin û kîjan mekanîzmayan bikartînin an jî ewê mafên xwe çewa pêk bîne. Ev jî wek mijareke girîng derket pêşberî me. Komîteya Mafê Zarokan ya BM yê di numereya 11'an ya şîroveya gelemperî de fîne ziman ku zarokên di nav komên kêma de bêtir bi îstismarê re rû bi rû dimînin û ew rewş dijîn. Her wiha Zarokên wek karker dixebitin û nikarin xwe wek zarokên din biparêzin. Ji azadiyê bêpar in û dervayî pergala dadmendiyê dijîn. Hejmara van zarokan gelek zêde ye. Sedemên van tiştan jî cihêkariya sistematîk e. Ji ber van sedeman divê girîngiyê bidin van risk û talûkeyên li ser zarokan û ji bo van pirsgerêkan tevdiiran bigirin.

Di dema lêkolînê de, me xwest em li ser Makaanûna Tirkiyeyê rawestin. Di Makaanûnê de tê gotin ku zimanê fermî Tirkî ye, yek ji rêgezên Peymanê yê sereke çavdêriya başiya zarokan e, divê nehêlin zarok cihêkariyê bijîn û mafên wan yên beşdarbûnê neyên bînpê kirin û ji bo vê yekê baldar bin. Gava mafê zarokan hat bînpê kirin divê bi zimanê xwe yê zikmakî bi hêsanî û bi awayekî ewle karibin xwe îfade bikin. Me xwest em hîn bibin ji bo vê yekê mekanîzma hene an tune ne, gelo zarok çewa xwe digihînin van mekanîzmayan û ew bikartînin. Me ev tişt şopandin.

Di encama hevdîtinan de, zarok gotin ku gava mafên wan tînin bînpê kirin ew nizanin dê serî li kîjan saziyan bidin û van saziyan nas nakin. Hin zarok qala polêsên zarokan kirin, hin zarok jî gotin ku ew di vê rewşê de dikarin ji mamoste, komaleyên zarokan û malbatên xwe alîkariyê bixwazin û pirsgerêka dijîn ji wan re bibêjin:

“Mamosteyên ku rêberiyê dîkin, çewa bêjim saziyên civakî yên sîvil yên ku mafên zarokan diparêzin, gava mafê zarokekî were bînpêkirin, mirov nikare li ciyê xwe bisekine, elbet divê derbarê vê mijarê de mirov hin tiştan bide zanîn, hem ji bo xwe hem jî ji bo civakê.” Ç3

“Ez navên saziyan baş nizanim lê gava tiştek wisa biqewime ihtimalek mezin ez ê herim ba mamosteyê rêber an jî ji diya xwe re bibêjim.” Ç4

“Heger dibistan vekirî bin, mamosteyê me yê rêber hebû, gava tiştek bihata serê min min ê jêre bigota. Dê ew jî biçûya serî li dibistan an jî yurdên ji bo zarokan bixista. Wê gavê min ê bikira ku malbat an jî kesên ku tûndiyê li zarokan kirine werin cezakirin.” Ç10

“Ez ê ji malbata xwe re bibêjim, an jî ji polêsan re, an jî ji komoleyên ku mafên zarokan diparêzin, wisa yanî.” Ç17

Di hevdiînan de zarok ji me re gotin ku gava mafên wan hatine binpêkirin ciyekî ku bi zimanê zikmakî xizmetê bide wan tine ye, ew bi zimanê zikmakî serî li ti deverê nedane. Lê zarok anîn ziman ku divê ev mekanîzmayên serîlêdanê bi zimanên ku zarok ji wan fêhm bikin bixebitin:

“Rûsî heye, ez dibêm Îngilîzî jî heye. Kes nîrx nade Kurmancî û Zazakî.” Ç8

“Bi Tirkî ye lê divê zimanên din jî hebin, divê li hember zimanên din jî rêzbigirin.” Ç9

“Ez bi kîjan zimanê bi axivim dixwazim yê hemberî min jî bi vî zimanê bi min re bi axivin. Mînak gava yek here bi Kurdî bi axive divê bi Kurdî bersiv bidinê, an jî gava bi Tirkî axivî divê bi Tirkî bersivê bidinê.” Ç13

“Divê bi Tirkî û Kurdî, bi 2 zimanan hebe.” Ç14

Malbat jî wek zarokan gotin ku kêmasiyên mekanîzmayên serîlêdanê hene. Her wiha gotin ku ew nikarin bi Kurdî xizmetê bigirin ji van saziyan ango mekanîzmayan:

“Ez dixwazim xwe bigihînim, lê nikarim.” E1

“Ez qet neçûm û min serîlêdan nekir. Lê ez dibêjim qedexa ye. Heger tiştek were serê min mecbûr ez ê bi Kurdî bi axivim. Ez baş bi Tirkî nizanim. Heger Kurdî hebûya dê baştir bûya.” E3

“Îro mafekî binpêkirî heye, di fermiyetê de ji xwe em tine ne. Erê rast e, li hin deveran dibêjin ‘Me wisa kir, me wiha kir. Kurdî jî zimanek e.’ Lê mixabin tiştekî wisa tine ye. Em di fermiyetê de nikarin tiştek bikin, lê bi rîya komeleyan bi awayekî xwe îfade dikin.” E4

Nûnerên saziyên civakî yê sivil, gotin ku pêdiviya malbat û zarokan bi serîlêdanên Kurdî heye, ev pêdiviya wan bi zagon û personelên ku bi Kurdî dizanin dikarin çareser bikin:

“Gava ez serî li dadgehê an jî li saziyeke din didim, zimanê fermî Tirkî ye, tiştek jî destê min nayê. Divê em Kurdî wergerînin Tirkî, nexwe ev daxwaznameya me nayê qebûlîkirin. Em dikarin gelek hêlên civakî bi axivin lê gava em herin ber deriyên saziyên dewletê bi Kurdî nabe divê em vegehin Tirkî. Yanî dîsa em vedigerin û li fermiyetê diheliqin. Li gor pêdiviyê divê bi Kurdî be, bi Zazakî be û hwd. Personelên ku van zimanan dizanin pir kêmtir in.” STÖ10

“Formê serîlêdanê bi Tirkî ne. Agahiyên kesan bi Tirkî ne lê bi Kurdî jî serîlêdan çêdibin. Kesên ku bi Tirkî nizanin dikarin bi Kurdî serî lêbidin, em serîlêdanên wan bi Kurdî digirin.” STÖ7

Beşdarvanên temen mezin, ji bo rêbazên mafê zimanê zikmakî ji zarokan bêtir neyên axivîn û tabloyeke ne baş derxistin holê; mafên ku mezin nikarin jê sûd werbigirin dê zarok çewa dikaribin xwe bigihîninê û jê sûd bigirin:

“Gava mafên mezinan tê binpêkirin nikarin parastina xwe bi Kurdî bikin, dê çewa zarok karibin xwe bi Kurdî biparêzên. Ev tiştek xeyalî tê ji min re.” Ö1

“Muvekilê min yê zarok xwest ku parastina xwe bi Kurdî bike. Li gorî zagonan gava ku yek xwest bi zimanê xwe yê zikmakî bi xwe divê dadgeh wergeranek bibîne ji bo wî kesî. Li hember parastina bi zimanê zikmakî astengî tine ye, lê gava me îsrar kir û got em dixwazin parastin bi Kurdî be ve xwesteke me bi cî nehat. Ji ber ku ew bi Tirkî dizanibû gotin ku bila bi Tirkî parastina xwe bike. Gotin ku ev maf tenê ji bo kesên ku bi Tirkî nizanê ye. Serokê dadgehê ev yek anî ziman. Gava ez veqeriyam girtîgehê min nizanibû ez ê vê yekê çewa bi zarok bidim fêhmkirinê. Yanî zarok pirs dikir, ‘ji bo vî mafê zagon hene, ji bo mezinan ev maf heye, li girtîgehê carinan ku bi dadgehê re dikevin têkiliyê bi Kurdî diaxivin. Gelo ji ber ku em zorok in ev maf nadin me’ Min nikaribû vê pîrsa wî bibersivînim. Dadgeh bêyi ku îfadeya wî bigire ceza da vî zarokî. Paşê biryar li dadgeha bilind paşve hat kişandin, lê di wê pêvajoyê de zarok girtî bû, paşê hat berdan.” STÖ7

NIRXANDIN

Di xebat ma ya li qadan de, li Amedê derbarê mekanîzmayên mafên serîlêdan û giliikirina bi zimanê zikmakî de em gihîştin van encaman:

- Gava zarok bi neheqiyekê re rû bi rû dimînin ew nizanin dê serî li kîjan deverî bidin.
- Zarok ji bo serîlêdan û giliikirinê mekanîzma û mafên pirr zimaniyê dixwazin.
- Zarok li gor mezinan derbarê mafên serîlêdan û giliikirina bi zimanê zikmakî de bi dezavantaj in.

Wek encam, zarok bi cihêkariya sistematîk re rû bi rû dimînin. Ji lew re ihtimalek mezin ya ku ew bikevin pergala adlî heye û li hember rîsk û talûkeyan jî nikarin xwe biparêzin. Gava tiştek tê serê wan ew nikarin xwe bi zimanê zikmakî binin ziman û mafê wan yê serîlêdan û giliikirinê tê binpêkirin. Ew nikarin xwe bigihînin mekanîzmayan.

Li Tirkiyeyê ji bo lihevnekirinên taybet û giştî ciyên adlî hene ku mirov serîlêdanan bike, ji bilî van ciyan, ciyekî ku zarok serî lêbidin tine ye:

Di bin banê Wezareta Malbat, Xebat û Xizmetên Civakî de “Xeta Alîkariyê ya Civakî Alo 183” heye. Ji bo kesên pêdiviya wan bi xizmetê heye dixebite û derbarê saziyên xizmetê yê civakî de agahî dide mirovan. Lê xizmeta wan ya bi Kurdî tine ye.⁶⁰

Obdusmana Zarokan (KDK) ku bi hemû karên zarokan yê wek, zagon, dad û mafê mirovan re mijûl e û pêşniyarên di vê mijarê de guhdar dike û şêwirmendiyê dike ji bo vî karî, serîlêdanên Kurdî qebûl nake⁶¹.

60- <http://www.alo183.gov.tr/>

61- www.kdkcocuk.gov.tr

Navenda Ragihandina Serokkomariyê (CIMER) ji bo mafê daxwazname û agahiyê xizmeta elektronîk dide, ji zarokên ku 12 salên xwe tije kiribin re vekirîye û li giliyên wan guhdar dike lê ji bo serîlêdanê ji xeynî zimanê Tirkî zimanekî din qebûl nake⁶².

Kesên ku bi cihêkariyê re rû bi rû dimînin û mexdûr in dikarin di çarçoveya Protokola Îhtiyarî (OPACT) serî li Peymana Ceza û Êşkencê ya BM yê bidin. Li Tirkiyeyê saziya TÎHEK ê ji bo zarok û mehkûmên li hepsê jî vê peywîrê dibîne. Saziya Wekhevî û Mafê Mirovan ya Tirkiyeyê (TÎHEK) ku hemû mafên bînpêkirinên li Tirkiyeyê dişopîne jî serîlêdanên bi Kurdî qebûl nake û xizmeteke bi vî rengî nade⁶³.

KADES di malpera xwe de diyarkirîye ku ji bo jin, zarok û kesên ku hatine tacizkirinê xizmetê dide û li hember van kesan disekine û wan asteng dike. Ji bo vê yekê saziyeke fermî ye û serîlêdanan digire. Ji hêla Midûriyeta Giştî ya Emniyetê hatiye amdekirin û di demên lezgîn de mirov pêşî dikarin serî li wir bidin. KADES, bi Rûsî û Fransî û 4 zimanên din xizmetê dide lê bi Kurdî xizmetê nade.

Ji bo ku zarok xwe bi zimanê xwe yê zikmakî îfade bikin û karibin xwe bigihînin makanîzmayên alîkariyê bidin wan, divê Tirkiye gumanên xwe yên li ser xalên BMÇHS ê rake, divê mafê zimanê zikmakî fermî û mîsoger bike, saziyên wek Alo 183, CIMER, KDK Zarok, TÎHEK û KADES divê bi Kurdî xizmetê bidin û her wiha divê personelên li herêman Kurdan tînin peywîrdarkirin li gor pêdiviya zarokan bi zimanê Kurdî dizanibin.

62- <https://www.cimer.gov.tr/50sorudacimer.pdf>

63- <https://www.tihe.gov.tr/>

Bandora
Berastengi,
Xizani û
Zayendiyê
ya Li Ser
Mafê Zimanê
Zikmakî

BANDORA BERASTENGÎ, XIZANÎ Û ZAYENDIYÊ YA LI SER MAFÊ ZIMANÊ ZIKMAKÎ

Di çarçoveya qedexeya cihêkariyê de, zarokên ku ji hêla zimanê zikmakî ve ji hev cûda ne û xwedî taybetmendiyên cihê ne jî hebûn. Me wan jî tevî xebata xwe kir. Di vê derbarê me pirsên dirêj ji kesan kir. Di bersivan de herî zêde mijarên wek berastengî, xizanî û zayandiyê derketin pêş.

Ji nav 20 zarokî 11 ji wan gotin ku li derdora me zarokên ku pêdiviyê wan ya taybet heye nînin. Hi zarok anîn ziman ku nasên wan yên berasteng hene, lê gotin ku ev hevalên wan bi Kurdî nizanin tenê bi Tirkî dizanin. Li gor agahiyên ku me ji zarokan girtin, zarokên berasteng li gor zarokên din bêtir zehmetî dibînin û xwe gihandina mafê çandî û bikaranîna zimanê zikmakî ji bo wan ne hêsan bû:

“Di nav hevalan de yekî wisa tine ye. Tenê di pola min de yek hebû. Ew jî nikaribû bimeşiya. Hevalê min li dibistanê bêtir bi Tirkî diaxivî.” Ç3

“Ew jî bi Tirkî diaxivin, kesekî ku bi zimanên diaxivî min nedît.” Ç4

Hunermend, mamoste, nûnerên saziyên civakî yên sivil û rêvebirên herêmê yên ku me li gel wan hevdîtin çêkir gotin ku mafê zimanê zikmakî yên zarokên berasteng tê binpê kirin û kes wan nabîne. Bi hewldana malbat û mamosteyan ev zarok xizmetê dibînin:

“Zarokên ku perwerdehiyêke taybet bigirin qadeke cûda û taybet e, ez pêrgî tiştek wiha nehatime hêj.” STÖ10

“Bi taybetî çalakiyêke wiha mixabin me nekeriye. Wek temaşevan jî min nedîtiye. Yanî ez bawerim min dibistan, weqî an jî komaleya wan divê hebe, gelo parvekirineke me li gel wan çêbû? Dibe ku ev kêmasiya me be.” SM4

“Zarokên xwedî pêdiviyên taybet, kêmasiya me ye yanî, tine bûn. Zarok zêde tevî xebatên me nedibûn, pirsgrêka çûyîn hatinê hebû, tiştên wisa astengî derdixistin.” STÖ3

“Dibistanek an jî rehabilitasyonek ew here tine ye. Malbat, dibêje ‘bila were ba we, qet nebe bi zarokan re dilîze, li malê Kurdî tê axavtin, wekî din ciyekî ku ez zarokê xwe deynim wir tine ye’ vê pirsgrêkê pirr dijîn.” Y2

“Li dibistanê me ji bo berastengan erzani çêkiribû. Armanca me ew bû ku em tiştekî nû çêbikin. Mînak kesekî jî hêla fizîkî ve ne baş hebû zarok bû, di çûyîn û hatina konferansê de zehmetî didît. Me ji bo ku ew hêsanîr karibe here û were mêrdiwen çêkir, dora mêrdiwenê bi ewletir kir. Ev tişt jî tiştên wijdanî bûn.” O2

Di hevdîtinan de me dît ku yek ji astengiyên mafê zimanê zikmakî yên zarokan jî xizanî ye. Li gor bersivên dan me, di navbera cihêkarî û aboriyê de têkiliyek hebû, malbat ji ber şertên aboriyê nikaribûn zarokên xwe bişînin saziyên ku bi zimanê Kurdî perwerde didan. Aborî jî bo wan dibû asteng. Hin sazî jî bo ev astengî ji holê rakin derfetên wek bursan ava kiribûn:

“Lêkolîneke ma ya ku hîna çap nebûye heye, li wir me ev yek pirsî, ji ber zimanê zikmakî hûn bi cihêkariyê re rû bi rû ma ne? Kesên ku gotin em

nemane, ji hêla aboriyê ve kesên xizan bûn, bi temamî çîn ye ev mijar.”STÖ8
 “Ez nikarin biryara şandina wan a niha bidim. Çima? Niha ji hêla aboriyê ve ez tengezar im tu dizanî? Ji ber ku ez bê kar im, pirrî caran pereyê dolmişekê jî carinan nikarim bibînim.” E4

“Kurum, ihtiyaçlarını karşılayabilmek için belli bir ücret tabi. Ondan kaynaklı herkes gelemiyor. Sonuçta o çocukların gönderdiği para ile çekip çeviriyorsun her şeyi karşılıyorsun. Yemeyi, içmeyi, ihtiyaçlar, kiralar karşılandığı için herkes gelemiyor.” O1

“Kotayeke me ji bo kesên xizan hebû. Şagirtên me yê burs digirtin hebûn. Heger rewşa aboriyê ya malbatê ne baş bûya, ji malbatê kes nexebitiya, an jî di malbatê de hin kes di girtîgehê de hebûna, dê an jî bav tine bû ya, di kirê de bûya, koçber bûya, yanî pêvajoyeke şer hebû. Ji ber van sedeman me van kesên ku astengiyên wan hebûn tevî pêvajoya perwerdeyê kir, ji xwe di rêzîknameya me de xebateke me ya wiha hebû.” Y1

Hin beşdarvan gotin ku hin zarok hem berasteng in û hem jî xizan in, yanî ew her dû rewşan bi hev re dijîn, ji ber vê yekê jî ev zarok bi cihêkariyê re rû bi rû diman, zarokên wiha jî hebûn:

“Zarokên ku ji hêla aboriyê tengas bûn, em wan re xebitîn, ji xwe heger aborî ne baş be di civakê de mirov her tim jî paşve ye. Heger li gel van tu berasteng bi jî jiyan bêtir zehmettir dibe. Di nav zarokên 7 salî de zarokê berasteng hebû, ji bo dibistanê zehmetî didît. Nikaribû xwe îfade bike. Me pêvajoya wî ya malê jî şopand, em çûn serdana malê, me bi diya wî re axivî. Em wê demê bûn şahidê bextewariya wî zarokî. Ji lew re zarok tên dîrxistin di hin malbatan de, di nav civakê de jî heman tişt heye. Her tim pêvajoyên dîrxistinê yê cihê dijîn.” STÖ5

Me ji malbatan pirsî, ji bo mafê zimanê zikmakî gelo astengiyên zayendî jî hene an tine ne, malbat gotin ku bêtir zayendî li ber çavan were girtin divê hemû zarok ji van mafan sûd bigirin. Hin malbat jî hêla zarokên qizî ve nêzikatiyên erênî nîşan dan. Saziyên sîvîl yê civakî jî gotin ku em di çalakiyan de vê yekê digirin ber çav û zayendiyê wekhev diparêzin. Hunermend jî gotin ku ew di berhemên xwe de ji wekhevî û cûdahiyê re rêzê digirin:

“Zarokên qizî stûxar in, qet nebe bila ew bibînin. Em li destên mêrê xwe dinêrin, qet nebe bila ew nenêrin, bila kes li wan zorê neke, em tadeyê dibînin bila ew nebînin..” E2

“Li mala min tûndî tine. Li hember jinan rêz heye, ez zarokên xwe jî qiz û kur venaqefînim. Ji bo min wek hev in. Heger ciyekî wisa hebe ez ê herduyan jî bişînim.” E5

“Em di xebatên xwe yê zayendiyê de, beşdariya jinan û zarokên qizî dişopînin û baldar in ji bo vê yekê..” STÖ4

“Di listikan de di nav zarokan de nêzikatiyên zayendî tine ne, em bêtir tiştêk wisa gav davêjin û dimeşin.” Y2

“Di nav civakê de vê zanînê û hayjêbûnê em dixwazin bi zarokan re çêkin, hewldanê me hene ji bo vê yekê, em di berhemên xwe de jî cî didin wî tiştî.” SM3

NIRXANDIN

Di xebata xwe ya li qadan de, berastengî, xizanî û zayendiya zarokan, cûdahiyên bi vî rengî çewa li ser mafê zimanê zikmakî bandorê çêdike, li Amedê em gihiştin van encaman:

- - Cûdahiya herî girîng ya li hember mafê zimanê zikmakî ya zarokan, berastengî ye.
- - Xizanî nahêle ku zarok ji perwerdeya Kurdî û çalakîyan sûd bigirin.
- - Ji bo berastengî û xizanî ji holê rabe û zarok mafê xwe yê zimanê zikmakî bikarbînin polîtîkayek tine ye. Ji xeynî hewldanên şexsî û saziyan.
- - Destnîşankirina wekheviya zayendiyê, di çalakî û weşanên ji bo zarokan de dîsa hewldanên şexsî û saziyan li pêş in.

Li gor xala 10'an ya Makeqanûnê, ji bo mafê wekheviyê jîndar be, divê hemû zarok karibin xwe bigihînin mafê zimanê zikmakî. Di Komîteya Mafê Zarokan ya BM yê de, di şîrovekirinên wan yên giştî de tê gotin ku divê dewlet pêdiviya zarokên herêmî bi cî bî ne. Her wiha ji bo zarokên berasteng yên herêmî jî dîsa divê bixebite û pêdiviyên wan di ber çavan re derbas bike.

Bi pirsên hindik be jî, me dît ku mafên zimanê zikmakî yên zarokên berasteng tînin binpêkirin û kes van zarokan nabîne. Li gor çavdêriyên me zarokanê xizan jî paşde mane. Ji ber van sedeman, ji bo em karibin gumanên li ser xalên BMÇHS ê baştir veçîrin, divê em jiyana zarokên berasteng û xizan bi hurgilî bibînin. Ji lew re jî em xebateke ku li ser vê mijarê hûr bibe pêşniyar dikin, ji bo pêdiviyên van zarokan bi cî werin tevdirên taybet pêwîst in. Em vê peywîr û berpirsyariyê bi bîr tînin.

Zarok
Dixwazin
Mezin
Pêşniyaz
Dikin

ZAROK DIXWAZIN & MEZIN PÊŞNIYAZ DIKIN

Zarokên ku me li gel wan hevdiştin kir, derbarê pirsên me yê mafê zimanê zikmakî de sê mijarên sereke destnîşan kirin: Axavtina li mal ya zimanê zikmakî, li dibistanê axavtina zimanê zikmakî û çalakbûna televizyon û pirtûkên Kurdî.

Zarok gotin ku em dixwazin li malê bi zimanê zikmakî were axavtin, ji bo têkiliya bi wan re jî dîsa ev ziman xwestin û gotin ku bila bi vî zimanî bi mere têkilî deynin. Paşê malbat an jî dê û bav zehmetî dibînin û nikarin vî barî hilgirin ser milê xwe û ziman fêr bikin:

“Bangewaziya min ji malbatan re ye. Divê dê û bavên zarokan bi zarokên xwe bi bi zimanê zikmakî biaxvin. Ji lewma zarok kîjan zimanî fêr bibe ew li derdora xwe jî wî zimanî bikartîne û bi awayekî çalak diaxive.” Ç3

“Heger dê û bav vî zimanî neaxivin, zarok dê çewa biaxvin, yanî dê bi kî re biaxivin, dê ji kur zanibin.” Ç13

“Piştî zarok çêbû zimanê zikmakî kîjan be divê ew were fêr kirin. Heger li malê zimanê zikmakî fêr bibe, dê li dibistanê bi Tirkî hîn bibe ji xwe, divê li malê bi zimanê zikmakî hîn bibe. Heger hîn nebe dê ev ziman bibe zimanê duyemîn. Dê wek zimanê zikmakî nebîne vî zimanî û hîs neke, wek zimanekî din hîn bibe, dê ev yek pê bide hîskirin.” Ç20

Yek ji xwestekên zarokan ku derket pêş jî perwerdehiya bi zimanê Kurdî ya li dibistanan bû. Dersên ku Kurdî hîn wan bike û perwerdeya bi Kurdî xwestin:

“Dikarin kursan jî vekin li dibistanan, 1-2 ders bi zimanê Kurdî nîşan bidin. Ç8

“Li dibistanên derseka hîlbijartî jî dibe, tenê dersek Kurdî jî li dersan zêde bibe dê pîr baş bibe. Yanî mamoste heger were zêdekirin dê Kurdî hîn bibin, yanî ev hêsan e, xwezî derseka me ya hîlbijartî bi Kurdî bû ya.” Ç14

“Daxwaza min ya herî mezin ev e. Li dibistanê perwerdehiya bi zimanê Kurdî. Ç20

Zarokan gotin ku divê hejmara berhemên medyayê werin zêdekirin. Televizyonên Kurdî, pirtûk û kovarên Kurdî zêde bibin û em karibin xwe bigihînin van berhemên:

“Bi gotina min ev kar nabe, dê çi bibe? Bêtir kanalên Kurdî yê televizyonê vebin, bêtir pirtûk û kovar derkevin, ez dixwazim li dibistanên dersên Kurdî hebin.” Ç13

“Kanalên televizyonê. Ji lewre di pandemiyê de zarok nikarin bikevin dersan. Herî zêde li ber televizyonê wext derbas dikin, di televizyonan de tiştekî bala wan bikêşe derkeve dibe ku Kurdî hîn bibin.” Ç17

“Dibistan, televizyon, pirtûk, min dixwest ev zêde bibin, min dixwest Kurdî were hînkirin.” Ç15

Malbatan gotin ku berpirsariyên li ser milê me hene û zarok jî ev

berpirsariyên wan destnîşan kirin lê, malbat dibêjin ev tenê bi wan naqede, ji bo zimanê zikmakî tiştên ew bikin diyar in. Malbat ji bo mafê zimanê zikmakî gotin ku divê li dibistanan perwerdehiya bi Kurdî hebe û ev tişt pêşniyar kirin:

“Bi rastî jî zimanwek roj, ax û avê mafekî gerdûnî ye. Çi dikeve ser milê min ez pêk finim lê têrê nake. Jidil jî divê hin rêbazên din werin pêş bikevin ji bo vî karî.” E8

“Zarok li hevalên xwe li mamosteyên xwe dinihêrin, giş bi Kurdî diaxivin. Gava tîn malê jî ez bi Kurdî diaxivim, dê çiqas feydeya min bigihîje wan. Tesîra wan ji ya min zêdetir e, lê li dibistanê were axavtin dê cûdatir be. Tiştê wiha pêk bihata dê baş çêbûya lê mixabin tiştê wiha ne pêkan e. Nikarim. Em nikarin tiştêkî bikin. Tenê em ji dûr de temaşe dikin ewqas.” E1

“Tenê xeyaleke min heye ew jî hebûna zimanê min e, çikû Zazakî li ber tînebûnê ye. Ez ê ji bo ziman têbikoşim. Divê ez nemirim. Çewa ku ew dibistanên Lîcê bi kepçeyan hatin xerakirin, divê dîsa dîsa bi wan kepçeyan werin avakirin.” E10

Me li daxwaz û pêşniyarên zarok û malbatan yê derbarê zimanê zikmakî de guhdar kir, lê li gel van daxwaz û pêşniyaran me ji nûnerên rêxistinên civakî yê sîvîl, perwerdekar û rêvebirên herêmî re jî tiştên divê ji bo zimanê zikmakî werin kirin pirsî. Beşdarvanên temen mezin beriya her tiştî zagonan nîşan dan û gotin divê ev zagon werin sererastkirin û ev astengî ji holê werin rakirin. Her wiha ew gotin ku divê malbatên zarokan jî bi wan re bi Kurdî biaxivin, bi kurtasî gotinên wan û malbatan yê vê derbarê de hevdû temam dikirin:

“Li gor pirsên we pirsîn me fêhm kir ku me tiştê nekiriye û em li ciyê xwe mane. Astengiya herî mezin xalên bi guman yê 17, 29 û 30 yê BMÇHS ne. Divê gumanên li ser van xalan werin rakirin. Em her sal di 20 mijadarê de di Roja Mafên Zarokan ya Dinyayê de vê yekê finin ziman. Ji bo çareseriyê mayînde divê ev guman werin rakirin, divê Makeqanûn were guhertin.” STÖ11

“Zimanê zikmakî divê li malbatê dest pê bike, paşê jî li polê, di dibistana seretayî wek derseka hîlbijartî were qebûlkin. Divê di jiyana me de 2 saet her tim zimanê Kurdî hebe.”Ö2

“Mixabin nîfşê duyemîn, dê û bav zimanê Kurdî fêrî zarokên xwe nakin. Ciwan bi hewldanên xwe hîn dibin. Ji lewma divê dê û bavê zarokan werin hişyar kirin û ew jî werin perwerdekirin, ev tişt girîng e.”STÖ8

“Divê perwerdehiya fermî hebe, nexwe wê ziman wînda bibe. Ev rewşêke dadwer nîn e. Ev ne tiştêkî ku bi dîrsa hîlbijartî ji holê rabe ye. Dîrsa zazakî jî divê ne hîlbijartî be, her ku diçe ev ziman ji holê radibe, ev talûkeyêke pîrr mezin e. Di vî warî de tîrsên min hene. Yanî heger Tîrkiye bixwaze xwe di nav civakên AB de bibîben divê pêşî li zimanan veke, divê perwerdehî bi zimanê zikmakî be.” Y3

NIRXANDIN

Di xebata xwe ya li qadan de, piştî pêşniyarên mezinan û daxwazên zarokan li Amedê derbarê zimanê zikmakî de em gihîştin van encaman:

- Zarok dixwazin zimanê xwe yê zikmakî li mal fêr bibin û bi malbata xwe re bi vî zimanî biaxivin.
- Zarok perwerdehiya bi zimanê Kurdî dixwazin.
- Zarok dixwazin pirtûkên bi zimanê zikmakî, televizyon û amûrên ragihandinê zêditir bibin û ew bi hêsanî xwe bigihînin van çavkaniyan.
- Malbatan anîn ziman ku tenê axavtina bi Kurdî ya li gel zarokan ji hêla mafên wan ve têrê nake, gotin ku divê zarok di nav civakê de jî piştgirî bibînin, perwerdehiya bi zimanê zikmakî pêwîst e, ew vê yekê pêşniyar dikin.
- Mezinên ku bi zarokan re xebitîne gotin ku divê astangiyên fermî yên li hember mafên zimanê zikmakî rabin. Her wiha divê ji bo malbat bi zimanê Kurdî bixivin hêzê bidin wan. Herî dawî jî gotin ku divê perwerdehiya zimanê zikmakî hebe.
- Me di çavdêriyên xwe de binpêkirina mafên zarokan çespand û daxwazên zarokan jî çavdêriyên me temam dikirin, elbet ev yek ne tesadûfî bû. Pêşniyar û çespandinên malbat û mezinan yên derbarê binpêkirina mafên zarokan de, ji bo zarokan tiştên were kirin zelal dike.

Pêşniyar

PÊŞNIYAR

Beriya ku em rapora xwe bi dawî bikin, pêşniyarên xwe rêz bikin, kesên ku biryara van mafan didin, divê bi baldarî nêzî mijarên ku em li ser wan rawestiyane bibin û van pêşniyarên me li ber çavan bigirin û bi lez û bez bi cî bînin:

- Di serî de gumanên li ser xalên 17, 29 û 30 yên BMÇHS û yên li ser peymanên navneteweyî yên derbarê zimanê zikmakî de divê werin rakirin.
- Divê Maqeqanûn were guhertin û astengiyên li hember zimanê Kurdî werin rakirin û Kurdî li qadên giştî were bikaranîn.
- Tirkiye di serî de divê bibe alîgirê Şertê Herêmên Ewrûpa û Zimanê Herêmî, Peymana UNESCO ya Di Perwerdehiyê de Li Hember Cihêkarîyê, Konseya Ewrûpa ya Parastina Civakên Herêmî û li gor van peymanan mafê zimanê zikmakî biparêze.
- Ji bo zarok zimanê xwe yê zikmakî bi axivin divê malbat piştgirî bigirin.
- Divê Kurdî li dibistanan were fêr kirin. Divê navrako dersa Zimanên Zindî û Zarava were pêxistin, astengiyên li hember hîlbijartina vê dersê werin rakirin. Her wiha ji bo van dersan divê mamoste werin peyda kirin.
- Li ciyên ku Kurd lê dijîn, li gel zimanê Tirkî, mamasteyen bi Kurdî dizanin jî divê werin peywîrdarkirin.
- Dibistanên taybet yên dersa zimanê Kurdî didin divê werin teşwîq kirin.
- Divê zimanê Kurdî jî li perwerdeya giştî ya pîrr zimanî were zêdekirin.
- Divê naverokên medyayê yên bi Kurdî werin teşwîq kirin.
- Divê ji bo zarokan naverok werin amade kirin û televizyon weşanên giştî pêk bînin.
- Divê mekanîzmayên serîlêdan û gilişkirinê yên ji bo binpêkirina mafên zarokan bi Kurdî bin, li saziyên dewletê personelên bi du zimanan zanibin werin peywîrdarkirin.
- Ji bo mafên zimanê zikmakî yên zarokên berasteng divê tevdiîrên taybet werin girtin.
- Zarokên xizan ji bo zimanê xwe yê zikmakî divê piştgiriye bigirin.
- Cihêkariya li hember zarokên ku zimanê wan yê zikmakî Kurdî ye nayê qebûl kirin. Divê bi awayekî çalak li hember vê yekê nerazîbûn werin nîşandan.

- Mafê zimanê zikmakî, di çarçoveya mafê zarokan de divê were nirxandin, ji polîtîkayên herêmî û neteweyî dûr bê girtin; divê rêveberiyên herêmî xebatên zarokan zêdetir bikin û ji bo vê yekê piştgiriye bigirin.
- Ji bo mafê zimanê zikmakî divê stratejî û polîtîka werin pêşxistin û bandora wan were nirxandin. Derbarê bikaranîna zimanê zikmakî de jî divê agahiyên ku ji hev hatine veqetandin werin komkirin.
- Saziyên bi mijarê re têkildar in divê budceyan bigirin, ji bo zimanê zikmakî divê aboriyek were veqetandin û ev yek bi raya giştî re werin parve kirin.
- Divê li gor encamên çavdêriyên Komîteya Mafê Zarokan ya BM yê, raporên ku ji Tirkîyeyê tên xwestin û agahiyên derbarê vê mijarê de werin eşkerekirin. Her wiha divê rapor û çavdêrî wergerînin zimanê Kurdî û van raporên zêde bikin.
- Divê komeke şewirmendiyê were ava kirin, nûner û zarok jî tevî vê komê bibin. Pêşniyarên di vê raporê de jî tê de, ji bo hemû biryarên derbarê zarokan de ew jî nihêrînen xwe bînin ziman. Derbarê zimanê zikmakî de zarok jî karibin biryar bidin û di van pêvajoyan de xwedî gotin bin.





Encam

ENCAM

Di vê xebata xwe de me mafên zarokan yê zimanê zikmakî şopan, me xwest em bînpêkirina van mafan bînin ziman û bidin nîşandan. Li gor nihêrînên zarokan derbara vê mijarê de me pêşniyaran pêş xist. Armanca me ev yek bû. Piştî ku me xebata xwe bi dawî kir, me ev çespendin kirin; zarok ji mafên çanda xwe jiyîn, bikaranîn û fêrbûna ziman, perwerdehiya zimanê zikmakî, xwe gihandina berhemên medyayê û xwe gihandina mafê serîlêdan û gîlîkirinê bê par hatine hiştin û ev mafên wan hatine bînpêkirin. Li gel vê yekê zarokên xizan û berasteng li gor zarokên din bêtir kêmasî dibînin û mafên wan jî tê bînpêkirin.

Yek ji armanca xebata me ya din jî desnîşankirina gumanên li ser xala 3 ya BMÇHS ê ye ku qala mafê zimanê zikmakî dike. Me xwest em bibînin bê ka Tirkiye berpirsariya xwe derbarê van peymanan de çiqas bi cî tîne, me xwest em vê yekê binirxînin. Di vê çarçoveyê de derbarê Rapora Periyodîk ya 4 û 5 an ya Tirkîyeyê de me lêkolînek bi rêve bir. Derbarê Komîteya Mafê Zarokan ya BM ku mafê bikaranîna zimanê zikmakî diparêzê de zêde agahiyên bi hurgilî nedan me⁶⁴, raporên periyodîk bi rêk û pêk û di wextê de nehatine amadekirin⁶⁵ û di naveroka raporê de me dît ku ew tenê bi agahiyên gelemperî re mijûl bûn û tenê van agahiyan dane. Di xebata me ya li qadan de jî nûnerên saziyên civakî yê sîvîl jî anîn ziman ku heta niha kes derbarê zimanê zikmakî de li nihêrîna wan nepirsiye û li pêşniyarên wan guhdar nekirine. Herî dawî, raporên periyodîk û çavdêriyên Komîteyê, di malpera AÇSHB yê ya fermî de hatine weşandin lê bi zimanê Tirkî hatine weşandin.⁶⁶ Me çespend ku wergera wê ya bi Kurdî nehatiye kirin⁶⁷. Encama ku me di rapora xwe de diyar kiriye û her wiha pêşniyarên hatine kirin, nêzikatiya Tirkîyeyê ya li hember van peymanan, derbarê berpirsariyê û peywirên wan de çespendinên taybet û girîng in.⁶⁸

Komîteya Mafê Zarokan, di raporên ku ji BMÇHS yê re şandiye de diyar dike ku gelek dewlet bûne alîgirê peymananên navneteweyî lê ew peywir û berpirsariyê xwe piştguh dikin û girîngiyê nadin mafên zarokan. Zarokên civakên herêmî jî wek zarokên din xwedî maf in, BMÇHS ji bo hemû zarokan

64- Di nav xalên 211 û 214 an der derbarê, "Mafê Zarokên Herêmî yên Çandî û Komên Herêmî" di xala 10'an ya Makeqanûnê de bi nîşandana Peymana Aştiyê ya Lozanê ya di sala 1923'an hatiye îmkêkirin. Tirkiye dibêje ku ew derbarê vê yekê de îstatîstîk û agahiyan negirtine. Tenê ev yek dibêje.

65- Dewletên alîgir ji 5 salan carek raporên xwe pêşkeş dikin, Tirkiye rapor xwe ya pêşî di sala 1999'an de, rapor duyemîn û sêyemîn jî di sala 2012'an de pêşkeş kiriye. Rapora ku diviyabû di Gulana 2017'an de were pêşkeşkirin di 29 ê Adara 2019'an de ji Komîteya Mafê Zarokan ya BM yê re hat pêşkeşkirin.

66- <https://ailevecalisma.gov.tr/chgm/sayfalar/cocuk-haklari-sozlesmesi-ulke-raporlari/>

67- Li gor Pirtûka Destan ya Peymana Mafên Zarokan ev mijar, li gor xala 30'an tê nixrandin û derfeteke taybet e: s.469.

68- Peymana Mafê Zarokên Herêmî, Şiroveya Gelemperî No:11 (2009).

wekheviyê desnîşan dike û dibêje hemû zarok wek hev sûdê ji mafan digirin, ji bo cihêkarî ji holê rabe jî divê dewlet şertên xwe ji holê rakin û tevdîrên pozîtîf bigirin. Zagon, polîtîka û bernameyên derbarê zarokan de divê bêyî zarokan neyên nîqaşkirin û pejirandin, divê bi zarokan jî bişêwirin û zarokan tevî van pêvajoyan bikin. Ev yek tiştê girîng e.

Gelo li dinyayeke ku zarok ew bi rêve dibin, dê mafê zimanê zikmakî çewa bûya? Piştî ku em rapora xwe ya çavdêriyê bi dawî dikin, em dikevin dû vê pirsê. Dewlet û mezin derbarê zarokan de gava biryarek didin çi dikin em jî heman tiştî dikin û guhê xwe didin zarokan:





Heke Zarok Bibin Rêvebir...

HEKE ZAROK BIBIN RÊVEBIR...

- » «Min ê dibistaneke Kurdî vekira, ji bo Kurdî balavtir bibe.” Ç1
- » «Min ê di na civakê de qadên ku mirov karibin zimanê xwe yê zikmakî bikarbînin vekira.” Ç2
- » «Heger ez rêvebirekî dewletê bû ma, çi Çerkez, çi Erebi, çi Kurdî, çi sînî, çi Xiristîyan. Kî ji kîjan nijadî bûya û bi kîjan zimanê xeber bidaya min ê destûr bida. Bila her kes di vî warî de azad bûya. Ala van welatan kîjan be bila ew al bikarbînin. Li gor civak û zimanan min ê dibistan vekira. Ji bo civak ji zimanê xwe bêtir fêhm bikin, karibin xebatên akademîk bimeşînin, karibin zimanê xwe biaxivin min ê kursan vekira da ku zanîna xwe pêştir bibirana. Min ê komaleyan vekira, yanî çi ji destê min bihata min ê bikira.” Ç3
- » «Minê şanoyan vekira. Li şanoyê kî bi kîjan zimanî bixwesta Kurdî an jî Tirkî min ê destûr bidaya wan. Min ê pirtûkan bidaya destê zarokan, bila ev hevok ji têde hebûna. Yanî wek minak gava yek bi tirkî bigota ‘Çewanî baş î?’ bila li wir jî wek bersiv ‘Tu çer dikî, tu baş î?’ hebûya, tiştên wiha...” Ç4
- » «Heger ez rêvebirekî dewletê bû ma, ez qala pîrika xwe bikim, ew bi Tirkî nizane. Bi Kurdî diaxive, gava diçe nexweşxanê an jî saziyeke din ew nikare ji wir sûd werbigire, nikare bi mirovan re bikeve têkiliyê. Ji ber ku ew bi Kurdî dizane lê bi Tirkî nizane. Yanî li wir çend kes an jî personel bi Kurdî zanibûna ew karîba bi wan re bi Kurdî biaxviya dê baştir bibûya.” Ç5
- » «Min ê li dibistanan Kurdî serbest bikira. Min ê di kanalên televizyonan de jî derxista pêş, binnivîs lê zêde bikira. Wekî din di çavkaniyên nivîskî de jî minê bikarbaniya zimanê Kurdî” Ç6
- » «Min ê li hemû dibistanan dersên zimanê Kurdî bidaya. Ç7
- » «Min ê dersên giran kêmbikira, yanî di hefteyekê de 12 ders birkarî hebûya min ê ew bikira 10 ders û 2 dersên Kurdî lê zêde bikira. Dê wisa hêsanîr bûya.” Ç8
- » «Bila li dibistanan wek ders hebûya, çewa ku Almanî, Îngilîzî heye min ê dersa Kurdî jî zêde bikira.” Ç9
- » «Min ê kanalan dîsa vekira. Min ê gelek kanalan vekira. Min ê bi navê Zimanê Me Xweşe kanalekê vekira. Li wir jî dê rêvebir hebûna da ku vî karî baş belav bikin. Min ê ji bo Tirkî jî ev yek çêbikira lê ji xwe kanalên bi Tirkî

hene. Heger kanala min ya Kurdî serkeftî be ez ê kanalek din jî vekim. Ev car min ê kanala muzîkê vekira. Muzîkên Kurdî pirr xweş in, ji xwe hewce nake em qala Amedê bikin, giş bi Kurdî ye. Ez ji kesî neditirsiyam, min ê bi xwe biçûya qal bikira.” Ç10

» “Min ê du tişt bikira, min ê nehiştê ku kes henekên xwe bi ziman bike, paşê min ê ji bo hemû zimanan destûr bidaya ku ew werin axavtin.” Ç11

“Min ê pêşniyaran bikira, ji bo fêrkirîna min ê her tiştî bikira. Ji destê min çî bihata, minak min ê li taxan 2-3 kurs vekira. Heger hin malbat bixwastana ku Kurdî hîn bibin min ê Kurdî hîn wan bikira. Min ê hewl bidaya ku bi hurgilî hîn bibe. Lê tenê ne bi Kurdî, bila zimanên din jî hebûna.” Ç12

» “Ez nebêjim du ziman, çiqas ziman hebûna, yanî çiqas însan hebûna li gor wan bila zimanê wan jî hebûya. Kî bi kîjan zimanî biaxivîya bila ew ziman bikabaniya. Tiştên wisa bi Kurdî an jî Tirkî min ê bikira ku rojname derkevin, min wergeranda zimanê din, min ê bikira yanî.” Ç13

» “Min ê mirovan teşwîq bikira, min çalakiyên xweş amade bikira, kursan vekira. Ji bo şanoyê jî min ê lîstikên baş bixebitanda, min ê pirtûkan belav bikira.” Ç14

» “Min ê hemû zimanan serbest berdaya. Bila her kes bi awyêkî azad zimanê xwe bikabaniya.” Ç15

» “Min ê dersa zimanê Kurdî li dibistanê bikira dersa hîlbijartî.” Ç16

» “Beriya her tiştî jî bo zarokan min ê komaleyekê vekira, divê mafê zarokan neyên binpê kirin, divê li wê gorê xebat werin kirin û divê bursan bidin zarokan.” Ç17

» “Ji bo bi Tirkî biaxvin min ê hemû kesî hişyar bikira.” Ç18

» “Ji bo zarok zimanê xwe yê zikmakî fêr bibin ez ê bibûma alîkar.” Ç19

» “Ez niha ji we re qala Kanada bikim. Li wir kesên Fransî bi zimanê xwe diaxivin û bextewar in. Min ê pergaleke wiha ava bikira.” Ç20





PÊVEK :
SETA
NÎŞANEYAN-
LI AMEDÊ
RAPORA
ÇAVDÊRIYÊ YA
MAFÊ ZIMANÊ
ZIKMAKÎ A
ZAROKAN

NÎŞANEYÊN
ŞOPANDINA
MAFÊ ZIMANÊ
ZIKMAKÎ YÊN
ZAROKAN
YA WEQFA
KOÇBERIYÊ A
AMEDÊ

NÎŞANEYÊN ŞOPANDINA MAFÊ ZIMANÊ ZIKMAKÎ YÊN ZAROKAN YA WEQFA KOÇBERIYÊ A AMEDÊ

Seta nîşaneyan ji bo mafê zimanê zikmakî yên zarokan, li gor standardên navneteweyî hatiye amadekirin. Ev standard jî li gor peymanên mafê mirovan ya navneteweyî hatine bi rêk û pêk kirin. Ji bo amadekirina seta nîşaneyan hin çavkanî hatine bikaranîn. Belge û çavkaniyên ku ji hêla peymanên mafê mirovan yên navneteweyî û mekanîzmayên mafê mirovan hatine amadekirin ev in: Peymana Mafê Zarokan ya BM, Peymana Navneteweyî ya Bi Her Awayî Bi Dawîkirina Cihêkariyê ya BM, Peymana Navneteweyî ya Mafên Medenî û Siyasî ya BM, Peymana Navneteweyî ya Aborî, Civakî û Mafên Çandî ya BM, Peymana UNESCO ya Bi Dawîkirina Cihêkariyê, Peymana Kabîle û Civkên Herêmî yên Li Welatê Azad ya Rêxistina Xebatê Navneteweyî, Şîroveya Gelemperî ya 11'an a Belavoka Komîteya Mafê Zarokan ya BM, Encama Rapora Çavdêriyê ya 2012 ya Tirkîyeyê a Komîteya Mafê Zarokan ya BM, Belavoka Civakên Herêmî ya BM, Peymana Navneteweyî ya Bi Her Awayî Bi Dawîkirina Cihêkariyê ya BM, pêşniyara Gelemperî ya 23'an, Raportorê Taybet yê Pirsgirêkên Civakên Herêmî ya BM. Ev set rêber û nîşaneyêke pratîk ya ji bo mafê ziman e û ji hêla van peymanan ve hatiye amadekirin.

NÎŞNE -1		
PÊNASE: Mafê zimanê zikmakî û çanda xwe jiyîn hatiye misogerkirin.	Nişaneyên jêr: • Bûne aligirê hemû peymanên navneteweyî yên derbarê vê mijarê de. (BM ÇHS, Peymana Rakirina Hemû Cihêkariya Nijadî, Peymana Mafê Medenî û Şexsî, Peymana Aborî, Civakî û Mafê Çandê, Peymana Civakên Herêmi ya Konseya Ewrûpa) • Mevzûatên netewî li gor standardên navneteweyî hatine amade kirin. • Gumanên li ser BMÇHS yê hatine rakirin. • Zagon/rêzikname/direktîf/standard û hwd./an jî netewî/plana çalakiya herêmi/plana stratejîk û hwd. ev maf hatine erê kirin. • Zagon/rêzikname/direktîf/standard û hwd./an jî netewî/plana çalakiya herêmi/plana stratejîk û hwd. xebatên danasîn û cûdahiya ev mafî tê pêşniyaz kirin. • Zagon/rêzikname/direktîf/standard û hwd./an jî netewî/plana çalakiya herêmi/plana stratejîk û hwd. Civaka Sîvil û sektorên taybet pêşniyaz dikin ku li hember ev mafî bi rêz bin.	Rêbaza Berhevkirina Agahiyan • Lêkolîna Li Ser Maseyê • Analîza Belgeya Mevzûat û Politikayan • Hevdiîtina Bi Kesên Giring û Pîsporan re
NÎŞANE -2		
PÊNASE: Mafê komên çandî yên ji hev cihê jî hatiye misogerkirin da ku karibin saziyên perwerdehiyê ji bo xwe vekin.	Nişaneyên jêr: • Zagon/rêzikname/direktîf/standard û hwd./an jî netewî/plana çalakiya herêmi/plana stratejîk û hwd. ev maf hatine erê kirin • Di belgeyan de rêziknameyên taybet yên teşwîqê jî bo van saziyên perwerdehiyê tên pêşniyaz kirin. • Di belgeyan de mafê xebata damezirandina van saziyan û danasîna wan tê pêşniyaz kirin.	Rêbaza Berhevkirina Agahiyan • Lêkolîna Li Ser Maseyê • Analîza Belgeya Mevzûat û Politikayan • Hevdiîtina Bi Kesên Giring û Pîsporan re
NÎŞANE-3		
PÊNASE: Mafê bi zimanê zikmakî xwe gihandina berhemên medyayê yên zarokan hatiye misogerkirin (tv, rojname, kovar, platformên online, pirtûk, radyo û hwd.)	Nişaneyên jêr: • Zagon/rêzikname/direktîf/standard û hwd./an jî netewî/plana çalakiya herêmi/plana stratejîk û hwd. ev maf hatine erê kirin • Di belgeyan de rêziknameyên taybet yên teşwîqê jî bo berhemên medyayê werin ava kirin hene. • Di belgeyan de mafê xwe gihandina berhemên medyayê û danasîna wan tê pêşniyaz kirin.	Rêbaza Berhevkirina Agahiyan • Lêkolîna Li Ser Maseyê • Analîza Belgeya Mevzûat û Politikayan • Hevdiîtina Bi Kesên Giring û Pîsporan re
NÎŞANE-4		
PÊNASE: Mafê serlêdana bi zimanê zikmakî û xwe gihandina mekanîzmayên gilîkirinê yên zarokan hatiye misogerkirin.	Nişaneyên jêr: • Zagon/rêzikname/direktîf/standard û hwd./an jî netewî/plana çalakiya herêmi/plana stratejîk û hwd. ev maf hatine erê kirin • Di belgeyan de mafê serlêdana bi zimanê zikmakî û xwe gihandina mekanîzmayên gilîkirinê yên zarokan tê pêşniyaz kirin.	Rêbaza Berhevkirina Agahiyan • Lêkolîna Li Ser Maseyê • Analîza Belgeya Mevzûat û Politikayan • Hevdiîtina Bi Kesên Giring û Pîsporan re

NÎŞANEYÊN PÊVAJOYÊ-1		
PÊNASE: Mafên zarokên ji çandên cihê yê xwe gihandina saziyên zimanê zikmakî, û perwerdehiyê hatiye misogerkirin.	Nîşaneyên jêr: • Hejmara tesîs û saziyên perwerdehiyê • Malbat û zarok hay ji tesîs û saziyên perwerdehiyê hene. • Ji bo tesîs û saziyên perwerdehiyê hemû kes dikarin xwe bigihînin teşwîqên taybet yê aboriyê. • Zarok bi awayekî fizîkî dikarin xwe bigihînin tesîs û saziyên perwerdehiyê. • Zarokên malbatên xizan dikarin xwe bigihînin tesîs û saziyên perwerdehiyê. • Malbat ji bo aboriya tesîs û saziyên perwerdehiyê piştgirî digirin. • Ji bo zarokên qizî karibin perwerdehiya xwe bidomînin, ew tîn teşwîqirin. • Tesîs û saziyên perwerdehiyê dikarin mufredata xwe amade bikin. • Perwerdekar û rêvebirên ku li tesîs û saziyên perwerdehiyê peywidarin, dikarin bi zimanê xwe yê zikmakî perwerdehi bibînin. Bi riya perwerdeyeke navxweyî ev mafê wan pêk tî.	Rêbaza Berhevkirina Agahiyan • Hevdîtina bi malbatan re • Hevdîtina bi rêvebirên dibistanê re • Hevdîtina bi zarokan re • Lêkolîna belgeyên budçeyê • Lêkolîna mufredatê • Hevdîtina bi rêvebirên herêmi re • Hevdîtina bi nûnerên sivil yê civakî re.
NÎŞANEYÊN PÊVAJOYÊ - 2		
PÊNASE: Mafê perwerdehiya zarokan ya bi zimanê zikmakî hatiye misogerkirin.	Nîşaneyên jêr: • Nîşaneyên jêr: • Hejmara dibistanên ku bi zimanê zikmakî perwerdehi didin. • Malbat û zarok prosedûrên perwerdehiya bi zimanê zikmakî dizanin. • Rêbazên perwerdehiya bi zimanê zikmakî li hember mafên zarokan rêzê digire. • Perwerdekar û rêvebirên ku bi zimanê zikmakî perwerdehi didin, ji bo li hember mafê zarokan rêzdar bin perwerdehiya navxweyî digirin.	Rêbaza Berhevkirina Agahiyan • Hevdîtina bi malbatan re • Hevdîtina bi perwerdekarên re • Hevdîtina bi zarokan re • Lêkolîna belgeyên budçeyê • Lêkolîna mufredatê
NÎŞANEYÊN PÊVAJOYÊ - 3		
PÊNASE: Mafê bi zimanê zikmakî xwe gihandina berhemên medyayê yê zarokan hatiye misogerkirin (tv, rajname, kovar, platformên online, pirtûk, radyo û hwd.)	Nîşaneyên jêr: • Hejmara berhemên medyayê yê çandên ji hev cihê. • Malbat û zarok hay ji berhemên medyayê hene. • Saziyên ku bi zimanê zikmakî piştgiriyê digirin ji hêla aborî ve piştgirî digirin. • Ji bo karibin berhemên medyayê biafirînin hemû kes dikarin xwe bigihînin teşwîqên taybet. • Zarokên malbatên xizan ji dikarin xwe bigihînin berhemên medyayê. • Guncawbûna berhemên ku ji hêla saziyên medyayê tîn amade kirin, bi riya mekanîzmayên çavdêriyê (ombudsmanî, rêgezên weşanê, rêbera xebatê û hwd.) tîn kontrol kirin.	Rêbaza Berhevkirina Agahiyan • Hevdîtina bi malbatan re • Hevdîtina bi endamên medya, weşanxane û hunermendan re • Hevdîtina bi zarokan re • Lêkolîna îstatîstîkên weşangeriyê • Hevdîtina bi rêvebirên herêmi re. • Hevdîtina bi nûnerên saziyên civakî yê sivil re
NÎŞANEYÊN PÊVAJOYÊ - 4		
PÊNASE: Mafê serlêdana bi zimanê zikmakî û xwe gihandina mekanîzmayên giilkirinê yê zarokan hatiye misogerkirin.	Nîşaneyên jêr: • Hejmara mekanîzmayên serlêdanê (Herêm, bajar, gund û hwd. ji hev cihêkiri) • Cûreya saziya serlêdanê ji bo hemû zarokan guncaw e. (mekanîzmayên di nav saziyên girtî de, nexweşxane, dibistan, rêveberiyên herêmi û hwd.) • Zarok hay ji van mekanîzmayan hene. • Bêyî ku rewşa berastengî, zayendî û ji azadiyê bê par mayî were lêpirsîn, zarok wek hev dikarin xwe bigihînin van mekanîzmayan. • Hejmara serlêdanên zarokan yê ku ew bi xwe serî li van mekanîzmayan dane. • Hejmara serlêdanên nûnerên zarokan yê fermî, yê ku ew bi xwe serî li van mekanîzmayan dane. • Ev mekanîzma ji bo zarokan bi ewle ne.	Rêbaza Berhevkirina Agahiyan • Hevdîtina bi zarokan re • Hevdîtina bi kesên giring û pisporan re • Lêkolîna îstatîstîkên mekanîzmayên giilkirin û Serlêdanê • Serlêdanê ji bo agahiyê

NÎŞANEYÊN PÊVAJOYÊ – 5		
PÊNASE: Derbarê mafê bikaranîna pêşxistina çandê ya zarokan û fevdîrên taybet yê ji bo vê yekê hatine girtin de bi hurgîlî agahî didin Komîteya Mafê Zarokan ya BM yê.	Nîşaneyên jêr: - Raporên periyodîk bi rêk û pêk û di wextên xwe de tîn amade kirin. - Ev rapor bi kesên têkildar re tîn nîqaşkirin. - Di raporên de derbarê mijarê agahî hene.	Rêbaza Berhevkirina Agahiyan - Lêkolîna raporên Wezareta Karên Dervayî - Lêkolîna raporên BMÇHK yê yên welatan - Hevdiytina bi kesên girîng û pîsporan re
NÎŞANEYA ENCAMÊ – 1		
PÊNASE: Zarok di saziyên ku perwerdehiya zimanê zikmakî didin de berdewam dikin.	Nîşaneyên jêr: - Nifûsa Cîvakên Herêmî û hejmar dibistanan - Hejmara zarokên ku diçin van dibistanan (Zayendî, berastengî, jiyana bajêr, jiyana gund, rewşa aboriyê divê were zanîn) - Hejmara zarokên ku ev dibistan kuta kirine (Zayendî, berastengî, jiyana bajêr, jiyana gund, rewşa aboriyê divê were zanîn)	Rêbaza Berhevkirina Agahiyan - Îstatîstîkên perwerdehî û nifûsê - Biryarên rêvebirîya herêmî - Raporên çalakiyên saziyên civakî yên sivil
NÎŞANEYA ENCAMÊ – 2		
PÊNASE: Zarok berhemên medyayê yê bi zimanê xwe yê zikmakî bikartînin.	Nîşaneyên jêr: - Berhemên medyayê yê çandên ji hev cihê li gor hemû berhemên medyayê - Nifûsa cîvakên herêmî û hejmara berhemên medyayê - Hejmara çap û fîrajên berhemên medyayê - Hejmara dibistanên ku ji bo zarokan perwerdehiya bi zimanê zikmakî didin. Çend heb vebûne û çend ji wan hatine girtin.	Rêbaza Berhevkirina Agahiyan - Îstatîstîkên çapemenî û nifûsê - Biryarên rêvebirîya herêmî - Raporên çalakiyên saziyên civakî yên sivil
NÎŞANEYA ENCAMÊ – 3		
PÊNASE: Gava mafê zarokan tê bînpê kirin, bi zimanê xwe yê zikmakî dikarin serî li mekanîzmaya bidin û giliyên xwe binin ziman.	Nîşaneyên jêr: - Hejmara serlîhdana van mekanîzmayan (Zayendî, berastengî, jiyana bajêr, jiyana gund, rewşa aboriyê divê were zanîn) - Encama serlîhdana zarokan û hejmarên wê yê ku ew bi xwe serlîhdane /çiqas serlîhdan (Divê were gofîn çiqas ji wan zarok û çiqas ji wan ji malbat bi xwe serlîhdan kirine.)	Rêbaza Berhevkirina Agahiyan - Îstatîstîkên perwerdehî û nifûsê - Biryarên rêvebirîya herêmî - Raporên çalakiyên saziyên civakî yên sivil - Nûçeyên ku di çapemeniyê de derketine
NÎŞANEYA ENCAMÊ – 4		
PÊNASE: Zarok bi zimanê zikmakî perwerdehiyê dibînin.	Nîşaneyên jêr: - Hejmara zarokên ku diçin dibistanên vê perwerdehiyê didin. (Zayendî, berastengî, jiyana bajêr, jiyana gund, rewşa aboriyê divê were zanîn) - Ciyê ku ev dibistan lê perwerdehiyê didin (herêm, bajar, gund, li gor biçûkbûn û mezinbûna bajêr divê ji hev were veqetandin.) - Hejmara dersên ku hatine dayîn.	Rêbaza Berhevkirina Agahiyan - Îstatîstîkên çapemenî û nifûsê - Biryarên rêvebirîya herêmî - Raporên çalakiyên saziyên civakî yên sivil

